**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**

**Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

# KURDÊN MERWANÎ DI TARÎXU MEYYAFARIQÎN A ÎBNU'L-EZREQ DE

**Ahmet Eyer**

**14711018**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Tahirhan Aydın**

**Mêrdîn-2016**

## KABUL VE ONAY

04/02/2017 Tarihinde savunması yapılan Ahmet EYER'e ait "Kurdên Merwanî Di Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq De" başlıklı bu çalışma jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| Danışman | : Doç. Dr. Tahirhan AYDIN | …………... |
| Üye | : Yard. Doç. Dr. Tareq Mohamed AWRAHİM | …………... |
| Üye | : Yar. Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU | …………... |

Yukarıdaki İmzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

………………………

Doç. Dr. Nesim DORU

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

## KURTE

### KURDÊN MERWANÎ DI TARÎXU MEYYAFARIQÎN A ÎBNU'L-EZREQ DE

Mijara vê tezê kurdên Merwanî di pirtûka Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq de ye. Ev pirtûka Îbnu'l-Ezreq çavkanîya yekem e ku bi berfirehî derbarê kurdên Merwanî de agahiyên girîng dide.

Armanca tezê vekolîna li ser rêvebirîya Merwanîyan û tesbîtkirina taybetîyên vê rêvebirîyê ye. Tez bi vê pirtûka Îbnu'l-Ezreq û kurdên Merwanî hatiye sînorkirin û ji despêk û sê beşan pêk tê.

Di destpêkê de armanca nivîsandina tezê û hilbijartina vê mijarê hatiye vegotin û herwiha mijar û çarçoveya tezê, rêbaz û çavkanîyên tezê hatine nivîsandin.

Di beşa yekem de derbarê Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî, bajar û welatên ku li wan deran gerîyaye, peywirên wî yên di rêvebirîya dewletê de, kesayeta wî ya ilmî û berhemên wî de agahî hatine dayîn. Dîsa di vê beşê de danasîna Tarîxu Meyyafariqîn hatiye kirin û taybetî û girîngîya wê, xebatên ku li ser hatine kirin, naveroka wê, çavkanîyên wê û rêbaza wê hatine vegotin. Îbnu'l-Ezreq nêrîn û serpêhatîyên xwe yên derbarê cih, bajar û welatên ku li wan gerîyaye di Tarîxu Meyyafariqîn de nivîsandine. Me ji di vê beşê de derbarê Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq de agahî dane. Me taybetî û girîngîya berhemê, naveroka berhemê, çavkanîyên berhemê, rêbaza berhemê û xebatên ku li serê hatine kirin anine zimên.

Di beşa duyem de rêvebirîya kurdên Merwanî û serdema mîrên Merwanîyan hatiye vegotin. Beşa duyem ji şeş binbeşan pêk tê. Mijarên van binbeşan ev in: Destpêkirina rêvebirîya kurdên Merwanî û Badê kurê Dostik, Serdema Mîr Ebû Elî

Hesenê kurê Merwan, Serdema Mumehîddudewle Ebû Mensûr, Serdema Nesruddewle Ebû Nesr Ehmedê kurê Merwan, Serdema Mîr Nîzameddîn, Serdema Nasiruddewle Mensûr û Hilweşîna mîrnîşîna Merwanîyan. Di vê beşê de jîyana van mîran, destpêka rêvebirîya wan, têkilîyên wan ên hundur û derve û mirina wan hatiye vegotin. Li gorî van agahîyan bingeha mîrnişîna Merwanîyan di serdema Badê kurê Dostik de hatiye avetin û di serdema Mîr Nesruddewle de ev mîrnişîn di serdema xwe ya zêrîn de ye. Di serdema Mîr Nîzameddîn de ev mîrnişîn hedî hedî ketiye bin bandora Selçûqîyan û di serdema Mîr Nasiruddewle Mensûr de ji hêla Selçûqîyan ve ji holê rabûye.

Di beşa sêyem de di pêvajoya serdema rêvebirîya Merwanîyan de çand û şaristanîya ku kurdên Merwanî ava kirine hatiye vegotin. Di vê beşê de di warê rêvebirîya dewletê, pergala hiqûqê, zanist û huner, artêş û ewlehî, avahîsazî û bajarvanî, jîyana aborî û bazirganî, bîr û bawerî û jîyana civakî de agahîyên ku di Tarîxu Meyyafariqîn de derbas dibin hatine nivîsandin û şîrovekirin. Di warê rêvebirîya dewletê de taybetîya mîran û şewaza derketina ser textê mîrîtîye, taybetî û peywira wezîr, walî û karê nivîsvanîyê hatiye vegotin. Qala qazîyên di serdema Merwanîyan de hatiye kirin. Taybetîyên van qazîyan û rê û rêbaza darizandinê hatiye vegotin. Derbarê artêşa kurdên Merwanî, rewş û taybetîya vê artêşê çekê ku bikaranîne de agahî hatine dayîn. Avahî û şûnmayî û berhemên mîmarî yên ku di vê serdemê de hatine çêkirin di vê beşê de derbas dibin. Herwiha Derheqê sûr, birc, keleh, qesr, pir, qenalên avê, seyrangeh, qubbe, mizgeft û nexweşxaneyên ku di vê serdemê de hatine çêkirin de agahî hatine dayin. Di vê beşê de qala kevneşopî û tore, bîr û bawerîyên di serdema kurdên Merwanî de hatiye kirin. Çalakîyên di warê weqf alîkarîyê, aborî û bazireganîyê de hatine vegotin.

**Peyvên Sereke**: Kurd, Dîroka kurdan, Kurdên Merwanî, Îbnu’l-Ezreq, Tarîxu Meyyafariqîn, Mîr.

# ÖZET


## İBNU'L-EZRAK'IN TARİHU MEYYAFARIKİN ADLI ESERİNDE MERVANİ KÜRTLERİ

Bu tezin konusu İbnu'l-Ezrak'in Tarihu Meyyafarıqin adlı eserinde Mervani Kürtleridir. İbnu'l-Ezrak'in bu eseri Mervani Kürtleri hakkında ayrıntılı bilgi veren ilk eserdir.

Tezin amacı Mervani hanedanını incelemek ve bu hanedanın özellikleri tespit etmektir. Tez İbnu'l-Ezrek'in bu eseri ile sınırlandırılmıştır ve giriş ile üç bölümden oluşmaktadır.

Giriş bölümünde tezin yazılış amacı, konusu, çerçevesi, yöntem ve kaynakları belirtilmiştir.

Birinci bölümde bu eserin yazarı olan İbnu'l-Ezrek'in hayatı, gezdiği yerler, devlet yönetimindeki görevleri, ilmi kişiliği ve eserleri ele alınmıştır. Yine bu bölümde Tarihu Meyyafarkin hakkında bilgi verilmiş, önemi ve özellikleri ve üzerinde yapılan çalışmalar, içeriği, kaynakları ve yöntemi dile getirilmiştir. İbnu'l-Ezrak gezip gördüğü bölgeler, şehirler ve devletler hakkındaki görüş ve düşüncelerini ve oralardaki tecrübelerini yazmıştır. Biz de bu bölüm de Tarihu Meyyafarıqin ve İbnu'l-Ezrek hakkında bilgi verdik. Eserin özelliklerini, önemini, içeriğini, kaynaklarını, yöntemini ve üzerinde yapılan çalışmaları dile getirdik.

İkinci bölümde Mervani Kürtleri ve bu hanedanın emirlerinin dönemleri ele alınmıştır. İkinci bölüm altı tane alt bölümden oluşmaktadır ve bu alt bölümlerin konuları şu şekildedir: Mervani Kürt yönetiminin başlaması, Emir Ebu Ali Hasan bin Mervan, Mumehidudevle Ebu Mansur, Nesruddevle Ebu Nasr Ahmed bin Mervan,

Emir Nizameddin, Nesruddewle Mensur dönemleri ve Mervani henedanının yıkılışı. Bu bölümde emirlerin hayatları, yönetimlerinin başlangıcı, iç ve dış ilişkileri ve öümleri dile getirilmiş. Bu bilgilere göre Mervani emirliğininin temelleri Bad bin Dostık döneminde atılmış ve Emir Nasrudevle döneminde altın çağını yaşamıştır. Emir Nizamedin döneminde yavaş yavaş Selçukluların etkisine girmiş ve Emir Nesrudevle Mansur döneminde Selçuklular tarafından ortadan kaldırılmıştır.

Üçüncü bölümde Mervani hanedanı döneminde Mervani Kürtlerinin oluşturdukları ve Tarihu'l-Meyyafarıkin'de geçen kültür ve medeniyet ele alınmıştır. Ayrıca bu bölümde devlet yönetimi, adalet ve yargı, bilim ve sanat, askerlik ve güvenlik, mimari ve şehircilik, ekonomi ve ticari hayat, inaç ve toplumsal hayat konuları yorumlanmıştır. Ayrıca devlet yönetiminde emirlerin özellikleri ve tahta çıkış şekilleri, vezir, vali ve divan işleri hakkında bilgi verilmiş. Mervani dönemi kadılarından bahsedilmiş ve bu kadıların özellikleri, yargılama şekilleri dile getirilmiştir. Mervani Kürtlerinin orduları, bu ordunun durumu ve özellileri ve ordunun kullandıkları silahlar hakkında bilgi verilmiş. Bu döneme ait bina, kalıntı ve mimari eserlere ait bilgiler bu bölümde verilmiş. Ayrıca bu dönemde yapılmış olan sur, burc, saray, mesire, kubbe, cami ve hastaneler hakkında bilgi verilmiş. Bunun yanında Mervani Kürtleri dönemindeki adet, gelenek, görenek ve inanışlar hakkında bilgi verilmiş. Mervanilerdeki vakıf ve yardımlaşma, ekonomi ve ticari faaliyetler hakkında bilgi verilmiş.

**Anahtar Kelimeler**: Kürt, Kürt Tarihi, Mervani Kürtleri, İbnu'l-Ezrak, Tarihu Meyyafarıkin, emir.

**SUMMARY**

**THE MARWANID KURDS IN THE WORK OF IBNU'L EZREK: TARİHU MEYYAFARIQİN**

The subject of thisthesis is the Marwanid Kurds in the work of Ibnu’l-Ezrek; Tarihu Meyyafarıqin.

This work of Ibnu’l-Ezrek is the first one giving detailed information aboutthe Marwanid Kurds. The aim of this thesis is to examine the Dynasty of Marwandi and to determine the qualities of the Dynasty. The thesis is limited to the work and the Marwanid Kurds and it consists of three parts with the introduction part.

In the introduction part, the aim of thethesis, the subject and the frame are defined.

In the first part, the life of the writer; Ibnu’l-Ezrek, the places he travelled, hisduties in state affairsand his scientific personality are focused on. Information on Tarihu Meyyafariqin, its importance and qualities, the studies made on this work, it scontent, sources and method are also included in this part. Ibnu'l Ezrek wrote his opinions, thoughts and experiences about the places he had seen. In this part, we gave information about Tarihu Meyyafariqin and Ibnu'l Ezrek. We also stated the qualities, importance, content, sources, method and referred studies about the work.

The second part deals with the Marwani Kurds and the periods of the governors of the Dynasty. The second part has six sub-parts which are; The beginning of Marvani Kurdish Government, Amir Abu Ali Hasan Bin Marwan, Mumahhiduddawla Ebu Mansur, Nasrudawla Abu Nasr, Ahmad Bin Marwan, Amir

Nizameddin, Nasrudawla Mensur eras and collapse of Marwani Dynasty. In this part, lives, beginnings of governance eras, internal and external relationships and deaths of Ameers have been emphasized. According to this information, the bases of Marwanid Emirate was formed in the era of Bad Bin Dostık and the Emirate lived its golden era under the rule of Aeemir Nasrudevle. In the period of Amir Nizameddin the Emirate had slowly gone under the influence of Saljuk and had been broken down by Saljuk in the era of Aeemir Nasrudevle Mansur.

The third part focuses on the cultural and civilisational aspects of the Marwanid Kurds in the works of Tarihu Meyyafariqin. Also in this part the issues of state management, justice and law, science and art, military and security, architecture and commerce, belief and social life have been commented. Besides, information about the qualities of Aeemirs in governing, the ways they moved to the throne and vizier, governor and council affairs has been given. Furthermore, the Cadis of Marvanid Era are being stated. Deeper information about their qualities and judging skills was given. The armies of Marvanid Kurds, the status, qualities and weapons of these armies have been emphasized. There's information on architectural works, old buildings and ruins. There's also information about the walls, bastions, palaces, resorts, domes, mosques and hospitals which had been built in that era. Besides, information about the customs, traditions, routines and belief of Marvanid Kurds has been given. We also gave information about foundation, charity, economy and commerce.

**Keywords**: Kurd, History of Kurds, The Marvanid Kurds, Ibnu'l Ezrek, Tarihu'l Meyyafarıqin, Amir.

# NAVEROK

**KURTE** .......... **III**

**ÖZET** .......... **V**

**SUMMARY** .......... **VII**

**NAVEROK** .......... **IX**

**KURTEBÊJE** .......... **XIII**

**PÊŞGOTIN** .......... **XIV**

**DESTPÊK** .......... **1**

1. Mijara Tezê .......... 1

3. Rêbaza Tezê .......... 3

4. Çavkanîyên Tezê .......... 4

**BEŞA YEKEM**

**ÎBNU’L-EZREQ EL-FARIQÎ Û TARÎXU MEYYAFARIQÎN**

1.1. Îbnu’l-Ezreq el-Fariqî .......... 6

1.1.1. Jîyana Wî .......... 6

1.1.2. Bajar û Welatên Ku Li Wan Deran Gerîyaye .......... 8

1.1.3. Peywirên Wî Yên Di Rêvebirîya Dewletê De .......... 10

1.1.4. Kesayeta Wî Ya Ilmî û Berhemên Wî .......... 12

1.2.Tarîxu Meyyafariqîn .......... 13

1.2.1.Taybetî û Girîngîya Berhemê .......... 13

1.2.2. Naveroka Berhemê .......... 16

1.2.3 Çavkanîyên Berhemê .......... 17

1.2.4. Rêbaza Berhemê .......... 20

1.2.5. Xebatên Ku Li Ser Berhemê Hatine Kirin .......... 21

1.2.5.1. Xebatên Amedroz û Mînorsky .......... 21

1.2.5.2. Xebata Bedewî Evdulletîf Awad .......... 22

1.2.5.3. Xebata Mehmet Emin Bozarslan ........ 23
1.2.5.4. Xebata Ahmet Savran ........ 24
1.2.5.5. Xebata Karim Farouk el-Xûlî&Yusuf Baluken ........ 24

## BEŞA DUYEM
## RÊVEBIRÎYA KURDÊN MERWANÎ

2.1. Destpêka Rêvebirîya Kurdên Merwanî ........ 26
2.1.1. Ebû Evdillah Badê Kurê Dostik (374/985-380/991) ........ 27
2.1.1.1. Bihêzbûna Rêvebirîya Bad ........ 28
2.1.1.2. Şerê Bi Hemdanîyan Re û Kuştina Bad ........ 30
2.2. Serdema Mîr Ebû Elî Hesenê Kurê Merwan (380/991-387/998) ........ 30
2.2.1. Şerê Di Navbera Merwanî û Hemdanîyan De ........ 32
2.2.2. Zewaca Ebû Elî ........ 33
2.2.3. Derxistina Hevrikên Mîr Ebû Elî ji Meyyafariqînê ........ 34
2.2.4. Kuştina Ebû Elî ........ 35
2.3. Serdema Mumehhîduddewle Ebû Mensûr (387/998-401/1011) ........ 37
2.3.1. Zewaca Mumehidudewle û Têkilîya bi Hemdanîyan re ........ 38
2.3.2. Desthilatdarîya Kurê Dimne li Amedê ........ 39
2.3.3. Kuştina Mumehhîduddewle û Desthilatdarîya Şêro li Meyyafariqînê ........ 41
2.4. Serdema Nesruddewle Ebû Nesr Ehmedê kurê Merwan (401/1011-453/1062) ........ 43
2.4.1. Stendina Meyyafariqînê û Dawîlêhatina Desthilatdarîya Şêro ........ 43
2.4.2. Stendina Amedê û Dawîlêhatina Desthilatdarîya Îbnî Dimne ........ 47
2.4.3. Bihêzbûna Desthilatdarîya Nesruddewle ........ 49
2.4.4. Jîyana Nesruddewle ........ 50
2.4.5. Kesên Ku Xwe li Nesruddewle Girtibûn ........ 51
2.4.6. Destpêka Têkilîyên Merwanî û Selçûqîyan ........ 52
2.4.7. Wezîrên Nesruddewle ........ 55
2.4.7.1. Xoce Ebû'l-Qasim ........ 56
2.4.7.2. Ebû'l-Qasimê Mexribî ........ 56
2.4.7.3. Fexruddewleyê kurê Cehîr ........ 57
2.4.8. Mirina Nesruddewle ........ 58
2.5. Serdema Mîr Nîzameddîn (453/1062-472/1080) ........ 59
2.5.1. Êrîşa Salarê Xorasan a Meyyafariqînê ........ 60

2.5.2. Mîr Seîd û Têkoşîna ji bo Desthilatdarîyê ........................................................ 61
2.5.3. Rola Kurdên Merwanî Di Şerê Melazgirdê De.................................................. 63
2.5.4. Wezîrên Nîzameddîn.......................................................................................... 66
2.5.4.1. Fexruddewleyê kurê Cehîr ............................................................................ 67
2.5.4.2. El-Ecel Ebû'l-Fadl Îbrahîmê Kurê Enbarî ...................................................... 68
2.5.4.3. Ebû Tahir Selame............................................................................................ 68
2.5.6. Mirina Mîr Nîzameddîn ..................................................................................... 68
2.6. Serdema Nasiruddewle Mensûr û Hilweşîna Mîrnişîna Merwanîyan (472/1080-478/1086) ..................................................................................................... 69
2.6.1. Wezîrên Nasiruddewle Mensûr......................................................................... 69
2.6.1.1. Ebû Tahir Selameyê Kurê Enbar ................................................................... 70
2.6.1.2. Ebû Salim........................................................................................................ 70
2.6.1.3. Îbnî Esed ......................................................................................................... 71
2.6.2. Hilweşîna Mîrnişîna Merwanîyan..................................................................... 72
2.6.2.1. Destpêka Hilweşînê û Sedemên Wê ............................................................... 72
2.6.2.2. Êrîşa Selçûqîyan û Dagirkirina Welatê Merwanîyan...................................... 75
2.6.3. Vegerîna Nasiruddewle Mensûr û Hêvîya Vejandina Mîrnişîna Merwanîyan .... 78
2.6.4. Mirina Nasiruddewle Mensûr ........................................................................... 80
2.6.5. Destpêka Rêvebirîya Walîyên Selçûqî li Welatê Merwanîyan .......................... 80
2.6.4.1. Fexruddewleyê kurê Cehîr ............................................................................. 81
2.6.4.2. Amîdulmulk Ebû Elî el-Belxî ......................................................................... 82
2.6.4.3. Amîdûdewleyê Kurê Fexruddewle ................................................................. 83
2.6.4.5. Ebû Tahir Enbarî............................................................................................. 85
2.6.6. Piştî Hilweşîna Mîrnişîna Merwanîyan Rewşa Welatê Wan ............................. 85

**BEŞA SÊYEM**

**ÇAND Û ŞARISTANÎ DI SERDEMA KURDÊN MERWANÎ DE**

3.1. Rêvebirîya Dewletê............................................................................................ 88
3.1.1. Mîr..................................................................................................................... 88
3.1.2. Wezîr.................................................................................................................. 89
3.1.3. Walî.................................................................................................................... 90
3.1.4. Karên Dîwan û Nivîsvanîyê ................................................................................ 91
3.2. Pergala Hiqûqê..................................................................................................... 92

3.2.1. Qanun û Cezakirin ........ 92
3.2.2. Qazîtî û Darizandin ........ 92
3.3. Zanist û Huner ........ 94
3.3.1. Zanyarî û Teknîk ........ 94
3.3.2. Helbest ........ 95
3.4. Artêş û Ewlehî ........ 96
3.4.1. Artêş ........ 96
3.4.2. Çek ........ 97
3.5. Avahîsazî û Bajarvanî ........ 98
3.5.1. Sûr ........ 98
3.5.2. Birc ........ 99
3.5.3.Keleh ........ 99
3.5.4. Qesr ........ 99
3.5.5. Pir ........ 100
3.5.6. Qenalên Avê ........ 101
3.5.7. Seyrangeh ........ 102
3.5.8. Qubbe ........ 102
3.5.9. Mizgeft ........ 102
3.5.10. Nexweşxane ........ 103
3.6. Jîyana Aborî û Bazirganîyê ........ 103
3.6.1. Aborî ........ 103
3.6.2. Bazirganî ........ 104
3.6.3. Bac ........ 106
3.6. 4. Pere ........ 106
3.7. Bîr û Bawerî ........ 107
3.7.1. Dîn û Mezheb ........ 107
3.7.2. Stêrzanî û Bawerîyên Batil ........ 109
3.8. Jîyana Civakî ........ 110
3.8.1. Kevneşopî ........ 110
3.8.2. Weqf û Alîkarî ........ 111
**ENCAM ........ 112**
**ÇAVKANÎ ........ 114**

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **amd**. | Amadekar |
| **bnr.** | Binêre |
| **c.** | :Cild |
| **c.t.** | Cihê çapê tuneye. |
| **d.t.** | Dîrok tuneye |
| **h.b.** | :Heman Berhem |
| **h.g.** | Heman Gotar |
| **r.** | Rûpel |
| **thq.** | Tehqîq |
| **w.t.** | Weşanxane tuneye. |
| **wer.** | Werger |
| **hz.** | Hezretî |

# PÊŞGOTIN

Mijara vê tezê kurdên Merwanî di Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq de ye. Me xwest em li ser vê berhema ku bi awayekî berfireh qala kurdên Merwanî, çand û şaristanîya wan dike bixebitin.

Xebatên dîrokî divê xwe bispêrin belge û çavkanîyan. Lê em dizanin ku serdema navîn ji hêla berhemên dîrokî ve zêde ne dewlemend e. Ev kêmasî di warê dîroka kurdan de bêtir derdiveke pêş. Ji ber vê yekê hem ji bo taybetîya vê berhemê û nivîskarê wê û hem ji bo serdema ku tê de hatiye nivîsandin ev pirtûk di warê dîrokê de çavkaniyeke girîng e.

Em ji gotinên Fariqî fam dikin ku wî di sala 572/1176an de dest bi nivîsandina vê berhemê kiriye. Destxeta vê berhema Fariqî a bi navê Tarîxu Meyyafariqîn di muzeya British a li Londonê de ye. Li heman muzeyê du nusxeyên berhemê hene. Ya yekem ji 400 rûpelî pêk tê û bûyerên heta sala 572/1176an vegotine û nusxeya duyem jî di heman cihî de ye, ji 276 rûpelan pêk tê û bûyerên heta sala 560/1164an vegotine.

Di tezê de me hewl daye ku di vê pirtûkê de agahî û zanînên derbarê kurdên Merwanî, mîrên wan û çand û şaristanîya wan de tesbît bikin, van agahîyan şîrove bikin û li gorî mijar û demê bi awayekî sîstematîk binivîsin.

Di nivîsandin û tekûzkirina vê tezê de keda gelek kesan heye. Berî her tiştî ji bo di plankirina vê tezê de, di pêvajoya amadekirin, nîrxandin û sererastkirina wê de alîkarîya min kir ez spasîyên xwe pêşkêşî şêwirmendê xwe birêz *Tahirhan Aydın* dikim. Ji bo peydakirina çavakanîyan û nirxandina naveroka tezê ji birêz *Yusuf Baluken*, ji bo nirxandina tezê ji *Osman Aslanoğlu* re spas dikim.

Herwiha di peydekirina çavkanîyên erebî de Îbrahîm Abbas û di sererastkirinê de Volkan Korkmaz alîkarîya min kir, mala wan ava.

Batman-2016

# DESTPÊK

## 1. Mijara Tezê

Piştî sedsala IV/X[1]'an rêvebirîya navêndî ya Dewleta Ebbasî lawaz bû û şer û pevçûnên ji bo rêvebirîyê dest pê kir û li welatê misilmanan dewlet û mîrnişînên xweser ên bi navê Tewaîfu'l-Milûk[2] ava bûn. Di vê serdemê de kurdan jî Mîrnişînên Xweser damezirandin. Di nîveka duyem a sedsala V/XI'an de dema Selçûqî hatin Azerbeycan, Kurdistan, Erran û rojavayê Anadolê li vir mîrnişînên Rewadî, Şeddadî, Merwanî û Annazî hebûn.[3] Bi lawazbûna dewleta Ebbasîyan û yekîtîya misilmanan re rêvebirîyên xweser hatin damezirandin.[4] Yek ji van rêvebirîyên xweser ku di van şert û mercan de hat damezirandin û bihêz bû, mîrnişîna Merwanîyan bû.

Miijara vê tezê tesbîtkirina agahîyên derbarê kurdên Merwanî yên ku di Tarîxu Meyyafarqîn a Îbnu'l-Ezraq de hatine nivîsandin e. Mijar bi kurdên Merwanî û Tarîxu Meyyafarqînê hatiye sînorkirin. Ji ber vê yekê agahîyên derbarê kurdên Mêrwanî ku di vê pirtûkê de derbas nebûne û agahîyên derbarê kurdên ku ne ji mîrnişîna Merwanîyan in nehatine vegotin.

Di tezê de li ser mîrnişîna Merwanîyan tê rawestandin. Jîyana mîrên wan û têkilîyên wan ên navxweyî û derveyî tên vegotin. Di pêvajoya vê serdemê de kar, xebat û çalakîyên kurdên Merwanî yên sîyasî, çandî û şaristanî tên vegotin.

---

[1] Dîroka pêşî hicrî û ya duyem Mîladî ye. Ji niha û pê ve di metnê de dîrok dê bi vî awayî bên nivîsandin. Ji bo wergerandina mîladî/hicrî. Bnr. http://www.i-takvim.com/takvimler/hicri_takvim_cevir.php. (11/06/2016)

[2] Ev rêvebirîyên biçûk ên ku piştî lawazbûna dewleta Ebbasî derketin holê di nav sînorên xwe de xweser bûn lê girêdayî dewleta Ebbasî bûn.

[3] Faruk Sümer, Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü, Selçuklu Tarih ve Medeniyeti Enstitüsü Yayınları, Ankara 1992, r.2.

[4] İzzet Çıvgın, *Ortaçağ Tarihi,* Akademi, Ankara 2008, r.514.

## 2. Armanca Tezê

Armanca vê xebatê vêkolîna li ser kurdên Merwanî û ronîkirîna serdema wan e. Xebat ji sê beşan pêk tê.

Beşa yekem tenê derbarê nîvîskarê Tarîxu Meyyafariqîn û nivîskarê wê Îbnu'l-Ezraq el-Fariqî de ye lê beşên eslî yên tezê ku ji bo aramanca vê tezê hatine nivîsandin beşên duyem û sêyem in.

Di beşa duyem a bi navê *Rêvebirîya Kurdên Merwanî* de destpêka mîrnişîna Merwanîyan, jîyana mîrên wan û di serdema wan mîran de kar û xebatên ku hatine kirin û têkilîyên wan ên derveyî û navxweyî hatine vegotin. Bi vê beşê ronîkirina jîyana mîrên Merwanî û tevgerên di serdema wan de hatiye armanckirin.

Di beşa sêyem a bi navê *Çand û Şaristanî Di Serdema Kurdên Merwanî* de di seranserê rêvebirîya merwanîyan de vekolîn û vegotina xebatên di warê rêvebirî, dadmendî, zanist, huner, artêş, avahîsazî, aborî, bawerî û jîyana civakî de hatiye armanckirin. Ev pirtûkeke pir girîng e lewra gelek agahîyên vê pirtûkê yên derbarê çand û şaristanîya kurdan de di wan pirtûkên din ên derbarê vê serdemê de derbas nabin.

Derbarê gelek avahîyên vê serdemê de agahî hene. Hinek ji van avahîyan dimînin û hinek ji wan jî hêja nehatine dîtin. Mimkun e ku ev xebat rê li ber lêkolîneran veke û bikevin pey şopa van avahîyan. Jixwe armanceke sereke ya nivîsandina vê tezê jî ev e.

Sedemê hilbijrtina vê mijarê hem bi qirîngîya pirtûk û nivîskarê wê û hem jî bi mijara vê pirtûkê ve girêdayî ye. Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq di sedsala VI/XII'an de hatiye nivîsandin.[5] Di warê dîroka kurdan û bi taybetî dîroka kurdên Merwanî de pir biqîmet e. Lewra beşeke pirtûkê ya serbixwe derbarê kurdên Merwanî de hatiye nivîsandin. Hem dema em jîyana Îbnu'l-Ezreq jî bidin ber çavên

[5] Îbnu'l-Ezraq: Tarîxu'l-Fariqî, (Thq. Kerîm Faruk el-Xûlî &Yusuf Baluken), Nûbihar, İstanbul 2014, Teqdîm, r.12.

xwe em fam dikin ku ev ne pirtûkeke ji rêzê ye. Ji ber ku "Fariqî di serdema Artuqîyan de di rêvebirîya dewletê de cih girtiye û karê rêvebirîya weqfan meşandiye"[6] û "bapîrê wî jî di dema Merwanîyan de nazirtîya Hiskêfê[7] kiriye"[8] îhtîmal heye ku Fariqî xwe gihandibe belgeyên fermî yên dewletê û di nivîsandina vê pirtûka xwe de ji wan sûd wergirtibe. Dîsa ji ber ku heta niha xebateke akademîk a bi kurdî, bi vê rêbazê û di vê pirtûkê de li ser kurdên Merwanî nehatibû kirin, me xwest em di vî warî de vê valahîyê dagirin û ji bo kesên ku li ser kurdên Merwanî, çand û şaristanîya van bixebitin rêyekî vekin.

### 3. Rêbaza Tezê

Mijara vê tezê bi kurdên Merwanî û pirtûka Tarîxu Meyyafariqîn hatiye sînorkirin. Di rêbaza lêkolîn û nivîsandinê de jî li gorî vê çarçoveyê mijar hatine niqaşkirin û nivîsandin. Ji ber vê yekê me qala agahî û bûyerên derbarê kurdên Merwanî yên ku di vê berhemê de tunin nekiriye. Lê gelek agahî û bûyerên ku di Tarîxu Meyyariqîn de hatine nivîsandin û di heman demê de di berhemên din ên serdema navîn de derbas dibin hatine destnîşankirin.

Di Tarîxu Meyyafariqîn di beşên ku qala Merwanîyan dikin de bûyer û rûdanên vê serdemê li gorî serdema mîran hatine vegotin. Lê ji bo serdema hinek mîran navê beşê nehatiye nivîsandin û carinan hinek agahîyên serdema mîrekî di beşa mîrekî din de hatine vegotin. Me di vê xebatê de buyerên dîrokî, li gor serdema mîran nivîsandin.

Ji bilî beşên duyem û sêyem ku kakilê tezê pêk tînin me di beşa yekem de qala jîyana Îbnu'l-Ezreq û pirtûka wî Tarîxu Meyyafarqîn kir. Jixwe agahîyên derbarê jîyana Îbnu'l-Ezreq de tenê di berhema wî de hene ew jî di bi awayekî berbelav derbas dibin. Me ev agahîyên derbarê jîyana nivîskar de di beşa yekê de bi awayekî kronolojîk nivîsandin. Herwiha hinek şîrove û agahîyên derbarê Îbnu'l-

[6] el-Fariqî, h.b., r.593.
[7] Di berhemên dîroknasên serdema navîn de navê wê Hisn Keyfa derbas dibe. Dikeve rojhilatê çemê Dîjleyê. Li Başûrê wê Çîyayên Mîdyadê û li bakûrê wê jî çîyayê Ramanê heye. Bnr. Burhan Zengin, Hasankeyf Tarihi ve Eserleri,w.t., c.t, 2001, r.19.
[8] el-Fariqî, h.b., r.522.

Ezreq û Tarîxu Meyyafariqîn de di xebatên ku li ser berhemê hatine kirin de derbas dibûn û me ji van jî sûd wergirt.

Me di beşa duyem a bi navê *Rêvebirîya Kurdên Merwanî* de ji bo her mîrekî beşeke cuda vekir. Agahîyên derbarê jîyana mîran, bûyerên sîyasî û rêvebirî, di vê binbeşê de hatine vegotin.

Çalakîyên çand û şaristanîyê yên di serdema kurdên Merwanî ku di vê berhemê de derbas dibin di beşa sêyem a bi navê *Çand û Şaristanî Di Serdema Kurdên Merwanî de* hatine vegotin.

Di vê xebata xwe de me pirtûka ku ji alîyê Baluken û Xûlî ve hatiye tehqîqkirin esas girtiye. Herwiha ji bo agahîyên ku me ji metnên Tarîxu Meyyafariqîn wergirtine me ev xebat wek çavkanî destnîşan daye.[9] Lê ji xeynî vê xebatê me ji teqdîm û jêrenotên çend xebatên din ên ku li ser Tarîxu Meyyafariqîn hatine kirin jî sûd wergirtiye û di nivîsîna çavkanîyên van xebatan de me navê werger û muheqiqê wan destnîşan kirine.[10]

**4. Çavkanîyên Tezê**

Di nivîsandina vê tezê de çavkanîyên sereke ku me ji wan sûd wergirtiye em dikarin bikin sê beş:

Yên pêşî çavkanîyên ku hem bi awayê weşandinê û hem bi awayê wergerê li ser Tarîxu Meyyafariqîn hatine kirin in. Hem di pêşgotina van xebatan, hem di jêrenotên wan de gelek agahîyên ku bi saya wan ev xebata me têkûztir dibû hebûn. Em bi saya gotara Amedrûz a bi navê *Three Arabic MSS. on the History of the City of Mayyafariqin* û gotara Mînorsky ya bi navê *Caucasica in the History of Mayyafariqin* hin agahîyên derbarê pirtûkê de hîn bûn. Wekî din me jî xebata Bedewî Evdilletîf Awad a bi navê *Tarîxu'l-Fariqî,* Xebata Karim Farouk el-Xûlî û Yusuf Baluken a bi navê *Tarîxu Meyyafariqîn* sûd wergirt. Ji bilî van ji du xebatên

---

[9] Wek mînak: el-Fariqî, h.b., r.512.
[10] Wek mînak: Savran, h.b., teqdîm, r.12.

ku ji wergera hinek beşên pirtûkê pêk tên hatiye îstîfadekirin. Yek ji van wergera Mehmet Emîn Bozarslan a bi navê *Mervani Kürtleri Tarihi* û ya din *Meyyafariqîn ve Amîd Tarihi* ya Ahmet Savran e.

Çavkaniyên duyem ên ku bi temamî li ser dîroka Merwanîyan hatine nivîsandin jî ev in: Pirtûka Evdilreqîb Yûsuf a bi navê *ed-Dewletu'd-Dostekîyye fî Kurdistanî'l-Wusta* ji du cildan pêk tê û bi awayekî berfireh li ser dîroka Merwanîyan û çanda wan disekine. Pirtûka din a li ser Merwanîyan ya Thomas Ripper a bi navê *Diyarbakir Merwanileri Ortacağ'da Bir Kürt Hanedanı* di vê pirtûkê de qala şert û mercên damezirandin û hilweşîna vê mîrnişînê, tevgerên siyasî yên mîrên wan, hilweşîna vê mîrnişînê û bandora selçûqîyan li ser vê herêmê, demografîya herêmê, rewşa mîrnişînê ya aborî û jîyana çandî tê kirin. Pirtûka din ya li ser Merwanîyan ku me jê sûd wergirtiye xebata Abdurrahim Tufantoz a bi navê *Ortaçağ'da Diyarbekir Mervanoğulları* ye. Tufantoz di vê pirtûka xwe de pêşî qala çavkanîyên li ser vê mijarê dike û agahîyên li ser herêma ku Merwanî tê de dijîn dide. Piştre qala damezrîna Merwanîyan, pêşketîna dewleta wan û hilweşîna wan dike.

Hinek çavkanî jî rasterast ne li ser Merwanîyan hatine nivîsandin lê di hinek beşên xwe de qala wan dikin. Em dikarin çavkanîyên bi vî rengî ku me di xebata xwe de ji wan sûd wergirtiye wisa bînin zimên: Îbnî Şeddad di pirtûka xwe ya bi navê *el-Alaqu'l-Xetîre fî Zikrî Ûmeraî'ş-Şam we'l-Cezîre* de gelek bûyerên Tarîxu Meyyafarqînê rasterast wergirtine û navê berhemê, navê nivîskarê wê di vê pirtûkê de derbas dibe. Herwiha Îbnu'l Esîr di pirtûka xwe ya bi navê *el-Kamîl fi't-Tarîx* de, Îbnî Xeliqan di pirtûka xwe ya bi navê *Wefayatu'l-Ayan* de, Sibt Îbnu'l-Cevzî di pirtûka xwe ya bi navê *Miratu'z-Zeman fi Tarihî'l-Ayan de Selçuklular* de, Mihemed Emîn Zekî di pirtûka xwe ya bi navê *Dîroka Kurd û Kurdistanê* de, Şerefxanê Bedlîsî di pitûka xwe ya bi navê *Şerefname* de, Şevket Beysanoğlu di pirtûka xwe ya bi navê *Anıt ve Kitâbeleriyle Diyarbakır Tarihi* de û Yusuf Baluken di teza xwe ya bi navê *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar* de gelek agahî derbarê Merwanîyan de dane û me di vê tezê de ji van xebatan sûd wergirt.

# BEŞA YEKEM

## ÎBNU’L-EZREQ EL-FARIQÎ Û TARÎXU MEYYAFARIQÎN

### 1.1. Îbnu’l-Ezreq el-Fariqî

#### 1.1.1. Jîyana Wî

Navê wî Ehmedê kurê Yusuf kurê Elî kurê Ezreq e; lê wek Îbnu’l-Ezreq el-Fariqî tê naskirin.[11] Ji ber ku ji Farqînê ye jê re el-Fariqî hatiye gotin. Wekî ku Ebû’l-Fîda gotiye carinan ji dawîya peyvê hinek tîp kêm dibin, li vir jî peyva Fariqîn bûye Fariqî.[12] Agahîyên derbarê jîyana wî de di tu berheman de negihane ber destê me. Tiştekî balkêş e digel ku Îbnu’l-Ezreq yek ji dîroknûsên girîng tê hesibandin jî dîroknûsên wek Îbnî Xeliqan, Îbnî Şakir, Yaqût û dîroknûsên din qet qala jînenîgarîya wî nekirine. Agahîyên derbarê jîyana wî de tenê em dikarin ji berhema wî hîn bibin û ew jî di nav berhemê de berbelav in.[13] Îbnu’l-Ezreq di berhema xwe ya Tarîxu Meyyafariqîn de dibêje: Ez di sala 512/119an de li Meyyafariqînê[14] çê bûme. Hingê talîhê birca Merîxê nîşan dida.[15]

Navê Îbnu’l-Ezreq di berhema wî de derbas nabe.[16] Îbnî Şeddad di pirtûka xwe ya bi navê *el-Alaqu’l-Xetîre* de derbarê navê berhema wî de agahî dane û gotiye:

[11] Îbnu’l-Ezraq: *Tarîxu’l-Fariqî*, (Thq.Bedewî Evdulletîf Awad), Qahîre 1959, Teqdîm, r.31.
[12] Ebû’l-Fîda, *Teqwîmu’l-Buldan*, Daru Sedr, Beyrûd, d.t. r.279.
[13] Awad., h.b., Teqdîm, r.31.
[14] Bajarekî di navbera herêma Cezîre û Ermîyanê de ye. Hinek, wê ji herêma Ermenîyan û hinek ji cezîreyê dihesibînin. Dikeve rojhilatê Dijleyê ji Amedê pênc fersax dûr e. Muhammed bin Evdilmunim Hîmyerî, (Thq. Îhsan Ebbas) *Rewdetu’l-Mitar fî Xeberu’l-Eqtar,* Mektebetu’l-Lubnan 1984, r.567.
[15] el-Fariqî, h.b., r.552.
[16] Hem ji nusxeya pirtûka Fariqî ya yekem û hem ji ya duyem hinek rûpel winda ne ku hejmara wan nayê zanîn û mimkun e ku ew rûpelên ku navê Fariqî li ser wan winda bûbin. Bnr.el-Xûlî&Baluken,h.b., Teqdîm, r.22.

“Navê wî “Ehmedê kurê Yûsuf kurê Elî kurê Ezreq” e û xwedîyê pirtûka “Tarîxu Meyyafariqîn û Amed”e.[17]

Fariqî di pirtûka xwe de gelek caran qala bapîrê xwe dike. Navê Bapîrê wî Ebu’l-Hesen Reîs Elîyê kurê Ezreq û li Hiskêfê nazir e. Fariqî derbarê kalikê xwe de wiha dibêje: “Piştî ku Fexruddewle rêveberîya Merwanîyan xist destê xwe wezîr Îbnu'l-Enbarî ji girtîgehê derxist û şand cem kalikê min Ebu'l-Hesenê kurê Ezreq ku nazirê Hiskêfê bû.[18] Fexruddewle gazî papîrê min dike ew jî ji Hiskêfê tê Meyyafariqînê û Fexruddewle hinek mal û tiştên biqîmêt dide bapîrê min.”[19] Di cihekî din de jî Faroqî wiha qala bapîrê xwe dike: “Fexruddewle, Ebû Elî Belxî bû walîyê welatê Merwanîyan û gel jê gilîdar bû. Li ser vê lineyek çû cem siltan ku gilîyê Ebû Elî bikin û hingê bapîrê min jî di nav wan de bû.[20] Wekî din agahîyên derbarê bapîrê Fariqî de bi vî awayî di Tarîxu Meyyafarqîn de derbas dibin: Dema siltanê Selçûqî gazî walîyê welatê Merwanîyan kir dîsa lijneyek pê re çû û di vê lijneyê de jî bapîrê Fariqî hebû. Herwiha piştî ku siltan walîtîya welatê Merwanîyan da Amîdudewle keleha Erzenê jî dabû bapîrê Fariqî.[21]

Îbnu’l-Ezreq ji ciwantîya xwe û vir ve hin agahî derbarê jîyana xwe de dane. Lê qala zaroktîya xwe nekiriye.[22]

Îbnu’l-Ezreq di serdema damezrînerê Artûqîyên Mêrdînê Necmeddîn Îlxazî de çê bûye û di serdema rêvebirîya kurê Necmeddîn Tîmurtaş û nevîyê wî Necmeddîn Alp de jîyaye.[23] Dema nozdeh salî ye cara pêşî ji Meyyafariqînê derdikeve diçe Mêrdînê û demekê di xizmeta Husameddîn de dimîne.[24] Em ji berhema wî fam dikin ku Fariqî pir gerîyaye. Li bajarên Fars, Ermenistan, Şam û bajarên derûdora wê, li el-Cezîreyê[25] û gelek û cihên din gerîyaye. Di vê gera xwe de

---

[17] el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.22.
[18] el-Fariqî, h.b., r.522.
[19] el-Fariqî, h.b., r.522.
[20] el-Fariqî, h.b., r.525.
[21] el-Fariqî, h.b., r.522.
[22] Awad, h.b., Teqdîm, r.31.
[23] Îbnu’l-Ezraq, *Meyyafarikîn ve Amed Tarihi*, (Wer. Ahmet Savran), Atatürk Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi, Erzurum 1990, Teqdîm, h.b., r.10.
[24] Savran, h.b., Teqdîm, r.11.
[25] el-Cezîre gelek deveran di nava xwe de dihewîne, Mûsil, Sencar/Şengal, Heran, Ruha, Reqqa, Resuleyn, Diyarbekir, Meyyafarqîn û deverên ku di navbera çemê Dijle û Feratê de dimînin. Bnr.Ebû’l-Fîda, h.b., r.27.4.

çûye cem gelek rêvebirên dewletan[26] û di rêvebirîya dewletê de cih girtiye û hinek peywirên girîng wergirtine.[27]

Ji ber ku di berhema Îbnu'l-Ezreq de beşa ku qala bûyerên 572/1176an dike winda bûye em agahîyên derbarê bûyerên van salan û dîroka mirina wî de nizanin.[28] Lê li ser destxeteke Îhya'û Ulûmu'd-Dîn a Xezalî nîşeyeke Îbnu'l-Ezreq heye dibêje: "Min ev berhem du caran xwendiye. Xwendina min a cara duyem di sala 577/1181ê de ye." Herwiha ji vê nivîsê tê famkirin ku Fariqî heta vê salê sax e.[29]

### 1.1.2. Bajar û Welatên Ku Li Wan Deran Gerîyaye

Îbnu'l-Ezreq li gelek bajar û welatan gerîyaye û serpêhatî û nêrînên xwe yên derbarê van cihan de û tîştên ku li van deran dîtine di berhema xwe ya bi navê Tarîxu Meyyafariqîn de nivîsandine.

Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq di sala 529/1134an de cara pêşî ji Meyyafariqînê derketiye çûye Mêrdînê û di sala 531/1136an de jî çûye Cezîreyê û ji wir di ser Nisêbînê re dîsa vegerîyaye Meyyafariqînê.[30]

Heta dawîya sala 533/1139an li Amedê dimîne û di meha[31] zilhîceyê de pêşî diçe Mûsilê hinekî li wir dimîne û di 534/1139an de di meha Rebîulewwelê de diçe Bexdayê û şeş mehan li wir dimîne. Li Bexdayê dema mehra Xelîfe Muqtefî û Fatma Xatûna keça Siltan Mihammed li Babû'l-Hicreyê tê birîn Îbnu'l-Ezreq jî li wir amade ye.[32] Di nav van gerên wî de çûyîna wî ya Bexdayê pir girîng e. Lewra bandora gera wî ya li Bexadayê hem li ser zanyarîya Fariqî bixwe û hem jî li ser bûyerên ku di

[26] Awad, h.b., Teqdîm, r.32.
[27] Awad, h.b., Teqdîm, r.35.
[28] Savran, h.b., Teqdîm, r.17.
[29] A.Hand List of the Arabic Mss , II, 56, Nimreya destxetê: 3376, v.233a. Vgh. Savran, h.b., Teqdîm, r.17.
[30] el-Fariqî, h.b., r.575-577.
[31] Tebax
[32] el-Fariqî, h.b., r. 534, 580.

pirtûka xwe de nivîsandine heye.[33] Fariqî li Bexdayê gelek alim û zana nas kirine û ji wan ders wergirtiye. [34]

Fariqî di sala 535/1140î de vedigere Meyyafariqînê û ji wir diçe Mêrdînê û demekê li wir dimîne û paşê ji wir diçe Mûsilê heta sala 546/1151î li Mûsilê dimîne[35] û di ser Xelatê re vedigere Mêrdînê û heman salê dîsa diçe Bexdayê.[36] Heta serê meha Receba sala 547/1152an li Bexdayê dimîne û ji wir di ser Mûsilê re vedigere Meyyafariqînê.[37]

Piştî mirina Husameddîn di sala 548/1153yan de Îbnu'l-Ezreq diçe Tiflîsê dikeve xizmeta Dimîtrîyê qralê Exbazê.[38] Fariqî di rêwîtîya Dimîtrî ya ku heftê rojî dom dike de cih digire û bûyerên ku di vê rêwîtîyê de qewîmine, tiştên ku dîtine di pirtûka xwe de nivîsandine.[39] Ji nav van rêwîtîyên Fariqî cihekî taybet ê rêwîtîya wî ya Gurcistanê heye. Lewra gelek agahîyên derbarê vî welatî, kevneşopîya wan, pergala wan de dide. Qala hinek bûyerên ku di navbera keyê Gurcistan û hinek hikumdarên misilmanan de derbas bûne dike ku ev agahî di tu berhemên din de tunin.[40]

Îbnu'l-Ezreq sala 549/1154an di 23yê Cemazîyelewwelê de ji Tiflîsê vedigere diçe Xelatê. Fariqî vegera xwe ya ji Tiflîsê wiha neqil dike: "Ez ji Xelatê hatim welatê Rûmê li vir Nîzameddînê kurê Danişmend xwest ku ez li cemê bimînim lê min ev daxwaza wî nepejirand û ji wir ez di ser Ercîş,[41] Bergirî, Nevşehr, Qutûr, Xoy Merend, Tebrîz, Zenkan û Nehrê de derbasî Reyê[42] bûm û piştre jî çûm Meyyafariqînê.[43]

33 Awad, h.b., Teqdîm, r.39.
34 Awad, h.b., Teqdîm, r.33-34.
35 Savran, h.b., Teqdîm, r.13.
36 el-Fariqî, h.b., r.580.
37 el-Fariqî, h.b., r.597.
38 el-Fariqî, h.b., r.600.
39 el-Fariqî, h.b., r.558.
40 Awad, h.b., Teqdîm, r.41.
41 Bajarekî dîrokî ye, nêzî bajarê Xelatê yê ku li derdora Ermenya mezin e. Piranîya gelê wê fileh in. Bnr Bnr. Yaqût el-Hemawî, Mucemu'l-Buldan, Daru Sedr, Beyrûd 1977, C.1 , r.144.
42 Bajarekî navdar e ji bajarên sereke tê hesibandin. Bajarekî bixêrûbêr e û têr mêwe ye. Betlîmos gotiye : Dirêjahîya Bajarê Reyê heştê û pênc pile ye e . Bnr. Yaqût, h.b.,, C.3 , r.106 – 107.
43 el-Fariqî, h.b., r.609.

Di sala 558/1162yan de dema ku Siltan Arslanşah û hêzên misilmanan ên din, Gurcî têk birin Îbnu'l-Ezreq tê Xelatê û ji wir jî diçe Bedlîsê. Fariqî bûyerên wê serdemê yên ku piştî vê serkeftina misilmanan pêk hatine dibêje: "Piştî vê serkeftîne sê sed dewar hat serjêkirin û goştê wan li feqîran hat belavkirin û herwiha Xelat hat xemilandin."[44]

Îbnu'l-Ezreq di sala 563/1168an de di ser Riha, Minbiç, Heleb[45] û Humusê re diçe Şamê.[46] Wextê bavê Selahedînê Eyyubî û girseyek, 24ê Cemazîyulewwela di sala 565/1169an ji Şamê diçin Misrê cem Selahedînê Eyyubî, Fariqî li Şamê ye.[47] Dîsa wexta Fariqî li Şamê ye di 22yê Şewala sala 565/1170yî de erdhejek li Şam û bajarên derûdora wê çê dibe. Îbnu'l-Ezreq bi awayekî berfireh qala vê erdhejê dike û derbarê wê de agahîyan dide.[48]

Fariqî di 13ê Cemazîyulewwela sala 566/1170yî de ji Şamê vedigere Meyyafariqînê.[49]

Di sala 568/1172yan de cara sêyem e ku Îbnu'l-Ezreq li Bexdayê ye. Piştre di sala 571/1175an de ji Bexdayê diçe Xelatê. Hatina wî ya xelatê rêwîtîya wî ya dawî ye ku di berhema xwe de qala wî dike.

### 1.1.3. Peywirên Wî Yên Di Rêvebirîya Dewletê De

Îbnu'l-Ezreq hêja di ciwanîya xwe de dest bi xebata di karûberên hikûmetê de kiriye.[50] Di sala 543/1148an de karê serperiştîya weqfên derveyê bajarê Meyyafariqînê dimeşîne.[51] Piştî vê peywira xwe li Şamê jî dîsa karên rêvebirîya weqfan dimeşîne. Fariqî wergirtina vê peywira xwe wiha tinê zimên: "Di nîvê meha Şabanê de ez ji Meyyafariqîn û Şamê derketim û di Riha, Minbîc, Heleb, Himis û

---

[44] el-Fariqî, h.b., r.625.
[45] Bajarekî gewre ye xwedî xêrûber e, Zûcacî gotiye: Ji ber ku Hz. Îbrahîm pezê xwe li vir didot û ew şîr li kesên herêmê digerand. Navê vir bûye Heleb. Bnr. Yaqût, h.b.,, C.2 , r.282 – 290.
[46] el-Fariqî, h.b., r.641.
[47] el-Fariqî, h.b., r.644.
[48] el-Fariqî, h.b., r.645.
[49] el-Fariqî, h.b., r.648.
[50] Awad, h.b., Teqdîm, r.31.
[51] el-Fariqî, h.b., r.593.

Hemayê re derbas bûm û di hivdehê Remezanê de gihame Şamê. Li wir ez çûm cem el-Mewla Kemaleddîn Îbnu'ş-Şarezorî Qadîyu'l-Qudat û wî nazirtiya vir dîsa[52] da min û ez li Şamê mam."[53]

Îbnu'l-Ezreq di xizmeta Seîd Husameddîn de jî hinek kar û peywir anîne cih lewra di sala 542/1147an de Husameddîn pereyên sifir çap dike û Îbnu'l-Ezreq ji bo çapkirina pereyan diçe Madenê û sifir dikire.[54]

Ji bilî van peywiran Îbnu'l-Ezreq carinan li cem hinek rêvebirên dewletê cih girtiye û peywirên girîng wergirtine. Îbnu'l-Ezreq dibêje ez di sala 544/1149an de li Mûsilê ji bo firotina hesin di xizmeta Husameddîn de bûm.[55] Dema Husameddîn mir ez li welatê Gurcan di xizmeta Melikê Exbaz, Dimîtrîyê kurê Dawud de bûm û di sala 548/1153yan de ez ketibûm xizmeta wî.[56]

İbnu'l-Ezreq piştî Şerê Tiflîsê yê ku di navbera Necmeddîn Îlxazî û Dimîtrî de pêk hatibû çûye Gurcistanê. Ji gotinên Fariqî tê famkirin ku ew pir nêzî Dimîtrî bû û qedr û qîmetê wî li cemê hebû. Lewra dema Fariqî û Dimîtrî bi hev re di rêwîtîyekê de ne û tên cem keleheke asê Dimîtrî ji Fariqî re dibêje: "Di vê kelehê de leşkerekî Îlxazî heye, here pê re biaxive ka ji kû ye." Fariqî dixe dilê xwe ku ji qral bixwaze ku wî berde. Lê li welatê qral gengeşîyekê dest pê dike serê sibehê key bi lezgînî leşkerên xwe radike û ji wir çûn. Ji ber vê yekê Fariqî derfeta dîtina vî kesê girtî jî bidest naxe.[57]

Li gorî Fariqî dibêje Dimîtrî gelek qencî bi misilmanan dikir û qedr û qîmetê ku dida alim û ehlê tesewifê di navbera misilmanan de jî nehatibû dîtin. Rojeke înê Dimîtrî çû mizgeftê û li temamê xutbeyê guhdarî kir û dema derket derve jî du sed dînar ji bo xêra mizgeftê dan.[58]

---

[52] Ji ber bikaranîna vê peyvê ورد الي: li min hat vegerandin mumkun ku berî niha jî Fariqî ev peywir li Şamê wergirtibe û ev wergirtina ya cara duyem be . Bnr. el-Xûlî&Baluken, Tarîxû'l-Meyyafariqîn, Jêrenot: 1, r.641.
[53] el-Fariqî, h.b., r.641.
[54] el-Fariqî, h.b., r.589.
[55] el-Fariqî, h.b., r.594.
[56] el-Fariqî, h.b., r.600.
[57] el-Fariqî, h.b., r.558.
[58] el-Fariqî, h.b., r.559.

Îbnu'l-Ezreq di sala 549/1154an de ji xizmeta Dimîtrî derdikeve û diçe Xelatê.[59] Di sala 567/1166an de diçe Meyyafariqînê û dest bi karê serperiştîya weqfên Meyyafariqînê dike.[60]

### 1.1.4. Kesayeta Wî Ya Ilmî û Berhemên Wî

Em dibînin ku Îbnu'l-Ezreq di vê pirtûka xwe de di warê dîrok, erdnîgarî, tefsîr û edebîyatê de ji gelek pirtûkan sûd wergirtiye û ji wan agahî veguhestine. Ev jî nîşan dide ku Fariqî xwedî çandeke dewlemend, ilmekî kûr û nêrîneke berfireh e.

Piştî salên ciwanîya xwe Îbnu'l-Ezreq çû Bexdayê û li wir ilmên wek Quran, Fiqih, feraîz, zimanzanî, hedîs û tefsîrê xwendin û li dersên gelek zana û muderisan guhdarî kir. Herwiha Fariqî Quran li cem Şêx Ebû Muhammedê kurê Bintuşêx, Şêx Evdulwehab el-Hefaf, Ebû Mensûr er-Rezaz, zanyarîya feraîzê li cem Şêx Ebu'l-Mizaferê kurê Şehrezorî Atar, zanyarîya rêzîman li cem Şêx Ebû Mensûr el-Cewaliqî û zanyarîya hedîsê jî li cem Îbnî Semerkandî, Evdulwehab el-Enmatî û Qadî Ebû Bekir xwendin.[61] Ji bilî van ji alimên mezin ên wek Waiz Ebbadî û Xeznewî ders wergirtin û di sohbet û civatên wan de cih girt. Digel zanebûna wî ya van zanyarîyên din wisa xuya dike ku kêfa Ezreq pir ji zanyarîya dîrokê re hatiye û nivîsandina dîrokê bijartiye.[62]

Îbnu'l-Ezreq berhema Tarîxu Meyyafariqîn nivîsandiye û ji bilî vê berhema wî tu agahî li ser hebûna berhemine wî yên din tuneye.[63]

---

[59] el-Fariqî, h.b., r.609.
[60] el-Fariqî, h.b., r.638.
[61] el-Fariqî, h.b., r.580-581; Awad, h.b., Teqdîm, r.34.
[62] Awad, h.b., Teqdîm, r.33-34.
[63] Savran, h.b., Teqdîm, r.18.

### 1.2.Tarîxu Meyyafariqîn

#### 1.2.1.Taybetî û Girîngîya Berhemê

Destxeta vê berhema Îbnu'l-Ezreq a bi navê Tarîxu Meyyafariqîn di muzeya British a li Londonê ye. Li heman Muzeyê du nusxeyên berhemê hene. Ya yekem di beşa destxeta "Opb And Mss" bi nimreya Or.5803an tomarkirî ye û ji 400 rûpelî pêk tê û bûyerên heta sala 572/1176an vegotine. Nusxeya duyem jî di heman cihî de bi nimreya Or.6310an tomarkirî ye, ji 276 rûpelan pêk tê û bûyerên heta sala 560/1164an vegotine.[64]

Dîroka nivîsandina vê berhemê bi awayekî teqez nayê zanîn. Mixabin Îbnu'l-Ezreq ûnivîskarên din qala dîroka nivîsandina vê berhemê û cihê ku lê hatiye nivîsandin nekirine. Lê tê texmînkirin ku Îbnu'l-Ezreq ev berhem di salên jîyana xwe yên pêşî de nenivîsadiye. Lewra wan salan bi peywirên curbecur ên dewletê ve mijûl bû û di van salan de dema wî ji bo nivîsandinê tune bû. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku Fariqî ev berhem di salên dawî yên jîyana xwe de nivîsandiye.[65] Em ji gotinên Fariqî fam dikin ku wî di sala 572/1176an de dest bi nivîsandina vê berhemê kiriye. Lewra Fariqî di rûpelên pêşî yên berhema xwe de gotiye: "Ez ê qala dîroka avakirina Meyyafariqînê û avakerê wê û rêvebirên wê yên heta îro ango sala 572/1176an bikim."[66]

Girîngîya vê pirtûkê ji bo lêkolîneran di warê avahîsazî, erdnîgarî, aborî, dîrok û zimên de heye û wek belgenameyekê ye ku agahiyên balkêş li ser gelek şûnwaran dide. Hinek ji wan şûnwaran dimînin û hin ji wan niha ji hole rabûne. Cihin jê wî bixwe dîtine û agahîyên hinekan jî ji wan pirtûkên din ên wek "*Et-Teşîs*"wergirtine.

---

64 el-Xûlî&Baluken,h.b., Teqdîm, r.7,12.
65 Awad, h.b., Teqdîm, r.22.
66 el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.102.

Girîngîyeke vê berhemê jî ev e ku: Fariqî li gelek cih û welatan gerîyaye û bûyer û karesatên ku li van welatan qewimîne di berhema xwe de nivîsandine.

Ji hêla aborî ve jî girîngîyeke wê heye. Lewra tê de agahîyên derbarê dahatuyên wê serdemê yên hinek herêman û çapkirina pereyan de hene.

Girîngîyeke wê ya din jî ji hêla dîrokê ve ye ji ber ku Îbnu'l-Ezreq qala dîroka Meyafarqînê û hinek hûrguliyên derbarê avahiyênwê de dike û derbarê serdema Hemdaniyan, Buweyhîyan, Merwanîyan û Artûqîyande agahîyan dide.

Ji ber ku rewşa pêşveçûnên rêziman û nûjenkirina hin têrmên hevedûdanî yên vê serdemê nîşan dide, diyarbûna bandora zimanê herêmî di pirtûkê de xuya dike û pevguhertinên di navbera zimanên hemdem de û ji zimanên din erebîkirina hin peyvan nîşan dide girîngîya vê pirtûkê di ware zimên de jî heye.[67]

Îbnu'l-Ezreq di rêvebirîya karên dewletê ên girîng de cih girtiye û herwiha ji ber vê taybetîya wî tiştên ku di serdema xwe de nivîsandine wek belgeyên fermî ku bi destên rayedarên dewletê hatine nivîsandin tên hesibandin. Li ser vê yekê jî em dikarin bibêjin ku ev berhema bi navê "Tarîxu Meyyafariqîn û Amed" belgeyeke dîrokî û girîng e.[68]

Ji ber ku ev herêma Rojhilata Navîn ji alîyê rojhilat ve bi êrîşa moxolan rûbirû mayê û ji alîyên rojava ve jî ji ber êrîşên xaçperestan gelek karesat hatine serê wê û wêran bûye. Berhemên ku di sedsala VII/XII'an de derbarê vê herêmê de hatine nivîsandin û gihane roja me pir hindik in. Lewra hebûna vê berhemê tiştekî biqîmet e. Ji ber ku di vê berhemê de agahîyên bêhempa yên derbarê Anadolê û dîrok û erdnîgarîya Rojhilata Navîn de hene berhemeke girîng û hêja ye.[69]

---

[67] el-Xûlî&Baluken,h.b., Teqdîm, r.68-79.
[68] Awad, h.b., Teqdîm, r.4.
[69] Ercan Gümüş, "İbnü'l-Ezrak Ve Eseri Meyyâfârikîn ve Âmîd Tarihi Üzerine Türkiye'de Yapılan Çalışmalar Işığında Bir Değerlendirme", E-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi ,ISSN: 1308-9633 Sayı: VII, Nisan 2012, r.4.

Ji nav eşîretên kurdan eşîreta ku bi awayekî gelek berfireh û hema bêje sal bi sal Îbnu'l-Ezraq agahî derbarê wan de dane Merwanî ne.[70]

Îbnu'l-Ezreq wek hinek nivîskarên din ev berhema xwe ne li ser daxwaza siltanekî û xelîfeyekî yan jî hevalên xwe nivîsandiye. Wî berhema xwe ji bo xwe, ji bo zanîna dîrokê ku pê ve mijûl dibû û jê hez dikir nivîsandiye. Herwiha hezkirina wî ya ji Meyyafariqînê ew sewqî nivîsandina berhemeke wisa giranbiha kiriye.[71] Bêguman ji ber vê taybetîya wê mirov dikare bibêje ku berhemeke bêhampa ye.[72]

Hinek berhemên dîrokî yên kevin ku negihane roja me navê wan di vê berhemê de derbas dibin û ji wan berheman agahî hatine wergirtin. Ev jî girîngîyeke din a vê berhemê ye. *Tarîxa Mûsilê* ya Mihemedê kurê Elî Şimşat û *Dîroka Bexdayê* ya Teyfûrê kurê Ebî Tahir ji van berheman e.[73]

Gelek dîroknûsên piştî Îbnu'l-Ezreq ji pirtûka wî sûd wergirtine ku ev jî girîngîya vê berhemê nîşan dide. Sibt Îbnu'l-Cewzî di pirtûka xwe ya bi navê "*Mîratu'z-Zeman*" de, Îbnu'l-Edîm di pirtûka xwe ya bi navê *Buxye't-Teleb fî Tarîxî Heleb* de, Îbnu'l-Xelliqan di pirtûka xwe ya bi navê "*Wefayatu'l-Ayan*" de, Îbnî Şeddad di pirtûka xwe ya bi navê"*el-Alaqu'l-Xetîre fî Zikrî Umeraî'ş-Şam we'l-Cezîre*" de, Zehebî di pirtûka xwe ya bi navê *Tarîxu'l-Îslam* de, Safedî di pirtûka xwe ya bi navê *Sahîbu'l-Wafî bi'l-Wefeyat* de, Îbnî Kesîr di pirtûka xwe ya bi navê *el-Bîdaye we'l-Nîhaye* de, Rizqillahê bîn Yûsuf di pirtûka xwe ya bi navê *Şûeraû'n-Nesranîyye* de, Îbnu'l-Qelansî di pirtûka xwe ya bi navê *Zeylu Tarîxî Dimeşq* de[74] Îbnu'l-Esîr, di pirtûka xwe ya "*el-Kamîl fî't-Tarîx*" de, Yaqut el-Hemawî di pirtûka xwe ya bi navê "*Mucemu'l-Buldan*" de, Aynî di pirtûka xwe ya bi navê "*Tarîxu'l-Aynî*" de ji pirtûka Îbnu'l-Ezreq gelek agahî neqil kirine. Ji van kesan Îbnu'l-Esîr ev agahîyên xwe yên ku ji Ezreq girtine bi şêwaza xwe şîrove kirine û tiştin li wan zêde kirine. Lê wan kesên din gotinên Ezreq rasterast neqil kirine. Kesên wek Îbnî Xellqan, Sibt Îbnu'l-Cewzî û Îbnî Şeddad wextê agahî ji pirtûkên wî neqil kirine wek

[70] Necip Mansız, İbnü'l-Esir'in el-Kamil fit't-Tarih Adlı Eserine Göre Kürtler ve yaşadıkları Bölgeler,Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyî, Muğla Sıtkı Koçhan Üniversitesi, 2015, r.120.
[71] Awad, h.b., Teqdîm, r.12.
[72] Gümüş, h.g., r.12.
[73] Awad, h.b., Teqdîm, r.14.
[74] el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.64-66.

çavkanî qala pirtûka Îbnu'l-Ezreq kirine. Lêbelê kesên wek Îbnu'l-Esîr û Yaqut el-Hemawî di van neqlên xwe de qet navê Îbnu'l-Ezreq negotine.[75]

Di nav van çavkaniyan de ji du berhemên ku agahîyên berfireh didin yek jê ya Îbnu'l-Esîr e. Îbnu'l-Esîr di berhema xwe de ji damezrandina Mîrnişîna Merwanîyan heta hilweşîna wan agahîyên giring dide. Lê belê wisa xuya ye ku agahîyên Îbnu'l-Esîr dide hemû ji Îbnu'l-Ezraq girtine.[76]

### 1.2.2. Naveroka Berhemê

Ji ber ku navê berhemê Tarîxu Meyyafariqîn[77] e dibe ku wek berhemeke ku tenê derbarê bajarê Meyyafariqînê dehatibe nivîsandin xuya bike; lêbelê di vê berhemê de agahîyên çandî û sîyasî yên serdemên kevin û bi taybetî jî yên sedsala VI/XII'an ku Îbnu'l-Ezreq tê de jîyaye hene. Herwiha qala tevgerên mîr, wezîr, siltan û aliman dike û derbarê gelek welatan de agahîyê dide. Herwiha Fariqî hinek kevneşopîyên welatê ku li wan deran gerîyaye nivîsandine û qala dewleta Emewîyan xelîfeyên wan pirsgirêkên nav dewleta wan û têkilîyên wan ên bi derûdorê re dike. Dîsa derbarê dewleta Ebbasî û xelîfeyên wan û rayedarên dewleta wan de agahîyê dide. Li ser mîrnişîn û dewletên wek Selçûqî, Merwanî, Atabeg û Artûqîyan ku li Şam, Iraq, Cezîre, Ermenistan û Îranê hatine damezirandin disekine. Herwiha têkilîyên van dewletan ên bi hev re û yên bi Endulus, Fatîmî û Bîzansîyan re tîne zîmên.[78]

Bi awayekî giştî berhem li ser dîroka dewletên rojhilata navîn hatiye nivîsîn û bi taybetî di warê dîroka rojhilat û başûrê rojhilatê Anadolê de gelek agahîyan dide û ji ber vê yekê bala lêkolîneran dikişîne ser xwe.[79]

Em ji vê berhemê têdigihîjin ku Fariqî berhema xwe kiriye sê cild. Ji ber ku di pirtûka xwe de wextê hinek mijaran vedibêje gotiye: "Me di cilda yekê an jî ya

[75] Awad, h.b., Teqdîm, 22-23.
[76] Mansız, h.b., r.120.
[77] Dîroka Meyyafarînê
[78] Awad, h.b., Teqdîm, r.1-2.
[79] Gümüş, h.g., r. 13.

duyem de qala vê mijarê kiriye.” Lêbelê heta niha em di pirtûkxaneyan de rastî van cildên din nehatine.[80] Mumkun e ku di cildê yekê de dîroka berî Îslamê û destpêka afirandinê, di cildê duyem de dîroka Îslamê û pêxemberê wê vegotibe.[81]

Mijarên pirtûkê di bin van beşan de kom dibin: Beşa yekem Qala xîlafeta Emerê kurê Xetab,[82] beşa duyem qala rêvebirîya Miawîye,[83] beşa sêyêm qala destpêka xîlafeta Benî Ebbas,[84] beşa çarem qala destpêka rêvebirîya Hemdanîyan,[85] beşa pêncem qala destpêka rêvebirîya kurdan li Meyyafariqînê[86]û beşa şeşem qala rêveberiya Necmeddîn Xazî û bidestxistina wî ya Meyyafariqînê[87] dike. Ji bilî van agahîyên dîrokî, Îbnu’l-Ezreq di berhema xwe de qala avahîsazî û bajarvanîyê jî kiriye û derbarê avahîyên mîmarî yên wek medrese, meydan û mizgeftan de agahî dane.[88]

### 1.2.3 Çavkanîyên Berhemê

Dema em li berhemê dinêrin em dibînin ku Îbnu’l-Ezreq agahîyên xwe ji sê çavkanîyan bi dest xistine: Ji ayetên Qurana Pîroz û hedîsan, ji berhemên berî xwe yên dîroknas, tefsîrnûs, erdnîgarîvan, ji kesê alim û zana. Ji bilî van, çavkaniya wî ya sereke agahî û terûbeyên ku di seranserê gera xwe de bi dest xistine ye. Lewra Îbnu’l-Ezreq, di pêvajoya gera xwe de bi kesên zana, waiz, beg û qralan re hevpeyvîn pêk anîne û derbarê zanîn û çandê de pirs ji wan kirine.[89] Wek mînak wextê di sala 534/1139an de çûye Bexdayê ji bo agahîyên derbarê şerê ku di navbera Siltan Mesûd û xelîfeyê Bexdayê de hîn bibe çûye cem Abdulkerîm el-Enbarî û ev agahî jê neqil kirine û nivîsandine.[90] Dîsa Fariqî dibêje: “Di sala 547/1152yan de ez li Bexdayê

---

[80] Savran, h.b., Teqdîm, r.1.
[81] el-Xûlî&Baluken,h.b., Teqdîm, r.66.
[82] el-Fariqî, h.b., r. 83-215.
[83] el-Fariqî, h.b., r. 217-330.
[84] el-Fariqî, h.b., r. 337-415.
[85] el-Fariqî, h.b., r. 418-444.
[86] el-Fariqî, h.b., r.449-705.
[87] el-Fariqî, h.b., r. 663-695.
[88] Awad, h.b., Teqdîm, r.3.
[89] Awad, h.b., Teqdîm, r.13.
[90] el-Fariqî, h.b., r.567-568.

bûm û çûm cem Qudbeddînê Waiz û demekê li cem wî mam û ez jê gelek tiştan hîn bûm.[91]

Îbnu'l-Ezreq hinek agahîyên xwe jî ji gotinên bavê xwe ku wî jî ji Ebu'l-Hesenê kurê Ezreq ango ji kalika Fariqî bihîstibûn neqil dike. Di agahiyeke ku derbarê Fexruddewlede daye û ji gotinên bavê xwe neqil kiriye de wiha dibêje: "Bavê min di vê mijarê de ji rehmetîyê kalikê min neqil kir ku wextê ez li Hiskêfê nazir bûm Fexruddewleyê kurê Cehîr ji min re got ku piştî gotinên falbaz sitendina vî welatî ket dilê min û di dema nevîyê Nesruddewle Nîzameddîn de ez giham vê armancê."[92]

Em dikarin bibêjin ku Fariqî, heta beşa Artûqîyan ji çavkanîyên nivîskî û rîwayetan sûd wergirtiye û ji beşa Artûqîyan û vir ve ji bûyerên ku dîtine sûd wergirtiye.[93]

Bi giştî çavkanîyên ku Îbnu'l-Ezreq ji wan sûd wergirtine ev in:

*Futuhu'l-Buldana* Belazûrî yek ji wan çavkanîyên ku Îbnu'l-Ezreq jê sûd wergirtiye ye. Dema ku Fariqî qala şerê Qadîsîyeyê yê di serdema Hz. Omer de kiriye ji vê berhema Belazûrî agahî wergirtine.

Berhama duyem a ku Fariqî jê sûd wergirtiye û jê agahî dane pirtûka bi navê *et-Teşîs* e. Ev pirtûk li keşîşxaneya hikumdarîyê ya bajarê Meyyafariqînê bû û ji sûryanî ber bi erebî ve hatibû wergerandin. Derbarê vê pirtûkê de Fariqî wiha dibêje: "Ez pê hesîyam ku li keşîşxaneya hikumdarîyê pirtûkeke bi navê et-Teşîs heye û qala vî bajarî û avakirina vê keşîşxaneyê dike. Ez çûm min ev pirtûk ji vê keşîşxaneyê anî û min bir cem zilamekî fileh. Vî kesê fileh dixwend û wateya wê bi erebî ji min re digot."

Fariqî ji pirtûka Îbnî Kuteybe ya bi navê *Kîtabu'l-Mearîf* jî sûd wergirtiye û di agahîyên derbarê Miawîye, Emewî û Ebbasîyan û xelîfeyên wan de ev pirtûkê wek çavkanîyekê nîşan daye.

---

[91] el-Fariqî, h.b., r.596.
[92] el-Fariqî, h.b., r.503.
[93] Savran, h.b., Teqdîm, r.18.

Pirtûkeke din a ku Îbnu’l-Ezreq agahî jê neqil kirine *Tarîxu Bexdad* e. Ev pirtûk a Teyfûrê kurê Ebî Tahir e. Fariqî derbarê Emewî û kirinên wan ên nebaş de ji vê pirtûkê agahî wergirtine.

Îbnu’l Ezreq ji *Tarîxu’l-Musul* a Mihemedê kurê Elîyê Şimşatî ku di sala 440/1049an de hatiye nivîsandin jî agahî wergirtine.

Îbnu’l-Ezreq agahîyên derbarê şerê fars û rûman, stendina fars û rûman a bajarên Dîyarbekirê, Dîyarîrebîa û bajarê Meyyafariqînê û mayîna Meyyafariqînê ya di bin hukmê Kîsra Kubazê hikumdarê Sasanî ê 19. de ji pirtûka Dîneweri ya bi navê *el-Exbarû’t-Tîwal* wergirtine.

Fariqî agahîyên derbarê misilmanên pêşî, Hz. Omer, Elî, Fatîma û yên derbarê bilindbûna meqamê Hz. Hesen û Hiseyînde ji *Tefsîru’l-Wehîdî* wergirtine.

Tefsîrên din ên ku Fariqî hinek agahî ji wan wergirtine *Tefsîru’l-Salebî* û *Tefsîru’l-Evdulwehab* in. Fariqî mijarên di derbarê zilm û zordestîya xelîfeyên Emewî û tevlîhevîya di serdema xelîfe Hz. Osman de ji van her du tefsîran wergirtine.

Dema Îbnu’l-Ezreq qala xelîfeyên Ebbasîyan û dewlemendîya dewleta wan kiriye ji berhema Sûlî ya bi navê *Tarîxu’l-Sûlî we Ewraqu’l-Sûlî* sûd wergirtiye û dema ku qala Yezîdê kurê Miawîye û mirina wî kiriye ji berhema Ebû’l-Ferec el-Îsfehanî ya bi navê *el-Exanî* hinek agahî wergirtine.

Îbnu’l-Ezreq ji pirtûkên gelek tefsîrnûs û zimanzanan ên wek *Sabiî*, *Îbnu’l-Şecerî* û *Hafizê bîn Asakîr* agahî wergirtine û ji bilî van di wergirtinên hinek agahîyên xwe de navê pirtûka ku jê wergirtiye nedaye tenê gotiye: “Di hinek pirtûkan de wiha nivîsandiye, min wiha dîtiye.”[94]

Fariqî cihên ku ji van pirtûkan wergirtine rasterast nenivîsandine beşên ku bi mijara wî ve têkildar in şîrovekirine û kurteya wan nivîsandiye. Herwiha ev agahî nirxandine alîyê wan ên rast û şaş jî vegotine.[95]

---

[94] Awad, h.b., Teqdîm, r.15-19.
[95] Savran, h.b.,Teqdîm, r.18; Awad, h.b., Teqdîm, r.20.

### 1.2.4. Rêbaza Berhemê

Îbnu'l-Ezreq di nivîsandina vê berhema xwe de çar rêbazên sereke bi kar anîne. Berhemên nivîskî yên berî xwe xwendine, li rîwayetên mirovan û şahîdên bûyeran guhdarî kiriye û herwiha ji bûwer û rûdanên ku di gerên xwe de dîtine sûd wergirtiye.[96]

Îbnu'l-Ezreq jî di vê pirtûka xwe de wek piranîya dîroknûsên rojhilat û rojavayî bi destpêkeke berfireh dest bi berhema xwe kiriye û agahîyên berfireh ên sedsalên kevin ên derbarê mijarên ku vegotine de dane.[97]

Îbnu'l-Ezreq bi rêbaza kevneşopîyeke îslamî ji afirandina mirovan dest bi nivîsandinê kiriye û heta serdema xwe hatiye.[98]

Zimanê berhemê erebî ye û li gorî Awad di warê ferheng, rêziman û rastnivîsa erebî de di pirtûkê de hinek şaşî hene. Xuyaye kesê ku ev nusxe nivîsiye ji wan nivîsvanên ku nivîsa wan xweşik e; lê wateya tiştên ku dinivîsin nizanin e û tê famkirin ku ev pirtûk ji alîyê nivîsvanekî tirk ve hatiye îstînsaxkirin.[99]

Îbnu'l-Ezreq bi kurtayî qala serdemên dûrî jîyana xwe kiriye û neketiye nav hûrgulîyan. Mesela dema qala serdema çar xelîfeyên Îslamê kiriye li ser feth û guherînên wan ên di warê aborî û rêbebirîyê de nesekiniye. Herwiha bi kurtayî qala dîroka Emewî û Ebbasîyan kiriye. Ji ber vê yekê jî mirov dikare van hêlan wek qelsîyeke pirtûkê bibîne. Lêbelê digel ku Îbnu'l-Ezreq bi berfirehî li ser van mijaran nesekinîye jî lê gelek tiştên ku di pirtûkên dîrokî yên berfireh ên dîroknûsên wek Îbnu'l-Esîr, Îbnî Şeddad, Ebu'l-Fîda de tunin nivîsandine û derbarê van mijaran de bi awayekî berfireh agahî dane.[100]

---

[96] Savran, h.b., Teqdîm, r.18.
[97] Awad, h.b., Teqdîm, r.1.
[98] Savran, h.b., Teqdîm, r.1.
[99] Awad, h.b., Teqdîm, r.5-6.
[100] Awad, h.b., Teqdîm, r.14.

### 1.2.5. Xebatên Ku Li Ser Berhemê Hatine Kirin

Heta niha li ser pirtûka Îbnu'l-Ezreq a bi navê Tarîxu Meyyafariqîn hinek xebat hatine kirin. Xebata pêşî ya li ser vê pirtûkê ku tê zanîn a Henry Frederîk Amdroz e. Piştre Vladimir Mînorsky li serê xebitiye. Piştî van rojhilatnasan Bedewî Evdulletîf Awad beşa Merwanîyan diweşîne û Mehmet Emîn Bozarslan vê xebata Awad werdigerîne tirkî. Piştî Bozarslan Ahmet Savran jî beşa ku derbarê Artuqîyan de ye werdegerîne tirkî. Lê cara pêşî ev pirtûk bi temamî ji hêla Karim Farouk û Yusuf Baluken ve hat weşandin.

Teblîxeke Ali Sevîm jî di Kongreya Dîroka Tirkan a VI de li ser weşana Tarîxu Meyyafariqîn a ku ji hêla Awad ve hatiye weşandin de heye.[101]

Ji bilî van xebatan Elî Emîrî di pirtûka xwe ya bi navê "*Wilayetu'ş- Şarqiyye"* de derbarê vê berhemê de wiha dibêje: "Di sala 1895an de dema ez li Erzirûmê defterdar bûm, endamê meclîsa revebirîya Erzurumê Alemdarzade Derwîş Efendî ji min re got ku berhem di derbarê vê herêmê de heye. Lê Huseyin paşa hat cem min û got ku ev berhem ne li ser Erzirûmê lê li ser Diyarbekir û Meyyafariqînê ye û dema bav û kalên min hatine van deran bi xwe re anîne û ev berhem niha li cem Mele Resûl e."Li gorî Elî Emîrî ev berhem, Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq e.Lê Elî Emîrî digel ku nêzî bîst û pênc salan li pey şopa vê pirtûkê ketiye jî lê bi dest nexistiye.[102]

#### 1.2.5.1. Xebatên Amedroz û Mînorsky

Du nivîsên Rojhilatnasê Îngîlîz Amedroz di rojnameya bi navê Jurnal a Cemîyeta Asyayê de hatibûn weşandin û hinek lêkolînên kurt ku ji hêla rojhilatnasê wek Mînorsky ve hatine kirin. [103]

---

[101] Ali Sevim, "Tarihu Meyyafarıkin ve Amid, VI.Türk Tarih Kongresi", Ankara, 1967.
[102] Ali Emirî, Osmanlı Vilayât-i Şarkiyyesi, (Amadekar. Taş, K. Z. Û yên din.) Ankara İlahiyat, Ankara 2005, 57-58. Vhg. Gümüş, h.g., r.5.
[103] Awad, h.b., Teqdîm, r.10-11.

Amedroz di sala 1902yan de di gotereke xwe ya ku di *The Journal of the Royal Asiatic Society* de hatiye weşandin de derbarê Tarîxu Meyyafariqîn de agahî dane.[104]

Amedroz derbarê destxeta vê pirtûkê de gotiye: "Tê texmînkirin ku destxeta vê pirtûkê di sedsala heftem ya koçî de li Şamê hatibe dîtin."[105]

Mînorsky ji di gotara xwe ya bi navê *Caucasica in the history of Mayyafariqin* de qala her du nusxeyên pirtûkê kiriye û beşên pirtûkê yên derbarê Şeddadîyan û Tiflîsêde û wergerandine îngîlîzî.[106]

#### 1.2.5.2. Xebata Bedewî Evdulletîf Awad

Bedewî Abdullatîf sala 1946an ji bo lêkolînê diçe Îngiltereyê û vê berhemê li Muzeya Londonê bidest dixe û li ser vê berhemê dixebite, xebata xwe ya doktorayê li serê dike û sala 1956an vê berhemê çap dike [107] Awad tenê beşa pirtûkê ya derbarê dewleta Merwanîyan de diweşîne. Sebebê bijartina vê beşê jî wiha aniye zimên: "Ji ber ku pirtûk mezin bû xebata li ser hemû beşan û amadekirina wan a ji bo weşanê pir dem lazim bû, min biryar da ku pêşî ji vê beşê dest pê bikim û piştre vê xebatê beş bi beş di demên cuda de biweşînim. Lewra ev beşa di derbarê Dewleta Merwanîyan de yek ji beşên pirtûkê ya girîng bû. Ev beşa ku ez ê biweşînim ji heştê rûpelên pirtûkê pêk tê.[108]

Wekî ku me berê jî gotibû li Muzeya British a Londonê du destxetên vê pirtûkê hene û Awad di sala 1959an de li Qahîreyê bi navê Tarîxu'l-Fariqî xebata beşa ku ji vê pirtûkê li serê xebitîbû çap kiriye.[109] Piştî ku Awad ev berhem dît û li

---

[104] Henrî Frederîk Amedroz, "Three Arabic MSS. on the History of the City of Mayyāfāriqīn", Great Oct., 1902, Cambridge University Press, r.785.
[105] Amedroz, h.b., r.785.
[106]: Vladimir Minorsky," Caucasica in the History of Mayyafāriqin", Source: Bulletin of the School of Oriental and African Studies, University of London, Vol.13, No. 1 1949, pp. 27-35.
[107] Awad, h.b., Teqdîm, r.د.
[108] Awad, h.b., Teqdîm, r.ه.
[109] Îbnu'l-Ezreq, Tarîxu'l-Fariqî, (Thq.Bedewî Evdulletîf Awad), Qahîre 1959.

ser xebitî berhem dîsa hat rojevê û fikra ku ev pirtûk serdemekedîrokêronî bike derket pêş.[110]

Ahmet Savran jî piştî Awad li ser vê berhemê xebitiye, beşa li ser Artuqîyan e wergerandiye û qala xebata Awad kiriye. Lê Savran gotiye Awad tenê li ser nusxeya dirêj xebitiye û ji ber ku ji nusxeya kurt sûd wernegirtiye li gorî bawerîya min ev xebat qels maye.[111] Lêbelê Awad dibêjeya eslî nusxeya berfireh e lê min her du nusxeyên pirtûkê dane berhev û min cudahîyên wan di jêrenotan de destnîşan kirine[112]

Awad qala xebatên Amedros û Mînorsky ên ku li ser vê berhemên hatine kirine jî dike.[113]

Ji pêşgotina Awad tê famkirin ku piştî xebata li ser vê beşê, dixwaze li ser wan bêşên din jî bixebite û wan biweşîne.[114] Lê ji xeynî vê beşa pirtûkê tu beşên din ku ji vê pirtûkê çap kirine nayên zanîn.

#### 1.2.5.3. Xebata Mehmet Emin Bozarslan

Mehmed Emîn Bozarslan ew berhema ku Bedewî Evdulletîf Awad li Qahîreyê çap kiribû wergerandiye tirkî û di sala 1975an de çap kiriye. Bozarslan pêşgotina Awad a ku derbarê pirtûkê de bi awayekî berfireh agahîyê dide jî wergarandiye û xistiye serê xebata xwe.[115]Herwiha Bozarslan gelek jêrênotên ku Awad nivîsandine yên derbarê kes û cihan de ku agahîyê didin jî wergerandine lêbelê ji ber ku ev jêrenot kafî nedîtine gelek agahî li wan zêde kirine. Dîsa li ber dîrokên hîcrî ku di pirtûkê de derbas dibin di nav kevanekê de mîladîya wan nivîsandiye.[116]

110 Gümüş, h.b., r.13..
111 Savran, h.b., Teqdîm, r.7.
112 Awad, h.b., Teqdîm, r.ر.
113 Awad, h.b., Teqdîm, r.10,11.
114 Awad, h.b., Teqdîm, r.ه.
115 İbnu’l-Ezraq, *Mervanî Kürtleri Tarihi*, (Wer.Mehmet Emin Bozarslan), Koral, Stenbol 1990, Teqdim, r.9.
116 Bozarslan, h.b., Teqdim, r.6.

### 1.2.5.4. Xebata Ahmet Savran

Ahmet Savran jî beşên vê pirtûkê yên dawî ku derbarê Artûqîyan de ne, di sala 1992yan li Erzirûmê wergerandin tirkî. Beşa Artûqîyan hatiye wergerandin û di heman demê de bi lêkolîn û nîşeyan hatiye dewlemendkirin.[117]

Savran her du nusxeyên vê pirtûkê dane berhev û bi vî awayî agahîyên ku di yekê de kêm in bi yên din temam kirine. Herwiha ev werger ji beşên dawî yên nusxeya kurt û yên nusxeya berfireh pêk tê.[118]

Savran sedema wergerandina vê berhemê wisa tîne zimên: "Ya baş ew bû ku ev berhem bi tevahî hatibûya wergerandin. Lêbelê ji ber ku berê, beşa Merwanîyan hatibû weşandin[119] û beşa Artûqîyan ji hêla dîroka tirkan ve bêtir girîng bû min ev beş hilbijart.[120]

Savran di pêşgotina vê pirtûkê de balê dikşîne ser xebatên Amedroz, Minorsky û Awad ên ku li ser vê berhemê hatine kirin.[121] Lê digel ku wergera Bozarslan berî ya Savran e jî qet qala wergera wî nekiriye.

### 1.2.5.5. Xebata Karim Farouk el-Xûlî&Yusuf Baluken

Xebata dawî ya ku li ser vê berhemê hatiye kirin a Karim Farouk û Yusuf Baluken e. Xûlî û Baluken ev berhema Îbnu'l-Ezreq tehqîq kir û di sala 2014an de li Stenbolê çap kir. Ev xebateke pir girîng e û ji wan xebatên din cuda ye. Lewra cara yekem ev pirtûk bi tevahî hat weşandin.

Ev xebat li gorî destxeta pirtûkê ya berfireh hatiye kirin. Herwiha agahîyên ku di vê nusxeyê de tunin û di nusxeya kurt de hene hatine destnîşankirin.

---

117 Savran, h.b., Teqdîm, r.XII.
118 Savran, h.b., Teqdîm, r.XV.
119 Di vir de xebata Bedewî Evdulletîf Awad qest kiriye.
120 Savran, h.b., Teqdîm, r.XIV
121 Savran, h.b., Teqdîm, r.XIII-XIV.

Di berhemê de şaşîyên di pirtûkê de yên ji hêla ziman, rêziman û rastnivîsê ve hatine rastkirin û di jêrenotan de îfadeya resen hatiye nivîsandin.

Pêşgotineke berfireh di serê pirtûkê de hatiye nivîsandin û di vê pêşgotine de derbarê pirtûkê, kêmasî û şaşîyên wê, girîngîya wê û derbarê jîyana Îbnu'l-Ezreq de agahî hatine dayîn. Di vê pêşgotinê de qala xebatên Awad û Savran jî hatiye kirin û şaşîyan van her du xebatan hatine destnîşankirin. [122] Herwiha me jî di teza xwe de ev xebat esas girtiye.

.

[122] El-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.14-58.

# BEŞA DUYEM

# RÊVEBIRÎYA KURDÊN MERWANÎ

## 2.1. Destpêka Rêvebirîya Kurdên Merwanî

Rêvebirîya kurdan a li Meyyafariqînê bi Ebû Evdillah Huseyîn Badê[123] kurê Dostik dest pê kir.[124]

Piştî ku rêvebirîya kurdan ava bû wan têkilîyên xwe bi Împeretorîya Bîzansê re baş danîn. Ji ber ku xelîfetîya Misrê ya Fatimîyan piştgirî da serhildanên li dijî Ebbasîyan dewleta wan lawaz bû û herwiha dewleta Buweyhî, jî ber bi perçebûnê ve çû û van şert û mercan derfet da kurdan ku rêvebirîya xwe ava bikin.[125] Dewleta Merwanîyan li ser herêma Diyarbekir[126] û hinek deverên herêma Cezîreyê û hinek herêmên Ermenîyan hukum dikir. Amed, Meyyafariqîn, Mêrdîn, Cizîr, Nisêbîn, Bakurê Mûsilê, Ercîş, Erzen, Xelat û li herêma ermenîyan jî Bedlîs di bin desthilatdarîya Merwanîyan de bû.[127]

---

[123] Ev peyv di hinek çavkanîyan de di wateya "bad/hewa" de û di hinek çavkanîyan de jî di wateya "baz/teyr" de hatiye bikaranîn. Ruzrawerî, Îbnî Xeliqan, Ebû'l-Fîda navê wî wek "Bad" bikar anîne. Bnr. Sibt Îbnu'l-Cewzî, Yahya İbn Seîd el-Entaqî, Îbnu'l-Esîr "Baz" bikar anîne. Vgh. Abdurrahim Tufantoz, *Ortaçağda Diyarbakır Mervanoğulları*, Aça Yayınları, Ankara 2005, r.59.

[124]el-Fariqî, h.b., 448.

[125] Thomas Ripper, *Diyarbakir Merwanileri*, (Wer:Bahar Şahin Fırat), Avesta, İstanbul 2012, r.135.

[126] Digel ku gelek caran Amed û Diyarbekir li ciyê hev tên bikaranîn jî lê Amed tenê navê bajêr û navendê ye û Diyarbekir, navê heremê ye. Piştî desthilatdarîya erebên misilman ji ber navê eşîreta Bekr/ بكر navê Diyarû Bekir/ ديار بكر ango welatê eşîreta Bekr li vir hat kirin heta dawîya dewleta Osmanîyan jî ev der wek navê herêmekî dihat binavkirin.Bnr.https://tr.wikipedia.org/wiki/Diyarbakir.(10/08/2016); Li gor ev der navê herêma ku sînorê wê ji rojavayê Dijleyê heta çiyayê raserî Nisêbînê û ji wir digihîje Amed, Meyyafariqîn, Sêrt, Hîzan û Hanê . Bnr. Yaqût, h.b., C.2 ,r.494 .

[127] Qadir Muhammed Hesen, Îmaretu'l-Kurdîyye fî Ehdî'l-Buweyî, Erbîl 2011, r.46.

### 2.1.1. Ebû Evdillah Badê Kurê Dostik (374/985-380/991)

Îbnu'l-Ezreq dibêje Bad ji eşîreta Çarboxtî[128] bû û li çîyayên Bahesmî yên di navbera Hîzan û Madenê dima[129] lê derbarê gundê Bad û dîroka jidayîkbûna wî de agahîyê nade. Lê Zekî Beg dibêje Bad di sala 348/959an de li Diyarbekirê çê bûye û serokê eşîreta Hemîdî ye. Navê bavê wî Dostik bû û rêvebirê Sêrtê bû û piştre Bad ket şûna bavê xwe. Paşê xelîfeyê Ebbasî, bernavka Ebû Şuca dayê. Li ser pereyên ku çap kiribûn[130] bernavka wî nivîsandî bû û di xutbeyan de navê wî digel ê xelîfe dihat xwendin.[131]

Bad pêşî girseyek li xwe civand û dest bi rêbirîyê kir. Çend caran êrîşî derûdora Diyarbekirê kir[132] û carinan jî di nava xezayên li dijî Bîzansîyan de cih digirt.[133]

Bad êrîşî herêmên derûdorê dikir û dixwest sînorên welatê xwe berfireh bike. Di serê pêşî de ji bo talankirinê êrîşî herêmên filehan jî dikir. Heta tê gotin ku dixwest êrîşî Bexdayê bike.

Bi vî awayî wî sîyeseteke xeternak dimeşand û hindik mabû ev tevgera wî bibe sedemê têkçûna desthilatdarîya kurdan a li herêma Diyarbekirê.[134]

Bi van êrîşan Bad heta ber gola Wanê hat. Di wê serdemê de Skleros serî li ber Împeretorîya Bîzansê rakiribû û ji ber vê yekê jî Bîzans ji pêşketina kurdan re nebû asteng.[135]

---

[128] Kurdên Hemîdîye. Bnr. Îbnu'l-Esîr, el-Kamîl fi't-Tarîx, (Thq. Muhammed Yûsuf Reqaqe), Beyrûd-Lubnan 1987, C.7., r.415. Eşireta Çarboxti ji kurdên Humeydî yê ez-Zevezanan e. Dibe ku piştî ku Muslumanan ev der feth kirin hatibin dora Sertê. Tufantoz, h.b., r.60.
[129] el-Fariqî, h.b., 448.
[130] Ji bo mînakên pereyên zîvî ku Bad li ser navê xwe çap kiribûn. Bnr. Yusuf Balukên, "Cîzre Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri", Istanbul 2012, r.57.
[131] Mihemed Emîn Zekî Beg, *Meşahîrî Kurd we Kurdistan*, (Wer. Sanîhe Zekî Beg), Darû'z-Zeman, Şam 2006, r.54.
[132] el-Fariqî, h.b., 448.
[133] Razrawerî, h.b., r.83.
[134] Ripper, h.b., 545.
[135] Ripper, h.b., r.230.

Herêma ku Bad lê dima di bin desthilatdarîya Buweyhîyan de bû û di serdema Adûddewleyê Buweyhî de Bad pir bi pêş neket û dema Adûdewle ber bi Diyarbekir û Mûsilê ve hat Bad xwe li pêşîya wî negirt.[136]

Dema Adûdewle hat Mûsilê gazî Bad kir ji bo ku wî bibexşîne. Bad heta bi Mûsilê çû lê paşê bê xebera Adudewle ji wir derket. Li ser vê Adudewle[137] ew wek mirovekî xerab û nebaş binav kir û fermana girtina wî da lê Bad ji wir dûr ket.[138]

#### 2.1.1.1. Bihêzbûna Rêvebirîya Bad

Di sala 372/983yan de Adudewleyê Buweyhî mir û di navbera kurên wî de ji bo desthilatdarîya dewletê şer û dubendîyê dest pê kir û ev rewş ji bo bihêzbûna Bad bû derfetek.[139] Lewra Bad ancax piştî mirina Hikumdarê Buweyhîyan harêma Diyarbekir û Cezîreyê stend.[140]

Îbnû'l-Ezreq pêşketin û gav bi gav firehkirina sînorên Bad wiha neqil kiriye: "Armanca Bad ew bû ku bibe hikumdar. Piştî ku çend cih zeft kirin berê xwe da Meyyafariqînê. Bad nameyek ji gelê Meyyafariqînê re şand û dilê wan xweş kir li ser vê, gel razî bû ku Bad were Meyyafariqînê. Piştî Meyyafariqînê temamê herêma Diyarbekir, Nisêbîn û Cizîrê jî xist bin desthilatdarîya xwe. Piştî ku Bad Meyyafariqîn stend birayê xwe Ebû'l-Fewaris li wir hişt û leşkerê xwe ve û stendina welatine din ve mijûl bû."

Ji ber ku Buweyhîyan di dema Adûdewle de Diyarbekir ji bin hukmê Hemdanîyan derxistibû ev der xistibûn bin desthilatdarîya xwe û ya Deylemîyan, gelê herêma Cezîreyê, Deylemî wek leşkerên dagirker didîtin. Gelê Nisêbînê li ber walîyê xwe serî rakirin, walî kuştin û dîsa gelê Mûsilê jî êrişî baregeha Deylemîyan kirin. Bad bi Buweyhîyan re şer dikir û gel hêvî dikir ku ew wan ji bin

[136] Ripper, h.b., r.140.
[137] Hikumdarekî Buweyhîyan e. Navê wî Fenna Xusrew e. Di sala 936an de li Esfehanê çê bûye û di sala 983yan de li Bexdayê miriye. Bnr. Bozarslan, h.b., Jêrenot, r.47.
[138] Îbnu'l-Esîr , C.7, r.415.
[139] Tufantoz, h.b., r.62.
[140] Ripper, h.b., r.141.

desthilatdarîya Deylemîyan derxe. Belkî jî ji ber vê yekê bajarên herêma Diyarbekirê derîyê xwe ji Bad re vekirin.[141]

Piştî Adûdewleyê Buweyhî, Samsûdewle ket şûna wî û dema bihîst ku Bad sînorên xwe berfireh dike û gelek dever xistine bin desthilatdarîya xwe du caran artêş şand ser Bad lê Bad her du caran jî leşkerên Buweyhîyan têk birin û gelek ji wan kuştin û girtin.[142]

Paşê Bad berê xwe da Mûsilê lê di navbera wî û walîyê Musîlê Ebû'l-Qasimê kurê Sad de di sala 377/988an de peyman hat çêkirin. Li gorî vê peymanê Torabidîn û Herêma Cezîreyê ji walîyê Mûsilê re û deverên din ji Bad re man. Di navbera Bad û walîyê Mûsilê de dostanîyeke baş hebû. Heta rojekî ji herêma Hekarî[143] û deverên din hinek kurdan êrişî Mûsilê kirin û li ser vê Bad ji Hiskêfê derket û çû alîkarîya Ebû'l-Qasim. Bad ev kesên ku êrîş kirin kuştin û gelê Mûsilê ji wan rizgar kirin ji ber vê yekê jî kêfa gelê Mûsilê ji Bad re pir dihat.

Piştî ku walîyê Mûsilê mir û Bahaudewle hat ket cihê wî Bahaudewle jî peymana ku berî wî hatibû kirin pejirand û Cezîre û Torabîdîn jî da Bad[144] lê piştî demekê Bahaûdewle poşman bû ku ev cihên din danê û dîsa ev der jê xwestin lê Bad teklîfa wî nepejirand.[145]

Li ser vê Bahaudewle ji Xelîfe Tayî alîkarî xwest. Xelîfe artêşek şande ser Bad û di vî şerî de birayê Bad hat kuştin.[146] Di vî şerî de vê carê artêşa Bad têk çûbû lê Bad dîsa vegerîya Diyarbekirê û leşkerên xwe kom kirin û dîsa bi hêz bû.[147]

---

141Ripper, h.b., r.338.
142 el-Fariqî, h.b., r.452; Razrawerî, h.b., r.85; Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, (Wer.Ziya Avci), Avesta, Stenbol 2002, r.327.
[143] Bajarekî li Cezîru bin Omer e û li jora Mûsilê dimîne. Li vi kurden bi navê el-Hekkariye rûdinin. Bnr. Yaqût, h.b., C.5 , r.408 .
144 el-Fariqî, h.b., r.452; Razrawerî, h.b., r.87.
145 el-Fariqî, h.b., r.450-451.
146 Tufantoz, h.b., r.63.

### 2.1.1.2. Şerê Bi Hemdanîyan Re û Kuştina Bad

Piştî mirina Semsamudewleyê Buweyhî Hemdanîyan çav berda bû welatê Buweyhîyan. Nasiruddewle Hesenê Hemdanî jî li Bexdayê di xizmeta Buweyhîyan de bû. Du kurên wî bi navê Ebû Evdillah Huseyîn û Ebû Tahir Îbrahîm hatin Mûsilê.[148] Van her du birayên Hemdanî dixwestin welatê Bad jê bistînin. Li ser êrîşa Hemdanîyan Bad çû Torabidînê û leşkerên xwe kom kirin. Di nava wan de şer dest pê kir. Dema ku Bad xwe ji ser hespekî avêt ser hespê din kembera milê wî şikest û ji hêla Hemdanîyan ve hat kuştin. Hemdanîyan dest û milên wî jê kirin birin û li Bexdayê nîşanî xelkê dan û termê wî birin li Mûsilê binax kirin.[149]

Badê ku Buweyhîyên Şîî yên Deylemî derfet nedîtibûn ku wî ji holê rakin bi vî awayî ji alîyê Hemdanîyan ve hat kuştin.[150]

## 2.2. Serdema Mîr Ebû Elî Hesenê Kurê Merwan (380/991-387/998)

Mîr Ebû Elî Hesenê kurê Merwan xwarzîyê Badê kurê Dostik bû û piştî mirina xalê wî rêvebirîya Xanedana Merwanî ketibû destê wî. Di dema Bad de bingeha mîrnişîna Merwanîyan hatibû danîn û Ebû Elî li ser vê bingeha ku xalê wî danîbû ev mîrnişîn ava kir. Berî ku Mîr Ebû Elî dest bi mîrîtîyê bike ji serokan re name şandin û civîneke mezin bi wan re li dar xist.[151]

Navê bavê Ebû Elî, Merwanê kurê Kek bû[152] û ji ber vê yekê ev mirnişîna ku hat avakirin bi Merwan hat binavkirin. Li gor Safrastîyan, digel ku Merwanî ji eşîreta Çarboxtî bûn navê eşîreta xwe li Mîrnişîna xwe nekirin navê Merwanî lê kirin ji ber ku ev nav bêtir li Îslamê dihat.[153]

---

148 Tufantoz, h.b., r.66.
149 el-Fariqî, h.b., r.452., Razrawerî, h.b., r.177.
150 Tufantoz, h.b., r.67.
151 Evdullah memê Mehmed Xanî Varlî, *Dîroka Dugelên Kurdan*, Sitenbol, r.177.
152 el-Fariqî, h.b., r.453.
153 Asrhak Safrastian, Kurd û Kurdistan, (Wer.Ergîn Opengîn), Avesta, Stenbol 2007, r.38.

Li gorî Îbnu'l-Ezreq çar xwarzîyê Badê kurê Dostik hebûn û zarokên Merwan kurê Kek bûn û ji gundê Kermasê yê di navbera Sêrt û Madenê de bûn. Xwarzîyê wî yê mezîn Mîr Ebû Elî Hesen bû. Ji dema ku Bad dest bi rêbirîyê kiribû ve her çar xwarzîyên wî pê re bûn. Dema ku Bad hat kuştin û şer germ bû Ebû Elî gazî gel kir û li dora xwe civandin û bi pey Hemdanîyan ket û bi awayekî giran ew têk birin, ew talan kirin û gelek ji wan kuştin.[154]

Ebû Elî di sal 380/990î de ket Meyyafariqînê û bi vî awayî desthilatdarîya wî dest pê kir.[155]

Ebû Elî Hesenê kurê Merwan piştî ku hevsarê rêvebirîya dewletê xist destê xwe temamê giranîya xwe da ser herêma Diyarbekirê û dewleteke bi navê bavê wî binavkirî û temenê wê ji sed salî zêdetir ava kir.[156]

Piştî ku Mîr Ebû Elî ji şerê Mûsilê yê bi Hemdanîyan re vegerîya, serkeftineke leşkerî bi dest xist. Lazim bû ku vê serkeftina xwe ya leşkerî di warê rêvebirîyê de jî bi encam bike.

"Ebû Elî Hesen piştî şerê Mûsilê ku ji Bad veqetiya û bi leşkerê xwe yê mayî re vegerîya û dema ku xebera mirina Bad seh kir xwe gihand keleha Hiskêfê ku cihekî gelek asê bû û li ser qeraxa çemê Dîcleyê dima. Jina Bad a Deylemî di vê kelehê de dima. Jê re xeber şand û got, min hinek agahî ji cem Bad anîne û dixwazim ji te re bibêjim, wê jî bawerî pê anî û derîyê kelehê jê re vekir.[157] Piştî ku Ebû Elî rewşa xalê xwe jê re got, jinxala wî pirsî ku ka em çi bikin? Ebû Elî teklîf lê kir ku bi hev re biçin Meyyafariqînê. Li ser vê bi hev re çûn Meyyafariqînê û di sala 380/991ê de ketine bajêr.[158] Piştî demekê Ebû Elî kelehên dora Meyyafariqînê xistin bin destê xwe û bi jinapa xwe re zewicî."[159]

Hêja termê Bad li erdê ye Ebû Elî bi jinxala xwe re dizewice ku ev hêla wî ya polîtîk nîşan dide. Çawa Bad êrîş û feth bi awayekî cesûr û bêtirs pêk dianîn berevajî

---

[154]el-Fariqî, h.b., r.453.
[155] el-Fariqî ,h.b.,r.453.
[156] Elî Beyyûmî, *Qîyamu'd-Dewletî'l-Eyyûbîyetî fî Misir*, Daru'l-Eskerî'l-Hedîs, Qahîre 1952, r.25.
[157] Razrawerî, h.b., r.178; Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, r.329.
[158] Fariqî ,h.b., r.453; Îbnî Xeliqan, *Wefayatu'l-Ayan we Ebnaîz'-Zeman*, (Thq. Îhsan Ebbas), Daru Sedr, Beyrûd 1978., c.4., r.324.
[159] Fariqî ,h.b., 453; Zekî Beg, *Diroka Kurd û Kurdistan*., r.329.

wî Ebû Elî bê deng û bi hişekî polîtîk tevdigerîya bêtir derfetên ku ketibûn destê wî diparastin.[160]

Di sala 382/993yan de Rûm ketine derûdora Xelat, Melazgird, Ercîş û Bergirîyê. Lêbelê Ebû Elîyê kurê Merwan erîşê wan kir, ew tek birin[161] û Rûm ji berê reviyan. Roja din ji wan re got ku temamê leşkerê Îslamê dê ben. Li ser vê yekê jî di navbera wan de aşîtî çê bû û Rûm vegerîyan welatê xwe û agirbesteke ku deh salan dom bike di navbera wan de pêk hat. Bi vî awayî jî mîr Ebû Elî welatê xwe xist nav aramîyê.[162]

Ebû Elî bi gelek xanedan û dewletan re bi dostanî tevgerîya û bi Mesîhîyan, bi dewletên Misilman re û herwiha bi dewleta Fatîmîyan re jî têkilîyên baş saz kirin. Bi dewleta Ebasîyan û bi malbata Hemdanîyan ku desthilatê Helebê bûn jî bi dostanî tevgerîya û bi wî awayî di bin vê sîyaseta ku yên piştî wî jî meşandin gelê dewleta Dostikî ket nav aramî û aşîtîyê.[163]

### 2.2.1. Şerê Di Navbera Merwanî û Hemdanîyan De

Şerê Mûsilê di navbera Hemdanîyan û Bad de pêk hatibû û Bad di vî şerî de hatibû kuştin.[164] Dîsa meyla gelê Meyyafariqînê ya bi bal Hemdanîyan ve[165] bûbû sedemekî gengeşîyê heta ku ev bûbû sedemê derxistina wan a ji bajêr.

“Piştî Mirina Bad Ebû Tahir û Ebû Evdillahê Hemdanî, piştî ku di Şerê Mûsilê de bi ser neketin û berê xwe dan Diyarbekirê wan zen dikir ku ev der bêxwedî ye û dê bi hêsanî bi dest bixin; lê Mîr Ebû Elî cihê xwe baş girtibû û di vî şerî de Ebû Tahir û Ebû Evdillahê Hemdanî têk çûn.”[166]

---

160 Ripper, h.b.,r.164-165.
161 el-Fariqî, h.b.,r.453; M.S.Lazarev&Ş.X.Mihoyan& yên din, *Kürdistan Tarihi,* (Wer.İbrahim Kale) Avesta, Stenbol 2010., r.61.
162 el-Fariqî,h.b.,r.453.
163 Evdurreqîb Yûsuf, *ed-Dewletu’d-Dostakîyye, Fî kurdistanî’l-Wusta*, Erbil 2001, C.1., r.124.
164 el-Fariqî, h.b., r.452., Îbnî Xeliqan, h.b., c.4., r.324.
165 el-Fariqî, h.b., r.456.
166 Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan,* r.330; Îbnî Xeliqan, h.b., C.4., r.324.

Ebû Tahir dixwest ku dîsa li Mûsilê mîrnişîna Hemdanîyan ava bike ji ber vê yekê jî êrîşî Amedê kir û bajar dorpêç kir. Di vê navberê de jî birayê Ebû Tahir Ebû Evdillah jî êrîşî Ebû Elî kir.[167]

Di vê êrîşê de Ebû Evdillahê Hemdanî hate girtin û Ebû Elî miameleyeke baş pê re kir û piştî demekê ew azad kir ku ev jî dihat wateya xwestina aşîtîyê. Lêbelê çiqas Ebû Evdillah dixwest ku şer bi dawî bibe jî lê birayê wî aşîtî nepejirand. Digel hêzên bedewîyên Uqeylî[168] û Nûmeyrîyan dîsa êrîş kirin lêbelê dîsa têk çûn û Ebû Evdillah dîsa hat girtin. Vê carê Ebû Evdillah rastî miameleyeke baş nehat û demeke dirêj hat girtin.[169] Derheqê dewama bûyerê de Mihemed Emîn Zekî Beg wiha dibêje: "Melikê Misrê ket navbera wan, çend mela wekî qasid şandin cem Melik Ebû Elî û ricaya Berdana Ebû Evdillah jê kirin. Ebû Elî nedixwest ricaya Melikê Misrê bişikîne lê bi şertê ku êdî li ser erdê Kurdistan û Iraqê nesekine ew azad kir."[170]

Sedema Şerê Hemdanî û Merwanîyan, êrîşên Hemdanîyan bûn, lewra Hemdanîyan çend caran Amed dorpêç kirin. Hemdanî xwedîyê Amedê yên kevin bûn û ev der cihê bav û kalên xwe didîtin. Lewra dema Sitînasa Hemdanî dianîn ku bi Ebû Elî re bizewice Hemadanîyan şertê bicihbûna Amedê danîbûn ber Ebû Elî û dîsa dema bûk di rê de xewneke nebaş dibîne û hinekî tirs jê re çê dibe keça Xatîbê kurê Nubate ku giregirekî Meyyafariqînê bû pê re ye û jê re dibêje: Xemgîn nebe tu dibî xwedîyê welatê bav û kalên xwe.[171]

### 2.2.2. Zewaca Ebû Elî

Bêguman ji bo aşîtîya di navbera Merwanî û Hemdanşyan de xanedanan de gava herî girîng, xwestina zewaca Ebû Elî ya bi Sîtenas re bû. Îbnu'l-Ezreq di berhema xwe de bi berfirehî li ser vê mijarê disekine, bê çawa Ebû Elî daxwaza zewaca wê kiriye; lê heja xêlîyê bûkê ne gihîştîyê, Ebû Elî hatiye kuştin û ev zewac

---

[167] Tufantoz, h.b., r.68; Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, r.330.
[168] Eşîreke mezin e û digihe Uqeylê kurê Keb. Berî serdema Îslamê li Behreynê bûn piştre hatin herêma Cezîreyê û ketin bin hikmê Hemdanîyan. Bnr.Wefa Conî, Uqeylîyûn, el-Mewsûetu'l-Erebîye, C.13., r.362.
[169] Rîpper, h.b., r.167.
[170] Zekî Beg,*Dîroka Kurd û Kurdistan*, r.331.
[171]el-Fariqî, h.b., r.460.

pêk nehatiye ev zewac di Tarîxu Meyyafariqîn de wisa hatiye vegotin: “Mîr Ebû Elî qasidek şande Helebê û keça Sadûdewle Şerîfê kurê Seyfuddewle xwest du sed dirhem jî ji bo nexta wê şandin û got ku ez ê jî bêm li Amedê bi cih bibim. Piştre hinek giregirê Meyyafariqînê û hevserên wan çûn Helebê bûk anîn û hatin. Ebû Elî jî heyetek şand pêşîya wan dema ku xêlîyê bûkê ji çemê Feratê derbas bûn û bi miqtarê du rojan jî ji Rihayê dûr ketibûn lijneya ku Ebû Elî şandibû gihaşte wan û xeber dan wan ku Ebû Elî li ber derîyê Amedê hatiye kuştin li ser vê yekê bûk vegerandin Rihayê” [172] û ev zewac pêk nehat.

### 2.2.3. Derxistina Hevrikên Mîr Ebû Elî ji Meyyafariqînê

Ebû Elî ji gelek kar û kirinên gelê Meyyafariqînê bezar bûbû ku gelek caran fermanên wî bi cih nedianîn û êdî nikarîbû ji heqê wan derkeve. Lê ser vê yekê di sala 384/995an de rojekê Ebû Elî gilî û gazînên xwe li cem wezîrê[173] xwe Mem anîn zîmên û jê xwest ku çareyekî ji vî pirsgirêkê re bibîne.[174]

Îbnu’l-Ezreq sedema vê yekê wiha neqil dike û çend mînakên serkêşîya gelê Meyyafariqînê dibêje. Li gorî wî sedema vê ew bû ku gelê Meyyafariqînê Hemdanî dixwestin. Carinan hinek kesên nezan û serxweş êrîşê leşkerê mîr û kesên nêzî wî dikirin. Heta rojekê kurapekî mîr di Çarşîya Qumaşfiroşan de siwar derbas dibe û dema hespê wî, wê derê dilewitîne erdê pê didin paqijkirin û nahêlin xulamê wî paqij bike. Gelek carên din jî dema leşkerek an jî yekî kurd tiştekî nebaş kiribûna bê destûra mîr û walî heta ku dianîn dereceya mirinê lê dixistin.[175]

Em dibînin ku nerazîbûneke gel li dijî rêvebirîya Ebû Elî heye û meyla wan bi bal Hemdanîyan ve ye.[176] Hemdanî desthilatdarîya ereban a dawî bû ku di asta herî bilind de bû û binyada wan digihîşte eşîreta Texelûbîyên ereb.[177] Dema em vê

---

172 el-Fariqî, h.b., r.460.
173 Di Tarixu Meyyafariqîn de li cihê wezîr peyva hacib hatîye nivîsandin lê me di xebata xwe de ev peyv wek wezîr bi kar anîye. Li gor Evdirreqîb Yûsuf, di hinek serdemên Selçûqîyan de hacib di navbera wezîr û siltan de wek navgînekî ye. Bnr. Yûsuf, h.b., C.2., r.80-81.
174 el-Fariqî, h.b.,r.456.
175 el-Fariqî, h.b.,r.456.
176 el-Fariqî, h.b., 456.
177 el-Fariqî, h.b., 334.

tevgera kesên Çarşîya Qumaşfiroşan dibînin çawa ku Îbnu’l-Ezreq jî dibêje ku helwesta bi vî rengî bi taybetî li dijî kurdan derdiket pêş[178] naxwe mirov dikare bibêje ku “di navbera erebên kevin û tebeqeya nû ya kurdan de reqabeteke tund hebû.”[179]

Piştî ku Mîr Ebû Elî ji bo vê tevgera gelê bajêr nerazîbûna xwe ji wezîre xwe re got Mem ev şîret lê kir: “Ez bim heta cejnê dev ji wan berde. Roja cejnê gel dê derkeve derveyê bajêr hingê tu yê derî li ser wan bigirî tenê kesê ku tu bixwazî wan ceza bikî tu yê wan bixî hundur û yên ku tu bixwazî jî tê bikujî yên din jî tê li der ve bihêlî.”[180]

“Piştî ku li bajêr xeber belav bû ku mîr dê bê nimêja cejnê ya ku li derveyê bajêr tê kirin bajar vala bû her kes derket. Piştî ku Mîr Ebû Elî ferman da û derîyê bajêr hat girtin, hinek kes hatin kuştin kesê ku mîr destûr da wan ketin hundir kesên ku li derve man jî çûn wan bajar û gundên din.”[181]

Ji van agahîyan tê famkirin ku ev girseya ku Ebû Elî dixwaze wan ji bajêr derxe misilman in û dema mirov rika wan a li dijî kurdên desthilatdar bifikire îhtîmaleke mezin e ku ereb bin.[182] Bi vî awayî Ebû Elî bêyî ku bi wan re şer bike bi şêwazeke polîtik, helbet li ser tewsîyeya wezîrê xwe Mem, hevrikên xwe ji bajêr dûr dixe.

### 2.2.4. Kuştina Ebû Elî

Sadûdewleyê Hemdanî bi şertê ku daweta wan ne li Farqînê li Amedê be û Ebû Elî li Amedê bi cih bibe keça xwe dabû Ebû Elî.[183] Lêbelê hêja ev zewac pêk nehatî Ebû Elî hatibû kuştin. Belkî jî derketina wî ya ji Meyyafariqînê û çûyîna wî ya Amedê, rê li ber kuştina wî vekir.

---

[178] el-Fariqî, h.b.,r.456.
[179] Ripper., r.352.
[180]el-Fariqî, h.b., r.457
[181]el-Fariqî, h.b., r.457.
[182] Ripper, h.b., r.353.
[183] Rîpper, h.b., r.209.

Agahîyên derbarê kuştina Ebû Elî de di Tarîxu Meyyafariqîn de wiha derbas dibin: "Ebû Elî karûberên rêvebirîya dewletê xistin destê wezîrê xwe Mem û dema xêlî ji bo anîna bûkê şand Helebê ew jî di gel Şêroyê[184] kurê Mem ber bi Amedê ve çû Şevekê li ber ava Hew[185]a Xanê man û hatin Tilelwîyê[186] li wir bi cih bûn. Abdulber ku pêşeng û giregirê Amedê û serokê sûka xwarinê bû û mirovekî xwedanxêr, birûmet û muqtedir hat serdana wî. Ebû Elî ew xweş pêşwazî kir û gelek diyarî danê; wî jî gelek dîyarî jê re anîbûn."[187]

Kêfa Şêro pir ji Ebû Nesr re dihat lê rihê wî ji Ebû Elî diçû. Dema ku Abdulber bi tenê dît jê re got: "Ez vê şîretê li te dikim ku bi vê xweşbêşîya mîr newe xapandin,  dixwaze we bi vî awayî bixapîne û derbeyekê li we bixe. Tenê ji bo vê armancê hatiye Amedê. We dît bê çi anî serê gelê Meyyafariqînê, hay ji xwe hebin."[188]

Dema Şêro ev gotinên nebaş derbarê Ebû Elî de ji Abdulber re gotin Abdulber li dijî van gotinên wî derket û sedaqeta xwe ji mîr re nîşan da û wiha got: Em xulamê mîr in û di bin fermana wî de ne derbarê me de çawa tevbigere serbest e. Lêbelê çawa ku Evdulber vegerîya Amedê rewş ji gel re got û ev tirs û gumanên derbarê Ebû Elî de ji wan re anîn zimên.[189] "Jixwe bûyerên ku li Meyyafariqînê pêk hatibûn şik û guman ji Evdulber re çê kiribûn û êdî ewlehîya wî bi Ebû Elî nemabû, ditirsîya ku rojekê Ebû Elî tişta ku anîbû serê gelê Meyyafariqînê bîne serê wan jî."[190]

Gelê Amedê dema gotinên Abdulber ên derbarê Ebû Elî de bihîstin jê re gotin ku: Tu çawa bixwazî em di bin fermana te dene." Bi vî awayî pilana kuştina Ebû Elî kirin. Li gorî vê planê dema mîr ket hundir Abdulber dê tiştina bi ser serê wî de

---

[184] Navê wî Şerwînê kurê Muhemmed e lêbelê nivîskar bi kurtayî qala wî dike wek ku ji esra Merwanîyan heta îro ev ededek e li cem kurdan. Bnr. El-Xûlî&Baluken, h.b., Jêrenot:4, r.460.
[185] Çemekî ku di Meyyafariqînê re û nêzî Amedê derbas dibe. Îro jê re "Anbarçayi" tê gotin.Bnr. el-Xûlî&Baluken; el-Fariqî, h.b., Jêrenot:4, r.460.
[186] Girekî biçûk e li dora Diyarbekirê li ser rêya Meyyafariqînê nêzî Amedê ye. Niha navê wê "Tiralo" ye. Bnr. El-Xûlî&Baluken, Jêrenot:6, r.460.
[187] el-Fariqî, h.b., r.460.
[188] el-Fariqî, h.b., r.461.
[189] el-Fariqî, h.b., r.461.
[190] Şevket Beysanoğlu, *Anıt ve Kitâbeleriyle Diyarbakır Tarihi,* Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür Sanat Yayınları, Ankara 1996, C.1., r.182.

bireşîne û kesên din jî dê êrîşî wî bikin kesê ku wî bikuje jî dê bibe mezinê bajêr.[191] Bi vî awayî di ketina deryê bajêr de Ebû Elî ji hêla kesekî bi navê Ebû Zahir Yusufê Kurê Dimneve hat kuştin.[192] Kuştina Ebû Elî di dawîya sala 387/998an de pêk hat. Piştî kuştina Ebû Elî, Şêro û birayê Ebû Elî, Ebû Mensûr Ehmedê kurê Merwan digel artêşê berê xwe dan Meyyafariqînê. Li wir Wezîr Mem, mîrîtîya Ebû Mensûr îlan kir û nasnavê "Mumehhîduddewle" dayê. Ebû Mensûr Şêro kir alîkarê xwe û karûberên rêvebirîya dewletê jî xist destê Mem.[193]

Îbnu'l-Ezreq çiqas agahîyeke rasterast nedabe ku kuştina Ebû Elî bi xebera Ebû Nesr pêk hatiye jî lê ji pêkhatina bûyeran em fam dikin ku di suyîqesta ku li Ebû Elî hatiye kirin de guman heye ku bi rizaya Ebû Nesr pêk hatibe. Lewra li gorî Îbnu'l-Ezreq piştî ku Ebû Elî hat kuştin Şêro termê wî pêşî anîbû cem Ebû Nesr.[194]

Di dawîya sala 387/998an de Ebû Elî hate kuştin desthilatdarîya wî ji heft salan zêdetir yan jî kêmtir dom kir.[195] Piştî ku Ebû Elî tê kuştin termê wî li Erzenê[196] bi cih dikin û wê demê hêja bavê wî Merwan sax e. Îbnu'l-Ezreq vê bûyerê wiha neqil dike: "Termê Ebû Elî û serê wî dibin Erzenê û di qubbeya li ber mizgeftê de ku li rojhilatê pirê hatiye çêkirin vedişêrin. Merwanê bavê Mîr Ebû Elî hingê kor bûbû digel hevsera xwe hate wir û her du li ser gora Ebû Elî rûniştin."[197]

### 2.3. Serdema Mumehhîduddewle Ebû Mensûr (387/998-401/1011)

Piştî ku Ebû Elî hat kuştin Ebû Mensûr Mumehhîduddewle ket cihê wî.[198] Mîr Mumehhîduddewle Ebû Nesr ji bilî Amedê welat hemû xist destê xwe û bû mîr. Şêro jî bû şêwirmend, alîkar, heval û kesê herî nêzî wî. Temamê karûberên

---

191el-Fariqî, h.b., r.461
192el-Fariqî, h.b., r.461, Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kirdistan*, r.332.
193el-Fariqî, h.b., r.461.
194 el-Fariqî, h.b., r.461.
195 el-Fariqî, h.b., r.462.
196 Cihekî binavûdeng ê nêzî Xelatê ye. Tê de keleheke asê heye ku ji mîmarîya Ermenan e. Bnr.Îbnu'l-Esîr, h.b., jêrenot, C.7., r.445.
197 el-Fariqî, h.b., r.462.
198 Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan,* r.332.

rêvebirîya dewletê di destê Şêro de bû. Ji her derê eşîret dihatin sûnd dixwarin ku dê di bin ferman û xizmeta wî de bin, tenê Amed cuda ma.[199]

Di dema Mumehhîduddewle de rewşa gel pir baş bû. Herwiha hêza Mumehhîduddewle zêde bû; ji keyan re û ji xelîfeyê Bexdayê re name şandin. Ji hêla xelîfe û qralan ve jî jê re name hatin. Xelîfeyê Misrê el-Hekîm jî jê re name û diyarî şandin.[200]

Em dibînin ku Mumehhîduddewle, digel ku serokê mîrnişîneke Sunnî ye[201] lê hem bi xelîfeyê Bexdayê re ku Sunnî bû û hem jî bi Xeîfeyê Misre re ku Şîî[202] bû, têkilîyên xwe datîne. Ev jî nîşan dide ku Merwanîyan sîyaseteke dostane û aram dimeşandin.

Dewleta Bîzansê jî hukmê mîrîtîya Mumehhîduddewle pejirand. Lewra di navbera wan û merwanîyan de di sala 382/993an de peymanek hat çêkirin.[203] Mîrê kurdan Mumehhîduddewle, qral bi awayekî xeşik pêşwazî kir û baş pê re tevgerîya û qral vegerîya welatê xwe.[204]

"Mîrîtîya Mumehidudewle berdewam dikir. Şêro jî wezîrê wî bû û temame karê rêvebirîyê di destê wî de bû. Mîr eleqeyeke baş nîşanî Şêro dida û jê gelekî hez dikir." [205]

### 2.3.1. Zewaca Mumehidudewle û Têkilîya bi Hemdanîyan re

Ebû Elî xwestibû ku bi Sitînasa keça Seyfuddewleyê Hemdanî re bizewice; lê ji ber ku hatibû kuştin ev zewac pêk nehatibû.[206] Îca Mumehhîduddewle di ber

199 el-Fariqî, h.b., r.463.
200 el-Fariqî, h.b., r.466.
201 Tufantoz, h.b., r.59.
202 Mehmet Azimli, *Fatımi Halifeliği üzerine Bazı Değerlendirmeler*, D.Ü.İlahiyat Fakültesi Dergisi, C.VII, H.1, Diyarbakır 2005, r.60.
203 Evdurreqîb, h.b.r.142
204 Yahya bîn Seîd, *Tarîxu'l-Entaqî*,Curûs Burs, Lubnan 1990, r.247.
205 el-Fariqî, h.b.466.
206 el-Fariqî, h.b., r.460.

heman nextê de di sala 388/999an de Sitînas xwest. Bûk anîn Meyyafarikînê û Mumehhîduddewle li wir pê re zewicî.[207]

Merwanîyan bi zewaca Mumehhîduddewle û Sitînas têkilîyên xwe bi Hemdanîyan re di asteke biîstiqrar de dimeşandin. Bi vê yan dixwestin di navbera îxtilafên Bakurê Sûrî de têkilîyên xwe û Hemdanîyan ku berê danîbûn berdewam bikin yan jî bi alîgirtina yek ji warisê mîrnişîna Hemdanîyan dixwestin ku dubendîya di navbera wan de kûr bikin.[208] Lewra digel ku Hemdanîyên Mûsilê bi destê Merwanîyan ji holê rabûbûn niha bi Hemdanîyên Helebê re bi zewaca Mumehhîduddewle têkilîya xizmantîyê danîn.[209]

### 2.3.2. Desthilatdarîya Kurê Dimne li Amedê

Birayê Ebû Elî, Mumehîddewle li Meyyafariqînê rêvebirî xistibû destê xwe lêbelê bajarê Amedê piştî heşt salan ji destê Merwanîyan derketibû.[210]

Piştî kuştina Ebû Elî, Mumehhîduddewle çûbû Meyyafariqînê û rêvebirîya Amedê ketibû destê Abdulber. Ebû Tahirê kurê Dimne piştî demekê Evdulberê zavayê xwe jî ji holê rakir û bû hakimê Amedê. Îbnu'l-Ezreq bi berfirehî qala kurê Dimne û kirinên wî yên li Amedê dike û wiha dibêje: Piştî ku bajar ket destê Abdulber wî mîrîtîya bajêr da Îbnî Dimne. Abdulber qasid ji Şêro re şand û Şêro bi Mumehhîduddewle re axivî bi şertê ku li ser navê mîr xutbeyên xwe bixwînin û pereyên xwe li ser navê wî çap bikin desthilatdarîya wî ya Amedê pejirand. Evdulber temamê karûberên rêvebirîya dewletê xistibû destê kurê Dimne û bi karê qazîtîyê re mijûl bû û di meşandina karûberên gel de alîkarîya wan dikir.[211] Piştî ku karûberê rêvebirîyê ketin destê kurê Dimne xwest ku Evdilber bikuje. Temamê hevalên xwe yên kevin kom kirin û fikra jiholêrakirina Evdulber ji wan re jî got. Tevan sûnd xwar ku dê piştgirîya wî bikin. Rojekê kurê Dimne xelkê bajêr vexwendin ji bo xwarinê. Di wextê xwarinê de kurê Dimne çû mala Evdilber ew kuşt serê wî jê kir û hat. Piştre

[207] el-Fariqî , h.b.r.462.
[208] Ripper, h.b., r.212.
[209] Tufantoz, h.b., r.71.
[210] Ripper, h.b., r.356.
[211] el-Fariqî, h.b.,r.464-465.

hat nava civatê. Ji wan re  wiha got: “Min bihîstiyê Evdulber biryar daye ku bajêr radestî Şêro bike û bibe wezîrê Mumehhîduddewle. Wî dixwest ku derbeyekî li min û li we bixe. Hûn dizanin ku ez derbarê we de çiqas bi hesab im û di bin fermana we de me.” Piştî van gotinan kurê Dimne serê Evdulber ê jêkiri avêt ber wan û wiha got: “Îca kî îtaetê ji min re bike ez ê di xizmeta wî de bim û kî jî li ber min serî rake bila zanibe ku dê çi bê serê wî.”[212]

Bi vî awayî kurê Dimne, Evdulberê serokê Amedê ji holê rakir[213] û gel ji xwe tirsand. Kurê Dimne ji bo ku gel serê xwe jê re bitewîne û desthilatdarîya xwe jî baş li wir bi cih bike ket nava hin kar û xebatan. Kurê Dimne xezîneyên xwe vekirin û çi pere û çek hebûn anîn mala xwe û pere li dost û pismamên xwe belav kirin.[214] Em dikarin bibêjin ku kurê Dimne bi kar û kirinên xwe armanca xwe anîbû cih, lewra çawa ku Îbnu’l-Ezreq dibêje ji ber ku gelek qencî bi wan kiribûn gelê Amedê jê gelek memnûn man û ji biçûkan bigire heta mezinan her kesî serê xwe li ber tewand.[215]

Dema ku kurê Dimne Amed xistibû destê xwe rabû ji Şêro re nameyek şand û xwest liser şertê ku bi Evdulber re li hev kiribûn walîtîya wî bipejirîne. Bi vî awayî rêvebirîya kurê Dimne li Amedê ji hêla Mumehhîduddewle ve hat pejirandin.[216]

Kurê Dimne desthilatdarîya xwe li Amedê baş bi cih kir û name ji temamê hikumdaran re şandin. Ji Xelîfe el-Qadir Bîllah, el-Mustensir û ji keyê Rûmê re name şandin. Ji gelek deveran jê re diyarî hatin.[217]

Kurê Dimne çiqas ku xeber şandibe ji Meyyafariqînê re û wesayeta wir qebûl kiribe û xwe wek walîyekî Mîr Mumehhîduddewle dîtibe jî têkilîdanîna wî ya rasterast bi xelîfe û qralan re nîşan dide ku wî xwe li Amedê wek rêvebirekî xweser didît.

---

[212] el-Fariqî, h.b., r.463.
[213] Îbnî Texrî, *Nucûmu’z-Zahîre fî Mulûk Misir we Şam*, Wezaretu’s-Seqafîyye, Misir 1963, C.4., r.261.
[214] el-Fariqî, h.b., r.464.
[215] el-Fariqî, h.b., r.464.
[216] el-Fariqî, h.b., r.464.
[217] el-Fariqî, h.b., r.464

"Bi vî awayî desthilatdarîya Kurê Dimne bîst û heşt salan heta serê sala 415/1025an ku Nesruddewle ket Amedê dom kir."[218]

### 2.3.3. Kuştina Mumehhîduddewle û Desthilatdarîya Şêro li Meyyafariqînê

Desthilatdarîya Mumehhîduddewle berdewam dikir û Şêro jî wezîrê wî bû temamê karê rêvebirîya dewletê di destê Şêro de bû û mîr jê pir hez dikir.[219] Lê ev têkilîya wan ya baş pir dom nekir. Lewra Îbnî Feylûsê xulamê Şêro[220] ji bo ku navbera mîr û Şêro xerab bike tevgerîya û ji bo ku mîr bikujin ket nava hewldanekê.[221]

Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq Feylûs ji Şêro re wiha dibejê: "Zanibe ku saxmayîna min li ser ya te ye. Ez pê hesiyame ku mîr derbarê min û te de tiştine nebaş difikire. Ev eleqeya xweş ku nîşanî te dide hemû fêl û xapandin in. Va ye ez ji te re dibêjim ew dixwaze me bikuje.[222]

Piştre jî Îbnî Felyûs ji bo ku van gotinên xwe isbat bike gelek tişt gotin û delîl anîn. Şêro nedixwest ku xayîntîyê li mîr bike lewra dema Îbnî Felyûs jê re got ku "Em wî bikujin û tu bikeve cihê wî" Şêro bersiva wî wisa da "Xwedê neke ku wê roja ku ez xayîntîyê li mîr bikim ez bibînim. Mîr gelek qencî bi min kirine û heqê wî li ser min pir e. Heta ku wî ez li cihê xwe danîm û destûra min da ez bikevim herema wî jî. Ez nikarim vê xirabîyê pê bikim bikim û gel jî naxwaze ez di wî meqamî de bim.[223]

Şêro gelekî tevgerîya ku jehrê bixe nav xwarina mîr û bi wî awayî wî bikuje lê derfet neket destê wî.[224]

Lêbelê dawî Şêro û Îbni Felyûs derfeta kuştina Mumehidudewle bi dest xistin û mîr kuştin. Li gorî Îbnu'l-Ezreq kuştina wî wiha pêk hat: "Mîr keleha Hetaxê[225]

[218] el-Fariqî, h.b., r.484.
[219] el-Fariqî, h.b., r.466.
[220] el-Fariqî, h.b., r.466.
[221] el-Fariqî, h.b., r.466.
[222] el-Fariqî, h.b., r., 466.
[223] el-Fariqî, h.b., r., 466.
[224] el-Fariqî, h.b., r.467.
[225] Keleheke asê ye li Diyarbekirê û nêzî Farqînê ye. Bnr.Îbnu'l-Esîr, Jêrenot: 2, C.7., r.445.

dabû Şêro û wî jî biharan mîr bi xwe re dibir bi hev re li wir diman. Dîsa di sala 400/1010an li gorî qewlekê jî di sala 401/1011an de bi hev re çûn Hetaxê çend rojên xwe li wir derbas kirin. Dixwarin, vedixwarin, nêçîra xwe dikirin. Felyûs jî xwarin vexwarin ji wan re amade dikir û bi vî awayî dema xwe xweş derbas dikirin. Şêro û Felyûs mîr serxweş kirin û yek jî danîn ber derî ku bila kesekî nêzî mîr nekeve hundur herwiha kesên nêzî mîr û kurapên wî jî dema derketin derve Şêro ew li derve digirtin û digot ev kar bi fermana mîr e. Dema mîr xwe dirêj kir ku raze Felyûs ji Şêro re got ku wî bikuje; lêbelê Şêro kuştina wî nepejirand û wiha got: "Wellehî wijdanê min vêqebûl nake û ez vê yekê nakim. Tu dixwazî tu wî bikuje." Li ser vê Felyûs êrîşî mîr kir lê kuştina wî pêk neanî, vê carê Şêro hat alîkarîya wî kir û bi vî awayî Mîr Mumehhîduddewle kuşt.[226]

Piştî ku Şêro û xulamê xwe Felyûs Mumehhîduddewle kuştin. Ji Hetaxe xwe gihandin Meyyafariqînê dest danîn ser revebirîya dewletê. Şêro xezîneyên bajêr û artêş jî xist bin destê xwe. Gel jî ji tirsan serî li ber Şêro tewand.[227]

Zemanê ku Ebû Elî hatibû kuştin û Mumehhîduddewle ji Amedê vegerîyabirayê xwe Ebû Nesr mişextî Sêrtê kiribû û ji Meyyafariqînê dûr kiribû.Heta ku mir jî birayê xwe nedît.[228]

Piştî ku Şêro hate Meyyafariqînê roja sisêyan jî ji bo ku Ebû Nesr bide girtin û Sêrt û Tanzayê bistîne yekîneyek leşker ku ji pênc sed siwarî pêk dihat şand[229] lêbelê walîyê Erzenê Ebû’l-Kasim çawa ku pê hesîya şand pey Ebû Nesr anî cem xwe û bi hev re bi leşkerê Şêro re şer kirin. Bi vî awayî leşker revîyan û Şêro ji negihişte armanca xwe.[230]

---

[226] el-Fariqî, h.b., r.468.
[227] el-Fariqî, h.b., r.468.
[228] el-Fariqî, h.b., r.468
[229] el-Fariqî, h.b., r. 469.
[230] Tufantoz, h.b., r.75.

### 2.4. Serdema Nesruddewle Ebû Nesr Ehmedê kurê Merwan (401/1011-453/1062)

Di sala 387/998an de desthilatdarîya Mumehîdûdewleyê birayê Ebû Nesr bidawî bûbû[231] û rêvebirîya Meyyafariqînê ketibû destê Şêroyê wezîrê Mumehhîduddewle.[232] Amed jî jixwe ji dema ku Ebû Elî hatibû kuştin û vir ketibû destê Evdulber û kurê Dimne, piştre kurê Dimne Evdulber jî ji holê rakiribû û bi temamî bûbû hakimê Amedê[233] lê bi piştgirîya Xoce[234] Ebû'l-Qasim, Ebû Nesr di sala 401/1011an[235] de Meyyafariqîn û di sala 415/1025[236]an de jî Amed stendibû û di dema wî de hêza Merwanîyan giha asta herî bilind.[237] Nasiruddewle Ehmed bi bernavkê "adil" dihat naskirin. Ji bo avahîsazî û zanista li welatê xwe pir xebitî û gelek berhemên mayînde ji dema wî man[238]

Serdema Nesruddewle ji her alîyê xwe ve serdemeke zêrîn e.[239] Ji berk u di vê serdemê de sîyaseteke aşîtîyane û baş dihat meşandin ev serdem di asta di asteke bilind de bû û serdemeke xweş û geş bû.[240]

#### 2.4.1. Stendina Meyyafariqînê û Dawîlêhatina Desthilatdarîya Şêro

Piştî ku Şêro Mumehhîduddewle kuştibû Meyyafariqîn xist destê xwe û ji bo ku Ebû Nesr bide girtin leşker şandibûn Sêrtê lê negihabû armanca xwe.[241] Bidestxistina Ebû Nesr Ehmed a Meyyafariqînê di Tarîxû'l-Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq de wiha hatiye vegotin: Dema Şêro leşker şand ku Ebû Nesr bigirin û Sêrt û

---

[231] el-Fariqî , h.b. r.469.
[232] el-Fariqî, h.b., r.468.
[233] el-Fariqî, h.b., r.468.
[234] Di farisî de xace خواجه/ di tirkî de "hoca" tê gotin. Derbarê bingeha peyvê de agahîyeke misoger tuneye. Di dîroka Îranê de ji serdema Samanîyan 819/1005 û vir ve zêde hatiye bikaranîn. Wek nav di wateya sermiyanê malê, kethûda, şêx, pîr, hikumdar de tê bikaranîn.Bnr. Hoca, Îslam Ansiklopedisi, 1998, C.18,r.186.
[235] el-Fariqî, h.b., r.473.
[236] el-Fariqî, h.b., r.467.
[237] M.S.Lazarev&Ş.X.Mihoyan&yên din, h.b., r.61.
[238] Mihemed Emîn Zekî Beg, *Meşahîrî Kurd we Kurdistan*, r.56.
[239] Yûsuf Baluken, "Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri", Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012, r.60.
[240]el-Fariqî , h.b. r.488.
[241] Îbnu'l-Esîr , h.b., C.7., r.445.

Tanzayê[242] bistînin, di heman demê de jî Evdurrahman bin Ebû'-Werdê Denbilî şandibû Erzenê. Xoce Ebû'l- Qasim li Erzenê dima. Ebû'l-Qasim mirovekî zana û bihesab bû. Çawa pê hesîya ku Şêro Mîr Mumehîdûdewle kuştiye û ji bo girtina Ebû Nesr leşker şandine, bi vê yekê pir aciz bû û bi lêz xeber ji Ebû Nesr re xeber şand û got: "Nesekine were Erzenê." Ebû Nesr hat cem Xoce Evdu'l-Qasim û bi alîkarîya hev bi leşkerên ku Şêro şandî re şer kirin. Leşkerê ku Şêro şandibûn têk çûn û revîyan.

Xoce Ebû'l-Qasim paşê çû gelê bajêr berhev kir. Hemûyan sûnd xwar ku dê di bin fermana mîr de bin û wî jî devê xezîneyan vekir, mal, pere û çek dan gel û leşker. Ji her alî eşîretên kurdan li hev civandin û bi vê girseya mezin a gel sûnd da xwarin ku heta mîr, Şêro bikuje û welat bixe bin hukmê xwe em ê di bin fermana wî de bin.

Alîgirên Ebû Nesr, pêşî êrîşê Ribadê ku li derveyê Meyyafariqînê bû kir. Gelek ji leşkerên Şêro kuştin û talanê wan birin. Şêro û leşkerên xwe ji bajêr derketin û bi wan şer kirin; lê gelek leşkerên Şêro hatin kuştin û tiştên bi xwe re tev hiştin û revîyan. Mîr ev xenîmet tev li leşkeran belav kir û tiştek ji xwe re nehişt.

Girseyeke mezin ji gel jî hat gihaşte wan. Mîr û Xoce Ebû'l-Qasim digel vê girseya gel û leşkeran ber bi Meyyafariqînê ve hatin û li cihekî bi fersahekî nêzî bajêr bi cih bûn.

Dema Şêro bi vê hesîya poşman bû. Îca zanibû ku encameke nebaş li pêşîya wî ye. Zanibû ku berê gelek xirabî bi gel kiriye îca ji bo ku dilê wan xweş bike rabû mal û pere li wan belav kirin û têkilîyeke baş bi wan re danî. Îbnî Felyûs rabû şîretek lê kir û jê re got ku ji keyê Rûmê alîkarîyê bixwaze û welat teslîmî wî bike. Şêro bi xebera Îbnî Felyûs kir. Ji keyê Rûmê re name û gelek dîyarî şandin. Lê dema gelê bajêr ev bihîstin pê pir aciz bûn, lanet li Şêro û Îbnî Felyûs anîn. Li ser vê Şêro rabû cewher û pere û malê di destê xwe de xist sendiqan û xeber ji kurê Dimne re şand û xwest wan emanetî wî bike.[243] Îbnî Dimne, Murtecê ku hem alîkar û hem zavayê wî

[242] Niha gundekî Sêrtê yê û xirabe ye. Bnr. El-Xûli&Baluken, el-Fariqi, h.b., Jêrenot:1, r.474.
[243] Derbarê alîkarî xwestina ji Rûme de Nasîbîn dibêje Îbnî Felyûs ji Şêro re got ji Rûmê alîkarîyê bixwaze lê Şêro ev tişt nepejirand. İlıya en-Nasibini, *Tarihu İliya*, Bar Sinaya, r.204. vgh. Demircan&Akbaş, *Tarih* "Ömer Tokuş", Nida, İstanbul 2014, r.182.

bû şand cem Şêro û bi vî awayî ev sandiq birin Amedê. Kurê Dimne sûnd xwar û dilsozîya xwe ji Şêro re destnîşan kir û herwiha Şêro, ji bo ku tu caran tifaqa xwe pê re xerab neke sûnd xwar. Piştî ku gel fam kir ku Şêro dixwaze welêt bixe destê keyê Rûmê û derbeyekê li Misilmanan bixe. Roja înê dema milet dît ku Îbnî Felyûs digel girseyeke mezin tê mizgeftê, tirsiyan ku ew wek Ebû Elî bîne serê wan. Lewra gel ditirsiya ku çawa berê Ebû Elî hevrikên xwe ji bajêr avêtibûn Şêro û Îbnî Felyûs jî wiha wan ji bajêr bavîjin. Ji ber vê gel êrîşê Îbnî Felyûs kir heta ku ew bir ber derîyê qesrê. Gel xwest ku Şêro, Îbnî Felyûs radestî wan bike lewra ji Şêro re gotin: "Serê gelacîyê Îbnî Felyûs e û wî berê te da van xirabîyan." Lêbelê Şêro ev tişt nepejirand û li ser vê şer di navbera leşker û gel de dest pê kir. Şêro ferman da tîravêjên Gurcî[244] û wan gelek ji gel kuştin û birîndar kirin. Lê di vî şerî de Şêro û hevalên xwe têk çûn, Îbnî Feryûs hat kuştin û termê wî ji hêla zarokên bajêr ve di kolanan de hat kaşkirin. Gel jî û tiştên nava qesrê talan kirin.

Piştî ku Şêro têk çû derket ser sûran û ket nava Birca mîr. Şêro gazî rîspîyên bajêr kir. Dema hatin lome û gazindê xwe li Şêro kirin; lê Şêro xwe avêt bextê wan û wan jî Şêro efû kir û soz danê ku dê navbeynkarîya wî û Mîr Ebû Nesr bikin. Li ser vê yekê ji ser bircê hat xwarê û hat mala giregirekî wan û li wir ew dan sûndê.

Ebû Tayyîbê ku Şêro li mala wî dima çû gilî û gazindên xwe li gel kirin û şîret li wan kirin ku dev ji talankirina qesrê berdin. Lê kesî guh nedayê. Milet qesra kevin tev hilweşand û tiştên ku tê de mabûn jî birin.

Piştî ku gel qesr talan kir xeber ji Ebû Nesr re şandin xwestin ku were. Mîr hat li derveyî bajêr baregeha xwe danî. Xeber ji wan re şand û xwest ku Şêro radestî wî bikin; lê gelê bajêr gotin ku me bext û soz daye ku em can û malê wî biparêzin. Lê dubendî ket nava wan û li ser vê yekê Şêx Ebû Tayîbê kurê Mîhwer ji wan veqetiya û Ebû Tahirê kurê Hemamî hat bû serokê wan. Piştî demekê dîsa ketin qiriqa hev û Ebû Tahir jî dev ji wan berda. Vê carê ji giregirên Sûka Qumaşfiroşan Ebû'l-Hesen Ehmedê kurê Wasif el-Bezaz û Îbnî Ebî Reyhan li hev kirin ku pêşengîya gel bikin û bajêr biparêzin.

---

244 Esîlzadeyekî gurcî ji ber qralê gurcî Îbnî Leys reviyabû digel yekîneyeke tîravêj û ketibû xizmeta Mumehhîduddewle û piştî kuştina Mumehhîduddewle ketibûn bin fermana Şêro. Bnr. el. Fariqî ,h.b., r.471; Rîper, h.b., r.378.

Mîr Ebû Nesr şerê gelê bajêr kir û şer germ bû. Li ser vê Îbnî Wasif fam kir ku ev kar dê gelekî dirêj bibe û gel bajêr teslîmî mîr nake û ev jî dê bike ku neyartîya nava wî û mîr kûr bibe. Rabû bi dizî xeber ji mîr re şand xwe avêt bextê wî, Xoce Ebû'l-Qasim û hevalên wî. Ji bo xwe û gel jî hinek şert pêşniyaz kirin û got ku tişta ji destê min bê ez ê bikim. Li ser vê daxwaza Îbnî Wasif mîr bi erênî tevgerîya, paş de vekişiya û êrîş sekinand.

Îbnî Wasif rîspî û giregirên bajêr li mizgeftê civandin û ji wan re got ku em ê heta kengê karibin di bin vê dorpêçkirinê de sebr û semaxê bikin. War û xanîyên me xerab bûn, debara me êdî hew dibe. Lêbelê gel ev daxwaz nepejirand û nexwest Şêro radest bike. Dema meha mijdarê hat berf û sermayeke dijwar dest pê kir û mîr û hevalên xwe gelek tengasî kişandin û nikarîbûn li wir bimînin. Ji ber vê yekê hinek leşkerên xwe li wir hiştin û hatin li Erzenê man. Leşkerê mîr ku li dora bajêr man nehiştin ku danûstendina wan bi derve re çê bibe û tiştekî xwarinê bikeve nava bajêr.

Mîr heta sibatê li Erzenê ma û piştre dîsa êrîş berda ser Meyyafariqînê û dorpêçkirina bajêr bêtir şidand. Îbnî Wasif dîsa xeber ji mîr re şand û xwest mîr bawerîya xwe pê bîne. Mîr jî bersiva wî bi awayekî erênî da û pê da zanîn ku dê qenciyê pê bike. Piştî ku Îbnî Wesif ev xebera erênî ji mîr bihîst rabû gel kom kir û ji wan re wiha got: “Gelo ev rewşa me dê heta kengî dom bike, va ye ev mîr bela xwe ji me venake. Ji wî pê ve kesî me jî tune ku em xwe bavêjinê. Em ji mîr re binivîsin ku va ye me rewşa xwe sererast kiriye û em ê bexşandina Şêro jî jê bixwazin heke mîr Şêro bibexşîne baş e, nebexşîne jî Şêro dimire bila bimre em ji bo Şêro xwe neavêjin mirinê.” Li ser vê gel ev pêşnîyaza Îbnî Wesif pejirand û lijneyek ji gelê bajêr çûn cem mîr û daxwazîya bexşandina xwe kir. Mîr bi awayekî nivîskî soz û bext da wan û ji wan re got ku ez tiştekî bi Şêro nakim.

Piştî vê lihevkirinê di dawîya sala 401/1011an de Mîr Ebû Nesr ket nava bajêr.[245]

Stendina Meyyafariqînê ji bo Ebû Nesr Ehmed pir girîng bû. Lewra ew der payîtexta mîrnişînê bû. Şêro derbeyek kiribû û bi vî awayî rêvebirîya mîrnişînê ji bo demekê ji destê Merwanîyan derketibû. Bêguman Ebû Nesr ne bi awayekî rehet û ne

245 el-Fariqî, h.b., r.469-473.

di demeke kin de ev der bi dest xist, lewra di dorpêçkirina bajêr de gelek astengî kişandin. Dîsa di vê serkeftinê de û di hatina Ebû Nesr a ser desthilatdarîyê bi xwe de jî rola Xoce Ebû'l-Qasim pir bû.

Li gorî Îbnu'l-Ezreq piştî Stendina Meyyafariqînê Mîr Ebû Nesr, Xoce Ebû'l-Qasim kir wezîrê xwe. Ebû'l-Qasim gelek tiştên baş kirin û sîyaseteke baş meşand. Pêşî ceza da hinek kesên bêexlaq, bizerar, fasiq û fesad. Wekî din jî kesên wiha yan ji bajêr qewirandin yan jî ew bi xwe mecbûr man ku birevin. Dînarên[246] ku di dema talankirina qesrê de biribûn jî ji wan stendin.[247]

Piştî demekê mîr Şêro girt û şand cihê ku birayê wî Mumehhîduddewle lê kuştibû[248] û ew li wir bi dar ve kir. Hinek kesên din jî ku pê re nebaşî kiribûn kuştin. Kesên ku gelacî derdixistibûn jî, ji bajêr hatin qewirandin.

Mîr tabûta birayê xwe Mumehhîduddewle bir Erzenê cem bavê xwe û di qubbeya birayê xwe, Ebû Elî de defin kir.

Mîr piştî ku ketibû Meyyafariqînê rêvebirîya Tanza, Tilfafan û heta sînorê Cezîreyê[249] dabû Ebû'l-Hesenê kurê Wasif. Lê piştî ku mîr, Şêro kuşt Ebû'l-Hesen tirsiya, dev ji rêvebirîya vir berda û revîya çû li Bexdayê bi cih bû.[250]

### 2.4.2. Stendina Amedê û Dawîlêhatina Desthilatdarîya Îbnî Dimne

Piştî ku Mîr Ebû Nesr Meyyafariqîn stend desthilatdarîya xwe baş bihêz kir. Ji bilî Amedê temamê Diyarbekir xist bin desthilatdarîya xwe.[251] Ji dema ku Ebû Elî li Amedê hatibû kuştin û vir ve ango ji sala 387/997an û vir ve[252] desthilatdarîya Amedê ji destê Merwanîyan derketibû. Îbnu'l-Ezreq bi berfirehî qala stendina Nesruddewle ya Amedê dike û wiha dibêje: "Tê gotin ku kurê Dimne di sala

---

[246] Cureyekî pereyan ê kevin e. Qîmeta wî nêzî çaryekeke zêr e.Bnr. https://play.google.com/store/apps/details?id=paket.trsozluk. (17/08/2016)
[247] el-Fariqî, h.b., r.473.
[248] Şêro Mumehhîduddewleyê birayê Nesruddewle li keleha Hetaxê. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.467.
[249] Eddurreqîb Yûsuf ev der wek "Herêma Botan" bi nav kiriye. Bnr. Yûsuf, h.b., C.1., r.167.
[250]el-Fariqî, h.b., r.474.
[251] el-Fariqî, h.b., r.474.
[252] Yûsuf, h.b., C.1., r.178.

415/1025an bi Murtecê fermandar û zavayê xwe re wek her sal hinek dîyarî ji Nesruddewle re şandin. Vê cara ku Murtec hatî xwest ku ew û mîr bi hev re bi dizî biaxivin û dema her du bi tenê man jê re got ku eger tu sond bixwî ku tu dest nedî mal û milkê min û tu xirabîyê bi min nekî. Piştî mîr û wezîr Ebû'l-Qasim sûnd xwarin kurê Dimne vegerîya Amedê û wî û çar hevalên xwe çûn Îbnî Dinne kuştin. Piştî ku kurê Dimne hat kuştin xulamê wî xeber da gazî xulamên din kir û çûn xeber gihandin keça kurê Dimne ku hevserê te bavê te kuşt.[253]

Piştî kuştina Dimne, Murtec û gel kom bûn û di vê navbêrê de Xûlamê kurê Dimne ku di dema kuştina wî de li wir bû ji nava koma millet derket û Murtec kuşt. Gel bi Murtec re mijûl dibû û xûlamê ku Murtec kuştî rabû devê xezîneyê vekir gelek tiştên giranbuha birin û berê xwe da Meyyafariqînê. Hingê gelê Amedê jî êrîşî qesrê kir û tiştên navê birin, ewder talan kir.

Zarokên Murtec jî xeber ji Nesruddewle re şandin û derbarê rewşa bajêr de agahî danê. Nesruddewle ket rê û berê xwe da Amedê di rê de gihan wî xulamê ku Murtec kuştibû. Xulam tiştên giranbuha ku ji xezîneyê derxistibûn dan Nesruddewle. Cihê pereyên kurê Dimne û agahîyên kesên ku ev pere birine ji mîr re gotin.

Dema gihan Amedê her du kurên Murtec derîyê bajêr li ber wan girt û digel heval û kesên derûdora xwe rahiştin çekên xwe û derketin ser sûran. Ebû'l-Qasim bi wan re axivî. Wan dixwest ku mîr wî xulamê ku bavê wan kuştî radestî wan bike. Pêşî mîr ev daxwaz nepejiran lê paşê Ebû'l-Qasim jê re got: "Em nikarin Amedê bidin bi xulamekî. Ew heqê xwe û kujerê bavê xwe dixwazin. Jixwe kurê Dimnebi xebera te hat kuştin." Li ser vê mîr xulamê ku kurê Dimnekuştibû da destê kurên Murtec û wan jî ew li wir kuşt. Mîr soza ku dabû Murtec da kurên wî jî û wan jî derîyê bajêr li mîr vekir. Mîr di serê sala 415/1025an de ket Amedê û desthilatdarîya kurê Dimne li vir bîst û heşt salan dom kir.

Nesruddewle karûberên Amedê birêkûpêk kirin. Mal û xezîneyên kurê Dimne û tiştên qesrê ku hatibûn talankirin ji xelkê stendin. Gelek qencî bi gelê bajêr kirin û dadmendî li nava wan belav kir. Xwest ku walîtîya Amedê bide Ebû'l-Xarisê hevalê

---

[253] Ev tiştê ku hat serê kurê Dimne ku zavayê wî ew kuşt kurê Dimne jî wisa anîbû serê xezûrê xwe Evdulber. Lewra hatibû mala wî û serê wî jê kiribû. Heta tê gotin ku dema kurê Dimne serê xezûrê xwe jê kir keça Evdulber jî li cem hevserê xwe kurê Dimne bû. Bnr. el-Fariqî, h.b., r.464.

xwe ku niha walîyê Ruhayê bû; lê hêja mîr ji bajêr derneketî xebera mirina wî hat. Nesruddewle rabû kurê xwe Ebû'l-Hesen kir walîyê Amedê û vegerîya Meyyafariqînê. [254]

### 2.4.3. Bihêzbûna Desthilatdarîya Nesruddewle

Piştî stendina Meyyafariqînê desthilatdarîya Ebû Nesr bihêz bûbû[255] lê bi stendina Amedê re navûdengê wî bêtir belav bû di çavên hikumdaran de jî mezin bû.[256]

Di meha zilhîceyê de berî cejnê bi sê rojan xizmetkarekî Xelîfe el-Qadir Billah hat cem Ebû Nesr. Xelîfe gelek xelat û diyarî jê re şandibûn û nasnavê "Nasrudewle"dayê. Nivîsek jî jê re şand û tê de destnîşan dikir ku temamê keleh û bajarên Diyarbekir dane Nesruddewle. Di heman demê de xelîfeyê Misrê el-Hakim Biemrîllah jî gelek diyarî ji Nesruddewle re şandin û wî jî nasnavê "Îzzûddewle” dayê.[257] Roja din Qralê Rûmê jî bi qasidekî xwe re gelek diyarî ji Nesruddewle re şandin. Roja cejnê ya çaran jî Nesruddewle li ser textê xwe rûnişt. Qasidê xelîfeyê Bexdayê û yên Misrê û Qralê Rûmê jî li kêlekên wî rûniştibûn. [258]

Merwanî di navbera sê hêzên xwedî dîn û mezhebên cuda de bûn û her sê jî bi hev re di nav têkoşînê de bûn: Buwehîyên Şiî-Fatimî, Ebbasî û Selçûqîyên Sunnî û Bîzansîyên fileh.[259] Nesruddewle bi xelîfeyê Ebasî el-Qadirbîllah û bi her sê hêzên din re ket nava têkilîyên aşîtîyane. Gelek dîroknasên rojhilat qala vî qedr û qîmetê ku wan dewletan nîşanî Nesruddewle dane dikin û di berhemên xwe de wek hikumdarekî Îslamê yê binavûdeng qala wî dikin.[260]

---

254 el-Fariqî, h.b., r.483-484.
255 el-Fariqî, h.b., r.474.
256 el-Fariqî, h.b., r.485.
257 el-Fariqî, h.b., r. 476., M.S.Lazarev&Ş.X.Mihoyan&yên din, h.b.,r.62.
258 el-Fariqî, h.b., r.476-477; Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, r.334.
259 Bekir Biçer, *Kürtler*, Çizgi, İstanbul 2014, r.120.
260 Rîpper, h.b, r.179.

Nesruddewle ji alîyekî ve bi Uqeylî û Mîrdasîyan re şer dikir û ji alîyê din ve jî tedbîra xwe distend û bi sîyaseteke bi zanayî dimeşand.[261] Bi vî awayî welat xist nav aramîyê û heq û edalet di nav gel de belav kir. Bacên giran ji ser wan rakirin.[262]

### 2.4.4. Jîyana Nesruddewle

Nesruddewle pêşî bi keça Fedlûneyê hikumdarê Ermenîstanê Fedlûnîyeyê re zewicî. Piştre bi Seyîdeya keça Şerefûdewle Qerwaşê kurê Meqelled re zewicî. Lê rojekî kesekî bi navê Ustad Ferec ji Misrê hat Meyyafariqînê. Cêrîyeyek pê re bû ku di xweşikbûna û strangotinê de keseke bêhempa bû. Dilê mîr ket vê cêrîyeyê û li serê dîn bû. Mîr xwest ku vê cêrîyeyê bikire lê ji ber ku zarokeke xwedîyê wê jê hebû nikarîbû bifiroşe li ser vê mîr rabû pê re zewicî.[263]

Bi tevahî çar jinên Nesruddewle hebûn. Yek keça Fedlûneyê Qralê Rûmê Fedlûnîye; yek keça Şerefudewle, Seyyîde; yek keça Senrîbê Qralê Senasîna û ya din Ferecîye bûn. Lê ji bilî van çar jinên wî sê sed û şêst cêrîyeyên wî hebûn. Her roj yek dihate cemê. Dengbêj û reqasên ku li cem tu siltan û qralan peyde dedibûn li cem Mîr Nesruddewle hebûn. Cêrîyên xweşik, dengbêjên bihuner li kû hebûna mîr pereyekî pir zêde dida û dianîn cem xwe.[264]

Kêf û zewqa ku Nesruddewle tê de bû û bereket û kamranîya ku ew dijîya bêhempa bû.[265] Hemû rojên wî wek cejnê derbas dibûn.[266]

Bi gelemperî Nesruddewle rojên xwe wiha diborandin: Rojekê bi leşkeran re dima, heta şevê bi hev re dixwarin û vedixwarin. Rojeke xwe bi pismam û zarokên xwe, mirov û hevalên xwe re diborand û heta şevê dixwarin û vedixwarin. Piştre saetekê li cem dengbêj, reqas û qeşmeran dima. Dema ev jî diçûn îca mîr li cem cêrîyeyên xwe bi tenê dima û radiza û berê sibehê radibû nimêja sibehê dikir. Li gorî ku hatiye gotin di seranserê hikumdarîya wî de rojekê jî nimêja sibehê lê neçûye.

[261] M.S.Lazarev&Ş.X.Mihoyan&yên din, h.b.., r.62.
[262]el-Fariqî, h.b., r.478.
[263]el-Fariqî , h.b., r.481.
[264]el-Fariqî, h.b., r.501; Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.110.
[265]el-Fariqî, h.b., r.490.
[266]el-Fariqî, h.b., r.491.

Sibehan zû diçû nêçîrê û ber nîvro vedigerîya. Dema ji nêçîrê vedigerîya wezîr dihat cemê û saetekê li ser karûberên rêvebirîya dewletê diaxivîn û biryar û fermanên xwe ji wezîr re digotin û firavîn dixwar û heta berêvarê bêhna xwe vedida.[267]

Dema dibû bihar Nesruddewle digel zarok, hevser, cêrî, heval û pismamên xwe diçûn Nasriyeyê û di nav kulîlk û şinahîyan de bihara xwe diborandin û dema hewa germ dibû vedigerîyan.[268]

### 2.4.5. Kesên Ku Xwe li Nesruddewle Girtibûn

Ji her derê mirov dihatin cem Nesruddewle. Ew stargeha her kesî bû.[269] Ji ber ku sê dewletên mezin dewleta Ebbasî, dewleta Fatimî û dewleta Bîzansîyan desthilatdarîya Nasrûdele nas kiri û pejirand û Nesruddewle jî têkilîyên xwe bi wan re zexm kirin[270] di dewra Nesruddewle de aramî û aşîtîyeke demdirêj pêk hat. Ji ber vê yekê jî kesên ku ji ber zilm û zordarîya sîyasî dirêvîyan xwe li Merwanîyan digirtin. Lewra mîrnişîna Merwanîyan di navbera wan hêzên mezin de wek herêmekê tampon a bêalî bû.[271]

Yek ji wan kesan ku hatibû cem Nesruddewle, Melik Ezîzê Buweyhî bû. Melik Ezîz gelek diyarî ji Nesruddewle re anîbûn û Nesruddewle jî Melik Ezîz bi awayekî xweşik pêşwazî kiribû û gelek qencî pê kirin û zêdeyî bîst hezar dînarî dabûyê.Melik Ezîz demekê li Sêrtê ma û piştre li Meyyafariqînê mir.[272]

Hevsera xelîfe digel kurê xwe yê biçûk Zexîre hatibûn Meyyafariqînê. Nesruddewle ew şandin Amedê û di qesrê de bi cih kirin û temamê pêdivîyên wan pêk anîn. Qazî Ebû Elîyê kurê el-Bexel ji Amedê hat Meyyafariqînê cem Nesruddewle û jê xwest ku heta malbata xelîfe li Amedê be ew mesrefa wan bide.

[267]el-Fariqî, h.b., r.501-502.
[268]el-Fariqî, h.b., r.490; Yûsuf, h.b.,C.1., r.230.
[269]el-Fariqî, h.b., r.490.
[270] Yûsuf, h.b., C.1., r.173.
[271] Ripper, h.b., r.231.
[272]el-Fariqî, h.b., r.491.

Mîr nepejirand û got: "Çawa kurê xelîfe were cem min û nebe mêvanê min." Heta ku wezîr û civata dorê rîca ji mîr kirin hêja ev daxwaza el-Bexel pejirand.[273]

Piştî ku xelîfe vegerîya Bexdayê cihê xwe, Nesruddewle dîyarîyên bi behayê du sed hezar dînarî dan hevsera xelîfe û kurê wî û ew şandin Bexdayê. Ji ber vê jî navûdengê Nesruddewle belav bû û şan û şerefa wî zêde bû.[274] Di wê demê de ev rewşa ku xelîfetî bi êrîşekê re rûbirû dimîne û malbata wî diçe cem Merwanîyan ji me re nîşan dide ku welatê Merwanîyan wê demê welatekî aram û biewle ye.

Çawa ku Beysanoğlu jî dibêje ji ber ku Nesruddewle biedalet û merd bû gel jê pir hêz dikir û di heman demê de jî mirovên zana û hunermend diparastin, qencî li wan dikir û rûmet dida wan, ji ber vê yekê jî di dema wî de Meyyafariqîn bûbû cih û warên helbestvan û zanayan.[275]

### 2.4.6. Destpêka Têkilîyên Merwanî û Selçûqîyan

Di sala 432/1104î de Oxuzan dest bi êrîşa welatê kurdan kiribû[276] Tirkên ku pêşî hatin Azerbeycanê li wir xwe negirtin û hinek ji wan ber bi rojava ve çûn û hatin dora çiyayê ku çemê Batmanê û Xerzan jê diherike û ev der wêran kirin piştre Anasioxlu û Buga ji nava van berê xwe dan Amed û Meyyafariqînê.[277]

Li ser vê Nesruddewle gelek mal û diyarî ji Tuxrul Beg re şandin û gilî û gazindên xwe anîn zimên lê Siltan Tuxrul Beg jê re wiha got: “Sînorê welatê misilmanan biparêze û ji şerê ku bi kafiran têkirin re nebe asteng.”[278] Ji ber vê helwesta Tuxrul Beg, Nesruddewle nikaribû pêşî li êrîşên tirkmenan bigire.

“Di sala 434/1043an de ev her du fermandarên tirk Bûqa û Nasixlî digel artêşeke ku ji deh hezar siwarîyî pêk dihat êrîşî welatê Merwanîyan kir.[279] Siltan Tuxrul Beg ev her du fermandar şandibûn ber bi Diyarbekirê ve û mîrîtîya vî welatî jî

[273]el-Fariqî, h.b., r.496.
[274] el-Fariqî, h.b., r.497.
[275] Beysanoğlu, h.b., r.211.
[276] Osman Turan, *Selçuklular Tarihi ve Türk İslam Medeniyeti*, Ötüken, İstanbul 2009, r.113.
[277] Beysanoğlu, h.b., C.1., r.202.
[278] Îbnu’l-Esîr, h.b., C.8., r.334.
[279] el-Fariqî, h.b., r.497.

dabû wan.[280] Ev du kesên ku ji mezin û giregirên tirkan bûn êrîşî welatê Merwanîyan kir û welat talan kir. Pişre van kesan êrîşê Meyyafariqînê kir. Gelê Meyyafariqînê derîyê bajêr girt û Nesruddewle ji bo ku vegerin têklîfa pêncî hezar dînarî li wan kir[281] lê tu encam ji vê derneket. Lêbelê nîvêşevê her du fermandar serxweş bûn ketin qirqa hev, sixêf bi hev kirin û di navbera wan de şer derket û hev kuştin. Çawa ku Nesruddewle bi vê hesiya êrîşî wan kir, gelek ji wan kuştin, hinek dîl girtin û çi tiştên di destê wan de hebû ji wan stendin. Bi vî awayî Xweda Nesruddewle ji şerê wan parast. Heta ku Nesruddewle mir jî careke din bi êrîşeke wisa re rûbirû nema. Ev hatina wan a cara pêşî bû berî niha tu caran li van deran xuyanekiribûn."[282]

Li gorî agahîyên ku Faruk Sumer dide sê fermandarên Turkmeanan Anasioxlu, Buqa û Goktaş êrîşî welatê Merwanîyan kir. Hinek ji wan li Cizîrê man ên din çûn Diyarbekirê. Nasiruddewle Ehmed, hikumdarê Mûsilê Kervaşê Uqeylî û kurdên Beşnewî bi wan re şer kirin lê têk çûn. Paşê çûn Musil dagir kirin xutbe li ser navê Tuxrul Beg dan xwendin. Lê paşî hikumdarê Mûsilê Qervaş ji Hikumdarê Hîlleyê Dubeys û ji ereb û kurdan alîkarî xwest. Van fermandarên Oxuzan ên Mûsilê ji fermandarên Oguzan yên li Diyarbekirê Bûqa û Anasıoxlu alîkarî xwestin. Di vî şerê de Oxuz têk çûn û xwe li wir negirtin çûn Azerbeycanê.[283]

Têkilîya Selçûqî û Merwanîyan û herwiha sefera SiltanTuxrul Begê Selçûqî ya ber bi welatê Merwanîyan ve bi sedema Aslan Besasîrî bû. Bûyera Aslan Besasîrî di sala 450/1059an de dest pê kir. Besasîrî li Bexdayê serî li ber xelîfe rakir û bajar xist destê xwe, ji xelîfeyê Misrê alîkarî xwest û li ser navê wî xutbe xwend û zordestî li Xelîfe el-Qayîm kir.[284] Piştî mirina Mahmûd Sebuktekîn Tuxrul Beg bi Mesûd Beg re şer kiribû ew têk biribû û Xorasan, Rey û Îsfexan xistibûn bin desthilatdarîya xwe.[285] Siltan Tuxrul Beg piştî ku tişta hatiye serê xelîfeyê Bexdayê bihîst ber bi Iraqê ve çû û xelîfe ji bin tehekkuma Besasîrî derxist. Ev sefera Tuxrul Beg bû

[280] Fariqî, h.b., r.497; Beysanoğlu, h.b., C.1., r.204.
[281] Dîroknasên Misilman qala vî xûyê Nesruddewle dikin ku çi dema êrîşeke leşkerî çêdibû ji ber ku vegerin pere didan wan. Bi vî awayî Mîr hem leşkerên xwe diparastin û hem jî ji mesrefeke ku dê ji vî pereyî zêdetir xerc bûbûna xelas dibû. Bnr. Ripper, h.b., r.385.
[282] el-Fariqî, h.b., r.497.
[283] Faruk Sümer, *Oğuzlar Türkmenler*, Ankara Üniversitesi Dil Tarih-Coğrafya Yayınları, Ankara 1972, r.95, Ali Sevim, *Anadolu'nun Fethi Selçuklular Dönemi*, Türk Tarih Kurumu Yayınları, Ankara 1988, r.25-26.
[284] el-Fariqî, h.b., r.494.
[285] el-Fariqî, h.b., r.495.

sedema hilweşandina dewleta Deylemî[286] û destpêka dewleta Tirkan. Herwiha bi vê seferê, Tuxrul Beg piştî Xorosanê bû hakimê Iraqê jî.[287]

Piştî ku Bexda ket destê Selçûqîyan, erebê Iraq û Cezîreyê tirsiyan ku desthilatdarîya wan ji destê wan here. Berî her tiştî dixwestin ku welatê xwe ji wêrankirina êrîşên tirkmenan biparêzin. Bi vî awayî gelek bedewî tevî hêzên Besasîrî bûn. Dema Tuxrul Beg pê hesiya ku Mûsil ketiye destê alîgirên Besasîrî bi artêşa xwe re êrîşê wan kir. Piştre hêzên birazîyê Tuxrul Beg ku diçûn li talanê Bîzans bixin ji gihîştin wan û arteşa Tuxrul Beg bihêztir bû. Li ser vê hêzên Besasîrî û alîgirên wî Mûsil terk kir.[288] Du fermandarê ereban Qureyş û Dubeys ku alîkarîya Besasîrî kiribû jî qasid ji Siltan Tuxrul Beg re şandin bexşandina xwe jê xwestin. Siltan ew efû kirin û rêvebirîya dewleta wan xist destê wan.

Piştî ku Şerê Siltan Tuxril Beg yê bi ereban re qedîya berê xwe da Merwanîyan.[289] Selçûqîyan bi bedewîyên ereb re tifaq çê kiribûn û fermandarên artêşa Tuxrul Beg ji ber ku Nesruddewle Ehmedê Merwanî alîkarîya Besasîrî kiribû ji siltan  xwestin ku êrîşê welatê wî bikin. Serokê Bedewîyan ên ku wan jî berê alîkarîya Besasîrî kiribû lê piştre ji hêla siltan  ve hatibûn efûkirin ji siltan  xwestin ku mîrê merwanî jî wek wan bibexşîne. Lê siltan li wan nehisand û berê xwe da Diyarbekirê. Dema ku du qasidên SiltanTuxrul Beg ji cem împeretorê Rûmê vegerîyabûn li cem Nesruddewle diman. Nesruddewle jî bi sedema ku rê ne ewle bûn destûra vegerîna wan nedabû. Lê yek ji wan qasidan Ebû'l-Fazl gihabû vê qinyatê ku Nesruddewle li benda biencambûna şerê Tuxrul Beg û ereban bû û dema ereb biserketibûna dê Nesruddewle dest danîbûna ser diyarîyên ku Împeretorê Bîzansê ji Tuxrul Beg re şandibûn û bi vî awayî dê navbera xwe û Besasîrî xweş kiribûna. Ebû'l-Fazl ev fikra xwe bi nameyekê jî ji siltan re gotibû.

Nesruddewleyê Merwanî gelek diyarî ji hevsera Siltan Tuxrul Beg re şandin. Bexşandina xwe xwest û jê re nameyek şand û tê de got ku "Ez mirovekî heftê salî

[286] Hukmê Dewleta Deylemî sed û bîst û pênc salan dom kir. Berî werin Iraqê duwazdeh, piştî Iraq û derûdora wê jî sed û sêzdeh salan hukmê wan dom kir. Bnr. el-Fariqî, h.b., r.495.
[287] el-Fariqî, h.b., r.496-497.
[288] Ripper, h.b., r.94.
[289] Îbnu'l-Esîr, h.b., C.8., r.334., Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.35.

me ji tirsa ku welatê min dê ji destê min here min piştgirî da Besasîrî û sedemê girtina qasidên siltan jî ji bo qencîya wan bû.”

Nesruddewle bi her du qasidên ku li cem xwe hiştibûn digel gelek pere û dîyarîyan şandin. û Hezaesebê wekîlê siltan jî ji siltan bexşandina Nesrûdewle xwest. Lê Siltan Tuxrul Beg dîyarîyên Nesrûdewle lê vegerandin û ew efû nekir.[290]

Siltan Tuxrul Beg pêşî êrîşê Cezîretu Omer kir. Niştecihên bajêr ji bo ku wan nekujin pere dan Siltan Tuxrul wî jî ji vir berê xwe da Meyyafariqînê. Nesruddewle jî ji wir çûbû Amedê. Hingê hinek leşkerên Tuxrul Beg êrîşê gel kirin û hinekan jî êrîşî Menastireke Nesranîyan kir ku çar sed rahîb tê de bûn. Sed û bîst ji wan kuştin û yên ku man jî şeş mekûk dînar û zîv dan heta xwe ji destê wan rizgar kirin.[291] Heta ku mîrê Merwanî ji Îbrahîm Yinalê birayê siltan xwest ku bikeve navbera wî û siltan . Mîrê Merwanî Nesruddewle sed hezar dînar da siltan û wî vê carê daxwaza wî ya aşîtîyê pejirand û bi vî awayî hêzên tirkan ji welatê Merwanîyan derketin.[292]

Piştî ku navbera Siltan Tuxrul Beg û birayê wî Îbrahîm Yinal nexweş bû. Besasîrî û leşkerê erebên bedewî dîsa êrîşê Bexdayê kirin.[293]

Li ser vê Tuxrul Beg berê xwe da Bexdayê. Di rê de di navbera wî û Buweyhîyan de şer derket. Tuxrul Beg ew têk birin. Îbrahîm Yinal derket pêşîya wî lê Tuxrul Beg ew jî têk bir[294] û ber bi Bexdayê ve çû di sala 451/1060î de ket Bexdayê.[295] Besasîrî kuşt û xelîfeyê Bexdayê ji bin tehekûmê derxist. Dewleta Ebbasî dîsa bû desthilatdar û xutbe li ser navê wê hatin xwendin.[296]

### 2.4.7. Wezîrên Nesruddewle

Di seranserê desthilatdarîya Nesruddewle de sê kesan wezîrtîya wî kiriye. Wezîrê wî yê pêşî Xoce Ebû’l-Qasim bû. Jixwe hatina Nesruddewle ya li ser hukum

---

290 Îbnu’l-Cewzî, h.b., r.34-36.
291 Îbnu’l-Esîr, h.b., C.8.,r.334; Îbn’l-Cewzî, h.b., r.37-39.
292 Rîpper, h.b., r.102.
293 Ripper, h.b., r.105.
294 el-Fariqî, h.b., r.495.
295 Ripper, h.b., r.107.
296 el-Fariqî, h.b., r.496

bi saya Xoce Ebû’l-Qasim bû[297] û bêguman ne ji Ebû’l-Qasim bûna dê rêvebirîya Merwanîyan bi destê Şêro hatibûna hilweşandin.[298] Piştî mirina Xoce Ebû’l-Qasim, Ebû’l-Qasimê Mexribî û Fexruddewleyê kurê Cehîr wezîrtîya Nesrûdewle kir.

### 2.4.7.1. Xoce Ebû’l-Qasim

Berî ku Nesruddewle û leşkerên xwe ber bi Meyyafariqînê ve biçin, Xoce Ebû’l-Qasim Nesruddewle, dê û bavê wî birin cem gora Ebû Elî ji wan re got ku Ebû Elî miriye û li wir Nasrûdewle da sûndê û Ebû’l-Qasim jî sûnd xwar ku dê bi can û malê xwe di fermana Nesruddewle de be.[299]

Piştî ku Nesruddewle Meyyafariqîn û Amed jî xistin bin destê xwe jî Xoce Ebû’l-Qasim wezîrtîya wî dimeşand. Lê piştî ku Nesruddewle ji Amedê vegerîya di sala 415/1025an de Xoce Ebû’l-Qasim mir. Mirina Xoce Ebû’l-Qasim,Nesruddewle pir xemgîn kir û pir berê ket.[300]

### 2.4.7.2. Ebû’l-Qasimê Mexribî

Piştî mirina Xoce Ebû'l-Qasim, Nesruddewle Ebû'l-Qasim Huseyînê Kurê Elî kir wezîrê xwe û her tişt xist destê wî

Bavê Ebû'l-Qasimê Mexribî Ebû'l-Hesen Elîyê kurê Huseyîn berê wezîrê Xelîfe el-Hekîmbillah bû. el-Hekîm, Ebû'l-Hesen girtibû. Ebû'l-Hesen reviya çû Iraqê û ket xizmeta Buweyhîyan. Piştî ku Ebû'l-Hesenê kurê wî bûbû wezîr el-Hekîmbillah Xelîfe Ebû'l-Qasim jî girt lê çawa ku derfet dît û ji girtîgehê derket hat Meyyafariqînê li cem Nesruddewle ma. Çiqas ku Şerefudewle ji Nasrudewle xwest ku wî radestî wî bike jî lê wî ev daxwaza wan nepejirand.

[297] el-Fariqî, h.b., r.470.
[298] Yûsuf, h.b., C.1., r.181.
[299] el-Fariqî, h.b., r.470.
[300] el-Fariqî, h.b., r.485.

Wezîr Ebû'l-Qasim mirovekî aqilmend, xîretkêş û xûypak bû. Pir jêhatî bû û ji heqê her karê derdiket. Li gorî ku hatiye gotin heta niha kesekî weke wî jêhatî, zana û xwedî sîyaseteke xweş ji nava kesên ku wezîrtîya xelîfe kirine derneketiye. Herwiha têkilî û danûstendina wezîr bi gel re jî pir baş bû.[301]

Çawa ku Nesruddewle welat xweş dikir. Nav û dengê Wezîr Ebû'l-Qasim jî belav dibû. Serdema Ebû'l-Qasim jî dewreke pir xweş bû û bi temamê gel qencî dikir.

Heta sala 428/1038an wezîrtîya wî dewam kir. Piştre nexweş ket. Dema ku Ebû'l-Qasim nexweş bû ji turbedarê goristana şehîdan a Kufeyê re nameyek şand û xwest ku wî li pişta derîyê goristanê veşêrin. Di nameyê de wisa nivîsand: "Dê di nava darbesta min de hezar dînar hebin ev jî nîşaneke di navbera min û we de." Wesîyeta xwe jî bi dizî ji Evdurrahmanê kurê Nûbate re got û jê xwest ku hezar dînarî bixe darbesta wî. Berî wefat bike jî ji her derê re name şandin û di wan de wisa nivîsand: "Cêrîyeke min a gelek biqîmet wesîyet kiriye ku li Kufeyê bê definkirin. Va ez termê wê dişînim, saetekê jî nesekinînin." Piştî ku Ebû'l-Qasim mir bê ku kes zanibe termê wî di Hiskêfê û Cizîrê de derbas kirin û birin Kûfeyê. Dema gihan cem turbedar wî li nava darbestê nêrt û nîşana tê de ku hezar dînar bû dît û bi vî awayî termê wî li pişta derîyê goristana şehîdan a Cenabê Elî defin kirin.[302]

Piştî mirina Wezîrê Mexribî Nesruddewle bê wezîr mabû. Karûberên dewletê digel nazirê dîwanê Îbnî Bereke bi rê ve dibirin.[303]

### 2.4.7.3. Fexruddewleyê kurê Cehîr

Di sala 430/1039an de Nesruddewle, Ebû Nesr wezîrtî da Mihemed kurê Mihemed kurê Cehîr û hemû karên rêvebirîya dewletê xistin destê wî. Herwiha Nesruddewle bernavka "Kafîûdewle" jî dayê. Piştî ku Fexruddewle hat îca temamê pirsgirêkan diçûn ber destê wî. Wî jî têkilî û danûstandineke baş bi gel re dikir û di

[301] el-Fariqî, h.b., r.485-486.
[302] el-Fariqî, h.b., r.488.
[303] el-Fariqî, h.b., r.492.

nava gel de qencî û dadmendî belav dikir. Fexruddewle kesekî xûypak, binamûs û camêr bû. Di vê serdemê de kesekî din wek wî nebû. Mirovekî aqilmend, bitedbîr û pêşbîn û jêhatî bû. Bi wezîrtîya wî re rûmeta dewletê jî zêde bû. Lewra ji keyan re name şandin û wan jî jê re pîrozname şandin.[304]

Fexruddewleyê kurê Cehîr yek ji giregirên Mûsilê bû. Zavayê Îbn Ebî'l-Eqarib bû dilsarîyek ket navbera wan. Îbnî'l-Eqarib ji Şerefûdewle xwest ku wî ji Mûsilê derxe. Şerefûdewle jê re dihat lê Îbnî'l-Eqarib temamê pismamê xwe dan hev û got ku eger Îbnî Cehir ji Mûsilê dernekeve em ê derkevin. Li ser vê Şerefûdewle ew şand Helebê û rêverberîya wir dayê; lê Îbnî Ebî'l-Eqarib nehişt ku li wir jî bimîne û kir ku Şerefûdewle wî ji rêvebirîya wir bîne xwarê. Li ser vê Îbnî Cehir bi Qazîyê Amedê Îbnû'l-Bexil re ji Nesruddewle re xeber şand xwest ku bê li welatê wî bi cih bibe. Nesruddewle destûra wî neda û wiha got: "Tu pêdivîya me pê tune, bila li welatê me nemîne; eger xêra wî jê re hebûna dê ji welatê xwe deneketibûna. Bi vî awayî Nesruddewle demekê wisa bê wezîr mabû[305] û piştre destûr dabû Fexruddewleyê kurê Cehîr ku bê û bibe wezîrê wî. Fexruddewleyê kurê Cehîr di sala 430/1039an de dest bi wezîrtîyê kir.[306]

Yek ji tişta ku Nesruddewle dilşad dikir û piştî mirina wî zarokên wî şanaz dikir ew bû ku Wezîrê Mexribî û Wezîr Fexruddewleyê kurê Cehîr wezîrtîya wî kiribû. Lewra Wezîrê Mexribî berî Nesruddewle wezîrê xelîfeyê Misrê el-Hekîmbillah bû[307] û Îbnî Cehir jî piştî Wezîrtîya Nesruddewle bûbû wezîrê Xelîfe el-Qaîm Bîemrîllah.[308]

### 2.4.8. Mirina Nesruddewle

Nesruddewle 29ê Şewalê di sala 453/1062yan de çû ser dilovanîya Xwedê. Roja ku wefat kir 8ê Tişrînîsanî[309] bû û di Mizgefta Muhdeseyê de hat definkirin.

---

304 el-Fariqî, h.b., r.493.
305 el-Fariqî, h.b., r.492.
306 el-Fariqî, h.b., r.493.
307 Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.110.
308 el-Fariqî, h.b., r.507; Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.110.
309 تشرين الثاني/Çiriya Paşî/Mijdar.

Piştî ku Nesruddewle wefat kir Fexruddewle wezîr bû. Karûberên dewletê birêkûpêk kirin û bi sîyaseteke xweş kar meşandin. Navê kurê Nesruddewle yê mezin Ebû'l-Hesen bû, li Amedê dima û berî bavê xwe wefat kiribû, yê din Mîr Nîzamedîn bû û yê biçûkê wî Mîr Seîd bû. Nesruddewle ji bo mîrîtîyê Kurê xwe Mîr Nîzameddîn tayîn kiribû.[310]

Piştî mirina Nasrûdewle mirovek ji hevalekî wî dipirse: "Desthilatdarîya Nasrudewle çend salan dom kir? Li gorî min bihîstî pêncî û sê salan dom kir, rast e?" Hevalê Nesruddewle wiha bersiv dayê: "Çima tu nabêjî sed û şeş! Ji ber ku şevên wî ji rojên wî xweştir bûn."[311] Îbnu'l-Ezreq dibêje Nasrûdewle Ehmedê kurê Merwan heştê sal jiya û pencî û du salan mîrîtî kiriye.[312] Nasir Xusrew dibêje dema ez çûm Meyyafariqînê ji min re gotin ku Nasrûdewle Ehmedê kurê Merwan sed salî ye.[313] Lê Nasir Xusrew di sala 438/1046an de çûye Meyyafariqînê[314] û li gorî dîroka ku Îbnu'l-Ezreq dide ev beranberî berî mirina wî bi pazdeh salan dike û ji ber ku Îbnu'l-Ezreq dibêje heştê sal jîyaye naxwe li gorî agahîya Îbnu'l-Ezreq dema Nasir Xusrew çûye cemê ne sed salî şêşt û pêncî salî bûye.

### 2.5. Serdema Mîr Nîzameddîn (453/1062-472/1080)

Berî ku Nesruddewle bimire wî kurê  xwe Nîzameddîn Ebû'l-Qasim ji bo mîrîtîyê tayîn kiribû.[315] Ji ber ku ev kurê wî mirovekî aqilmend, zana, pêşbîn û jêhatî bû. Di sala 453/1062yan de di serê meha Zîlqadeyê[316] de desthilatdarîya Mîr Nîzameddîn dest pê kir.[317] Dema Mîr Nesruddewle mir wezîr jî li cem bû. Wezîr fermandarê artêşê şan pey Mîr Nîzameddîn û ew bire qesrê û rêvebirî dayê. Qadî, zana, giregirên bajêr hatin, silav danê û jê re rêz girt. Di heman demê de gel jî li wir

---

[310] el-Fariqî, h.b., r.505.
[311] el-Fariqî, h.b., r.502.
[312] Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.109.
[313] Nasir Xusrew, *Sefername*, (Amd. Muhemmed Debîr Siyaki), Kitabfiruşiyê Zevar, Tehran 1335/1956, r.8.
[314] Beysanoğlu, h.b., C.1., r.206.
[315] el-Fariqî, h.b., r.505.
[316] Berfanbar, meha 12an a mîladî. http:// www.i-takvim.com/takvimler/hicri_takvim_ceviri.php.(11/06/2016)
[317] el-Fariqî, h.b., r.506.

amade bû. Piştî ku Nîzameddîn bû mîr ne ji birayên wî, ne ji kurapên wî û ne ji leşker û ne jî ji gel kesek li dijî mîrîtîya wî derneket.[318]

Mîr Nîzameddîn dadmend, baş û dirist bû. Gelek qencîyên wî digihan xelkê û bi xwe diçû li rewşa gel dipirsî.[319]

### 2.5.1. Êrîşa Salarê Xorasan a Meyyafariqînê

Fermanderê bi navê Salarê Xorasan ku Siltan Tuxrul Beg ew di sala 458/1067an de di meha Rebiûlewwelê de şandibû Diyarbekirê hate ber Meyyafariqînê. Pênc hezar siwarî di bin fermandarîya wî de bûn. Pêşî li derveyê bajêr dest bi êrîş û talanê kir û piştre li ber derîyê Hewayê baregeha xwe danî.

Wezîrê Nîzameddîn [320] bi Salarê Xorasan re ket nava têkilîyê. Ji bo ku vegere teklîfa dayîna sê sed hezar dînarî lê kir û wezîr ji bo vê, jê re sûnd jî xwar û kurê Mîr Nîzameddîn Mîr Hesen jî wek rehîn radestî wî kir. Li ser vê Salarê Xorasan artêşa xwe li derve hişt û digel hinek leşkerên xwe hat ku bikeve nava bajêr. Lê dema kir ku di derîyê bajêr re derbas bibe hinek tirs û guman jê re çê bûn û xwest vegere. Wezîrê Mîr Nîzameddîn bi vê dudilîya Salarê Xorasan hesiya, du birayên Mîr Nîzameddîn Mîr Fedlun û Mîr Namik jî wek rehîne şandin baregeha Salarê Xorasan. Li ser vê Salarê Xorasan digel çend leşkerên xwe derbasî hundir bûn.

Mîr Nîzameddîn bi wezîrê xwe re şêwirî. Wezîr pêşnîyaza girtina Salarê Xorasan kir. Mîr Nîzameddîn pêşî ev pêşnîyaza wezîrê xwe nepejirand, lewra birayên wî di destê wan de bûn. Li ser vê, Wezîr ji Mîr Nîzameddîn re wiha got: “Birayên te jixwe neyarên te ne û tu wan didî bi Diyarbekir û hemû welat.” Dîsa Mîr Nîzameddîn nedixwest wisa bike û xwest pereyên ku dixwazin bide û wan vegerîne; lê wezîr îtîraz kir û wisa got: “Tu îro wan pereyan bidî sibe yekî din, roja din yekî din dê were û ku rê li ber vî tiştî vebe tu êdî nikarî vî derîyî bigirî.” Li ser gotinên wezîr mîr bîryara girtina Salarê Xorosan da. Piştî ku Salarê Xorosan hat girtin leşkerê Meyyafariqînê êrîşî baregeha wî kir. Hinek kuştin, hinek girtin û cihê wan talan û

318 el-Fariqî, h.b., r.504.
319 el-Fariqî, h.b., r.516.
320 Hingê wezîrê Mîr Nîzameddîn Ebû’l-Fazl Îbrahîm el-Enbarî bû. Bnr.Tufantoz, h.b., r.108.

wêran kir. Li ser vê leşkerê Salarê Xorosan jî du birayên Mîr Nîzameddîn kuştin û yek ji wan jî bi dûvê hespekî ve girêdan û berdan ew jî birîndar bû.[321] Alî Sevîm dibêje Mîr Nîzameddîn, Salarê Xorasan û hevalên wî kuştin. Termê wan jî avêtin bîrekê. Ew bîr bi navê Bîra Salarê Horosan tê naskirin.[322] Lê li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq li cihekî bi navê Siyûtî koncal hatin kolan û li vir hatin binaxkirin ku navê vê derê Şerê Salarê Xorosan e.[323]

### 2.5.2. Mîr Seîd û Têkoşîna ji bo Desthilatdarîyê

Kurê Nesruddewle yê ji Mîr Nîzameddîn biçûktir jî Mîr Seîd bû.[324] Mîr Nîzameddîn piştî mirina bavê xwe heta demekê mîrîtîya xwe bi aramî domand lê piştre dubendî ket navbera wî û birayê wî Seîd.[325]

Seîd çû ji SiltanTuxrul Beg re rewşa xwe got û alîkarî jê xwest. Tuxrul Beg fermandarekî xwe digel pênc sed siwarî bi Mîr Seîd re şand. Mîr Seîd ev leşker bi xwe re anîn û di sala 455/1064an de hatin ber derîyê Meyyafariqînê û dest bi êrîşê kir. [326]

Wezîr Fexruddewleyê kurê Cehîr ji sûran hat xwarê û bi Seîd re axivî. Hem soza pere û desthilatdarîyê û hinek cihan dayê û hem jî ew tirsand û wisa jê re got: "Bila hilweşîna vê malbatê ne bi destê te pêk were." Bi vî awayî her du bira li hev anîn pêncî hezar dînar jî da fermandarê ku Tuxrul Beg ew şandibû.[327]

Bi saya sîyaseta Nesruddewle ku gelek caran bi dayîna pereyan berê êrîşên li xwe vedigerandin û herwiha bi saya zanebûna Îbnî Cehir rêvebirîya Merwanîyan ji vê êrîşê hat parastin.

Piştî du salên din dîsa nexweşî ket navbera Mîr Nîzameddîn û birayê wî Seîd. Îbnî Ezreq Bûyerên ku di navbera wan de qewimîn wiha neqil dike: Di sala

---

[321] el-Fariqî, h.b., r.507-508.
[322] Sevim, h.b., r.43.
[323] el-Fariqî, h.b., r.508.
[324] el-Fariqî, h.b., r.506.
[325] el-Fariqî, h.b., r.506; Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.110.
[326] el-Fariqî, h.b., r.506.
[327] el-Fariqî, h.b., r.506; Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.102.

460/1069an de dîsa dubendî di navbera Mîr Nîzameddîn û birayê wî de çê bû. Seîd ji Meyyafariqînê derket û çû cem siltan . Vê carê Nîzamulmilk çû Meyyafariqînê cem Mîr Nîzameddîn. Nîzamulmilk rewşa birayê xwe Seîd û axaftina ku di navbera wî û siltan de çê bûye ji Nîzameddîn re got. Mîr Nîzameddîn ji bo ku ji siltan re bişîne gelek diyarî û pere amade kirin; lê Nîzamulmilk jê re wisa got: "Tu bi ya min bikî tu jî were cem siltan tu dê ji wir memnûn vegerî." [328]

Mîr Nîzameddîn roja din gelek dîyarî û pere amade kirin ku herin cem siltan . Hevser û xwişka Mîr Nîzameddîn hatin cem Xoce Nîzamulmilk xwe avêtin tor û bextê wî. Li ser vê Xoce Nîzamulmilk jî ji wan re wiha got: "Wellahî ez wî wek mîr ji we distînim lêbelê ez ê wî wek siltan li we vegerînim."Paşî çûn cem siltan . Siltan eleqeyeke baş nîşanî Mîr Nîzameddîn da. Nîzamedîn jî rêz li siltan girt û diyarî pêşkêşî wî kirin. Siltan Tuxrul eleqeyeke baş nîşanî Mîr Nîzamedîn dabû lê xuyaye ku hêja Nîzameddîn nehatî siltan soz dabû Mîr Seîd ku desthilatdarîya Merwanîyan bidiyê. Çiqas Xoce Nîzamulmilk ji siltan re qala soza ku dabû malbata Nîzameddîn kir jî lê siltan qanî nebû. Siltan Alparslan ji bo tevgera Mîr Nîzameddîn a bi Salarê Xorosan re jî Mîr Nîzameddîn hêrs bûbû û dixwest birayê wî Mîr Seîd bîne ser rêvebirîyê.[329] Îca Xoce Nîzamulmilk ji siltan re wiha got: Madem te sûnd xwariye, here nêçîrê û vî karîji min re bihêle."[330]

Piştî ku siltan diçe Nêçîrê Xoce Nîzamulmilk Seîd digire û destê wî zincîr dike û dişîne keleha Hetaxê. Xoce Nîzamulmilk ji Mîr Nîzameddîn re jî wisa got: "Min soz dabû malbata te ku te bikim siltan û li wan vegerînim; lêbelê siltanekî me heye. Bila tu jî siltanê mîran bî.[331]

Mîr Seîd li kelha Hetaxê girtî bû. Xeber ji Mîr Nîzameddîn re şand û gilî û gazindên xwe jê re gotin û hêvîya qenciyê jê kir. Wezîr ji Mîr Nîzameddîn xwest ku wî ji wir derxe û rêvebirîya Amedê bidiyê. Li ser vê tewsîyeya wezîr, Mîr Nîzameddîn birayê xwe Seîd ji Hetaxê anî cem xwe. Dema du bira hatin cem hev her du girîn. Mîr Nîzameddîn û Seîd çend rojan li cem hev man û di heman odeyê de bûn. Rojekê, ber sibehê her du razayî bûn. Xulamê Seîd hat ew ji xewê şiyar kir û jê

---

[328] el-Fariqî, h.b., r.509.
[329] Mustafa Alican, Selçuklu Mervani İlişkileri, Turkısh Studies, C.8., Ankara 2013, r.9.
[330] el-Fariqî, h.b., r.510.
[331] el-Fariqî, h.b., r.511.

re wiha got: “Binêrê va ye birayê te Nîzameddîn razaye û va ye şûrê te jî li vir e. Wî bikuje û vî welatî tevî bixe destê xwe.” Lê Seîd li ser vê gotinê hêrs bû û ji xulamê xwe re wiha got: “Ya Ferûx! Heyf li te ku tu wisa dibêjî. Çawa Nîzameddîn kurê cêrîyeyekê ye û bi min re bi dilsozî tevbigere lê ez kurê Fedlûneyê[332] bim û xîyanetê lê bikim.”[333]

Mîr Seîd û birayê xwe Mîr Nezmedîn xatir ji hev xwestin û Mîr Seîd çû Amedê û rêvebirîya wir xist destê xwe.[334] Piştî demekê Mîr Nîzameddîn poşman bû ku Amed daye Seîd. Mîr Nîzameddîn cêrîyeyeke xwe şand cem Mîr Seîd. Destmalek dabû vê cêrîyeyê û şîret lê kiribûn ku piştî bi hev re raketin vê desmalê bide Mîr Seîd. Cêrîyê tişta ku Mîr Nîzameddîn jê re gotibû pejirand.[335]

Xuyaye ku Îbnu’l-Ezreq li vir mijar kin biriye û mirov ji rêzikên wî aqîbeta Mîr Nîzameddîn fam nake lê Îbnî Cewzî dibêje ev mendîl bi jehr bû û piştî Mîr Seîd û ev cêrî bi hev re radizên, cêrî bi vê desmalka bijehr Mîr Seîd paqij dike wî dikuje.[336]

### 2.5.3. Rola Kurdên Merwanî Di Şerê Melazgirdê De

Piştî ku di sala 455/1064an de Tuxrul Beg li Esfahanê mir birazîyê wî Alparslan Mihemedê kurê Dawid ket cihê wî. Roja ku Tuxrul Beg mir Alparslan çû Bexdayê cem Xelîfe el-Qaîm Biemrîllah û Xelîfê, siltantîya wî pejirand. Bi vî awayî Alparslan ketibû cihê apê xwe û welatê xistibû bin desthilatdarîya xwe.

Di sala 463/1071ê de qralê Rûmê ji Qostantînîyeyê derket û ber bi Melazgirdê[337] ve hat. Dema Alparslan bi hatina qral hesiya ji Iraqê hat Diyarbekirê.[338] Xuyaye li ser hatina Alparslan a Diyarbekirê yan jî sebebeke din Qralê Rûmê vegerîyaye û li gorî neqla Îbnu’l-Ezreq girseyeke ji gelê Melazgirdê tên

[332] Jina Nesruddewle û keça Hikumdarê Ermenîstanê ye. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.481.
[333]el-Fariqî, h.b., r.512; Îbnu’l-Cewzî, h.b., r.180.
[334] Şerefxanê Bedlîdî, h.b., r.110.
[335] el-Fariqî, h.b., r.512.
[336] Îbnu’l-Cewzî, h.b., r.181.
[337] Bi erebî مناازجرد/ Menazcird hatiye nivîsandin. Ji ber ku di elfabeya erebî de tîpa “g”yê tuneye bi tîpa” ج/c”yê hatiye nivîsandin.
[338]el-Fariqî, h.b., r.510.

cem Siltan Alparslan û agahîya ku qralê Rûmê dîsa êrîşê welatê wan kiriye didinê û li ser vê Alparslan careke din di ser Erzen û Bedlîsê de tê Xelatê.

Bi keyê Rûmê re girseyeke mezin hebû.[339] Îbnu'l-Cewzî bi berfirehî qala techîzat û hejmara artêşa her du alîyan dike. Li gorî Îbnu'l-Cewzî berî şer deh hezar kurd hatin ligel siltan cih girtin û ji bîlî van çar hezar kes arteşa xas hebûn. Di artêşa Împeretorê Bîzansê de gelek peywirdar, fermandar û amûrên şer hebûn[340] û artêşa wan ji sê sed hezar leşker pêk dihat.[341] Di vî şerî de ji mîrnişîna Merwanîyan gelek kes bi dildarî di artêşa siltan de cih girtibûn ku Mchael Psellos bi sedemê vê pirbûna kurdan siltan wek qralê pers û kurdan bi nav kiriye.[342]

Di Tebaxa sala 463/1071ê de Siltan Alparslan di ser Xelatê, Ercîş û Manazgirtê de xwe gihande Meyyafariqînê. Nasirê Kurê Merwan jê tirsiya û hat hizûra wî. Siltan pir qedr û qîmet dayê û ji bo artêşa xwe sed hezar dînar jê xwest. Nasir ji gel gelek pere berhev kirin û ji siltan re şandin lê ji ber ku Nîzameddîn ev pere ji cotkaran berhev kiribûn siltan ev pereyên wî qebûl nekirin. Li ser vê Nîzameddîn, ji pereyên xwe hinek jê re şandin.[343] Beri şerê Melazgirdê Nîzamulmilk jî hat Sîlvanê û hem Mîr Nîzameddîn hem Mîr Seîd dît û piştî vê hevdîtinê Merwanî bûn tebiê Selçûqîyan.[344]

Siltan Alparslan berî şer 17ê Tebaxê qasidekî xwe yê bi navê Îbnû'l-Muhelleban şand cem qralê Rûmê û daxwaza aşîtîyê jê kir; lêbelê Qral ev teklîf nepejirand. Lewra tirkan welatê filehan gelekî wêran kiribû û niha derfeta heyfhilanînê ketibû destê filehan. Qral ji bo vî şerî pereyekî pir tedarik kiribû ku pereyekî din wisa careke din, di demeke kin berhev nedibû.[345] Îbnu'l-Ezreq axaftinên ku di navbera qralê Rûmê û Îbnu'l-Muhelleban de derbas dibin wiha neqil dike: Îbnû'l Muhelleban ji cem siltan çû cem Qralê Rûmê. Qral rewşa welatê wî jê pirsî.

---

[339]el-Fariqî, h.b., r.511.
[340] Sibt Îbnu'l-Cevzî, *Miratu'z-Zeman fi Tarihu'l-Ayan'da Selçuklular,* (Wer. Ali Sevim), Türk Dil Kurumu, Ankara 2011, r.170.,
[341] el-Fariqî, h.b., r.511; Îbnu'l-Cewzî, h.b.,170.
[342] Bnr. Michael Psellus, Weş:1992, r.104 Vgh.Bekir Biçer, *Selçuklular ve Kürtler*, r.191.
[343] Îbn'l-Cewzî, h.b., r.166.
[344] Biçer, *Kürtler*, r.119.
[345] Claude Cahen, "İslam Kaynaklarına Göre Malazgirt Savaşı", (Wer. Zeynep Kerman) Ev gotar di MecmuayaByzantion de hatiye weşandin, C.9., r.613.

*Qralê Rûmê*: Esfehan xweş e yan Hemedan?

*Îbnû'l Muhelleban*: Esfehan xweştir e.

*Qralê Rûmê*: Wek ez dizanim Hemedan pir serma ye.

*Îbnû'l Muhelleban*: Rast e.

*Qralê Rûmê*: Naxwe em vê zivistanê li Esfexanê bin û bila heywanên me li Hemedanê bin.

*Îbnû'l Muhelleban*: Heywanên we dê zivistanê li Hemedanê bin; lê ez nizanim hûn ê li ku bin (!)

Piştî vegerandina Qasidê Siltan Alparslan êdî her du alîyan xwe ji bo şer amade kir.[346]

Şer zû dest pê nekir. Li gorî Îbnu'l-Ezreq ji ber ku leşkerê Siltan Alparslan hindik bûn wî şer taloq kir. Wî dixwest şer roja înê dema ku xetîb li ser minberan bin pêk were. Ji ber ku wê saetê ji bo artêşên Îslamê dia dihatin kirin û dibe ku Xweda van diayan qebûl bike. Siltan berê xwe da leşker û wiha got: “Kesên ku bi min re bin bila werin û yên ku bixwazin vegerin jî dikarin vegerin. Îro ez li vir ne siltanek im ez jî yek ji we me û em misilman dixwazin xezayê bikin”. Li ser vê leşkeran jî got: “Ya siltan em jî milkê te ne û tu çi bikî em bi te re ne.”[347] Şerê di navbera wan de di sala 463/1071ê dest pê kir û Siltan Alparslan Qralê Rûmê têk bir û dîl girt û lê paşê ew serbest berda.[348]

Artêşa misilmanan bi ser ket gelek leşker ji artêşa Rûmê hatin kuştin û misilmanan malên wan wek xenîmet stendin. Ewqas xenîmet pir bû ku zêr û zîv bi elban dihatin parvekirin. Gelê Xelat û Melazgirdê hingê ew çend xenîmet bi dest xistin ku dewlemendîya wan heta îro jî didome.[349]

---

[346] el-Fariqî, h.b., r.511.
[347] Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.170.
[348] el-Fariqî, h.b., r.513.
[349]el-Fariqî, h.b., r.511.

Em dibînin di vî şerî de roleke kurdan a girîng heye. Îbnu’l-Ezreq qala deh hezar leşkerên kurd ku di artêşa Siltan Tuxrul Beg de cih girtiye nake. Ev hejmar di berhema Îbnû’l-Cewzî de derbas dibe[350] lê hinek dîroknasên tirk dema ev agahî ji Îbnu’l-Cewzî neqilkirine qala kurdan nekirine, tenê gotine: “Deh hezar siwarî ji herêmên cûda tevlî artêşa Tuxrul Beg bûn.”[351] Mukremin Halil jî dibêje li cem siltan çil hezar siwarên bijarte hebûn û deh hezar kes jî bi dildarî tevlî wan bûbûn ev deh hezar ji eşîrên kurdan ên welatê Merwanîyan bûn.[352]Li gorî Salabî jî Siltan Alparslan deh hezar siwarîyên kurd kom kirin û jixwe kurd di şeran de bi mêranî û wêrektîya siwarên xwe dihatin naskirin.[353]

Piştî şerê Melazgirdê herêma Merwanîyan ket bin desthilatdarîya tirkên Selçûqî. Selçûqîyan ji bo li dijî dijminên derve bi desthilatdarîyên herêmî reyekîtîya xwe saz bikin têkilîyên xwe bi van rêvebirîyan re xerab nekirin û ji desthilatdarîya wan a herêmî re nebûn asteng.[354] Lêbelê Selçûqîyan li hemberî vê fedakarîya kurdan ew teqdîr jî nekirin. Lewra piştî vî şerî bajarên kurdan bi talan û wêrankirinê re rûbirû man.[355] Li gorî neqla Îbnu’l-Ezreq bandora herî mezin a vî şerî li ser kurdan ew bû ku piştî vî şerî Xelat û Melazgird ji destê Merwanîyan derketin. Lewra piştî ku Siltan Alparslan ev der stendin her cihekî ji van walîyekî xwe lê tayîn kir.[356]

### 2.5.4. Wezîrên Nîzameddîn

Di seranserê mîrîtîya Mîr Nîzameddîn de sê kesan wezîrtîya wî kiriye. Wezîrê wî yê pêşî Fexruddewleyê kurê Cehîr bû ku wezîrtîya bavê wî jî kiribû û piştî Fexrûdwleyê kurê Cehîr, Îbrahîmê kurê Enbarî û Ebû Tahir Selame wezîrtîya wî kir.

---

350 Îbnu’l-Cewzî, h.b.,170.
351 Sevim, h.b., r.58.
352 Mükremin Halil, Selçuklular Devri, r.65. vgh. Biçer, Kürtler, r.163.
353 Ali M. Sallabî, Devleti Selaçika, r.383. vgh. Biçer, Kürtler, r.163.
354 Altan Tan, *Turabidin’den Berriye’ye,* Nûbihar, Stenbol 2015, r.62.
355 Adnan Demircan&Mehmet Akbaş, *Kürtler Tarih*, Fevzi Yunus Fettah, (Wer.Mehmet Akbaş), Nida, İstanbul 2015, r.144.
356 el-Fariqî, h.b., r.512.

#### 2.5.4.1. Fexruddewleyê kurê Cehîr

Wezîrê Mîr Nîzameddîn ê pêşî Fexruddewleyê kurê Cehîr bû. Fexruddewle, wezîrê Nesruddewleyê Bavê Mîr Nîzameddîn bû. Piştî ku wezirê Mexribî Ebû'l-Qasim mir Fexruddewleyê kurê Cehîr di sala 430/1039an de bû wezîrê Nasrudewle[357] û piştî ku Nesruddewle mir wezîrtîya Nîzameddîn kir.[358]

Karê pêşî yê ku wezîr Fexruddewle kir ew bû ku piştî mirina Nesruddewle nehişt rêvebirîya dewletê xerab bibe û hewl da ku Mîr Nîzameddîn hat ser hikumdarîyê.[359]

Di sala 455/1064an de dema Mîr Seîdê birayê Mîr Nîzameddîn bi fermandarekî Tuxrul Beg û pênc hezar siwarîyan avêt ser Meyyafariqînê, Fexruddewle bi zanebûn û sîyaseta xwe Mîr Seîd û fermandarê pê re qanî kirin û Meyyafariqîn ji vê xetereyê parast.[360]

Wezîrtîya Îbnî Cehir heta sala 455/1064an dom kir. xelîfeyê Bexdayê xeber ji Mîr Nîzameddîn re şand û xwest ku ji bo bibe wezîrê wî Fexrûdwle jê re bişîne. Nîzameddîn, Fexrûdewlwe digel gelek diyarîyan şand cem xelîfe Bîemrîllah[361] û bi vî awayî Fexruddewleyê kurê Cehîr dest bî wezîrtîya Bexdayê kir.[362]

Li gorî Îbnû'l Cewzî, siltanê Selçûqî û wezîrê wî Nîzamulmilk ji bo pergala rêvebirîya xelîfeyê Ebbasî xerab bike û xelîfe ji Bexdayê derxe Fexruddewle şandibûn. Lê siltan û Nîzamulmilk mirin û ev plana wan pêk nehat.[363]

---

[357] el-Fariqî, h.b., r.493.
[358] Îbnî Xeliqan, C.5., r.127.
[359] el-Fariqî, h.b., r.505.
[360] el-Fariqî, h.b., r.506.
[361] el-Fariqî, h.b., r.507.
[362] el-Fariqî, h.b., r.507; Îbnî Xeliqan, h.b, C.1., r.178; Îbnu'l-Esîr , h.b., C.8., r.358.
[363] Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.255.

#### 2.5.4.2. El-Ecel Ebû'l-Fadl Îbrahîmê Kurê Enbarî

Piştî Îbnî Cehîr, el-Ecel Ebû'l-Fadl Îbrahîmê kurê Enbarî bû wezîrê Mîr Nîzmeddîn. El-Ecel berê di dewleta Fexruddewle Qerwaş de nazir bû. Piştre hat Meyyafariqînê cem Mîr Nîzameddîn û piştî ku Fexruddewle bû wezîrê xelîfe, Mîr Nîzameddîn ew kir wezîrê xwe û karûberên rêvebirîya dewletê xist destê wî. El-Ecel mirovekî zana û biaqil bû.[364]

Di sala 458/1067an de Salarê Xorosan bi pênc hezar siwaran avêtibû ser Meyyafariqînê û ev êrîşa Salarê Xorosan bi saya tedbîr û sîyaseta wezîr el-Ecel berteref bû.[365]

#### 2.5.4.3. Ebû Tahir Selame

Di sala 458/1067an de Wezîr Îbrahîm mir û piştî wî kurê wî Ebû Tahir Selame bû wezîr. Dema Ebû Tahir Selame bû wezîr gelekan ji mîr re gotin: "Ancax mirovên xwedî tecrube û pîr karin bibin wezîr." Lê ji wan re got: "Hûn ê bibînin bê mirovekî çawa ye."Paşê Mîr Nîzameddîn bernavka "el-Kafî" dayê û wezîr, dewlet bi sîstemeke gelekî baş bi rê ve bir û têkilîyeke baş bi gel re danî.[366]

### 2.5.6. Mirina Mîr Nîzameddîn

Mîrîtîya Nîzameddîn duwazdeh salan[367] dom kir û di sala 472/1080yî di meha Zilhîceyê[368] de mir.

Piştî ku Mîr Nîzameddîn mir Wezîr Ebû Tahir Selame rêvebirîya dewletê xist destê xwe. Kurê Mîr Nîzameddîn ê mezin Nesruddewle Ebû'l-Muzaffer Mensûr anî cem xwe.[369]

---

[364] el-Fariqî, h.b., r.507.
[365] el-Fariqî, h.b., r.508.
[366] el-Fariqî, h.b., r.509; Îbnu'l-Cewzî, h.b.r.232.
[367] Di vir de gotiye mîrîtîya wî diwazdeh salan dom kir lê li gorî ku di sala 453/1062yan de hatiye ser rêvebirîyê mîrîtîya wî neh salan dom kiriye. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.505., el-Xûlî&Baluken, h.b., Jêrenot: 3, r.516.
[368] Gulan/Heziran Bnr.http:// www.i-takvim.com/takvimler/hicri_takvim_ceviri.php. (11/06/2016)

## 2.6. Serdema Nasiruddewle Mensûr (472/1080-478/1086)

Piştî di ser mirina Mîr Nîzameddîn re çar roj derbas bûn di sala 472/1080yî de Nasiruddewle Mensûr derket ser textê mîrîtîyê. Ap û kurapên wî, kesên malbata wî û kesên di rêvebirîya dewletê de hatin. Mirîtîya wî pejirandin û silav danê û rêz û hurmeta xwe nîşanî wî dan û bi vî awayî Nasiruddewle Mensûr bû mîr.[370]

Mîrîtîya Nasiruddewle Mensûr heta sala 478/1087an[371] dom kir. Lewra di vê salê de wezîrê Selçûqî Fexruddewleyê kurê Cehîr ket nava Meyyafariqînê û dest danî ser pere û xezîneyên Merwanîyan.[372] Bi vî awayî dawî li desthilatdarîya Nasiruddewle Mensûr hat. Di sala 486/1094an de Nasiruddewle Mensûr dîsa derfet dît hat ser hikûm; lê desthilatdarîya wî pir dom nekir û piştî pênc mehan mîrîtîya wî bidawî bû.[373]

Îbnu'l-Ezreq bêtir bi başî qala mîrên Merwanîyan dike. Lê dema tê behsa Nasiruddewle Mensûr Îbnu'l-Ezreq wî gelekî rexne dike û wiha dibêje: "Nasiruddewle Mensûr mirovekî wisa nezan û bêtedbîr bû ku kar û tevgerên ku wî dikirin zarokan jî nedikir. Li ber siltanan û hevalên xwe bêrûmetî dikir û tu caran guhê xwe nedida gotinên hevalên xwe."[374]

### 2.6.1. Wezîrên Nasiruddewle Mensûr

Dema Mîr Nîzameddînê bavê Nasiruddewle Mensûr mir, wezîrê wî Ebû Tahir Selameyê kurê Enbarî bû. Piştre Ebû Salimê fileh, bû wezîr. Dema ku Nasiruddewle Mensûr ji bo demeke kin hate ser textê mîrîtîyê jî Îbnî Esed wezîrtîya wî kir.

---

369 el-Fariqî, h.b., r.516.
370 el-Fariqî, h.b., r.516.
371 Li gorî rîwayeteke din ku Fariqî neql dike ev bûyer di sala 479an de pêk hatiye. Lê dîsa ew bi xwe jî dibêje ku rîwayeta yekem rasttir e. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.521.
372 el-Fariqî, h.b., r.521.
373 Îbnî Şeddad, *el-Alaq el-Xetîre fî Zikrî Ûmeraû'ş-Şam we'l-Cezîre*, Wezaratû's-Seqafîyye'l-Murşadû'l-Qewmî, (Thq. Yahya Îbare, Dimeşq),1978, r.404,el-Fariqî, h.b., r.530.
374 el-Fariqî, h.b., r.521.

#### 2.6.1.1. Ebû Tahir Selameyê Kurê Enbar

"Piştî ku Nasiruddewle Mensûr bû mîr jî wezîrtîya Ebû Tahir dewam kir. Ebû Tahir karûberên dewletê xweşik bi rê ve d birin û sîyaseteke pir baş dimeşand lê piştî ku Ebû Salim hat cem Mîr Nasiruddewle Ebû Tahir xist girtîgehê û Ebû Salim bû wezîrê xwe.[375]

#### 2.6.1.2. Ebû Salim

Ebû salim hekîmekî fileh bû û li Sûka etaran dikana wî hebû. Ebû Salim hat cem Nasiruddewle Mensûr û ket bin fermana wî. Hevsera Ebû Salim jî li cem Sitînasa hevsera Mîr Nasiruddewle Mensûr dima. Her ku diçû diçû dereceya Ebû Salim li cem mîr zêde dibû heta hate wê aste ku mîr wezîrê xwe Ebû Tahir Enbarî xist girtîgehê û karê rêvebirîya dewletê hemû xist destê xwe û bi vî awayî dewlet ket bin bandora Ebû Salim û hevsera wî.[376]

Di dema dorpêçkirina Meyyafariqînê de Nasiruddewle rêvebirî bi temamî ji Ebû Salim re hiştibû û ji bajêr derketibû.[377] Siltan bi nameyekê teklîfa parvekirina bajarên Merwanîyan li Mîr Nesruddewle Mensûr kir. Lê Ebû Salim nehişt ku mîr vê teklîfê bipejirîne. Bi vî awayî jî welat hemû ji destê Nesruddewle Mensûr derketibû.[378] Jixwe gelek dîroknas hemfikir in ku di hilweşandina Merwanîyan de bandora sîyesata nebaş a Ebû Salim heye.[379] Herwiha dema Îbnu'l-Ezreq qala hilweşandina mîrnişîna Merwanîyan dike û dibeje: "Ez bi temenê xwe sûnd dixwim ku ew kesê Ebû Salim şêwirmendê wî û karmendekî dewleta wî be dawîya wî malxirabbûn û dawîya dewleta wî jî hilweşandin e.[380]" Lê Evdurreqîb Yusuf dibêje: "Dibe ku Îbnu'l-Ezreq di rexnekirina Ebû Salim de hinekî teasûba olî kiribe, ji ber ku Ebû Salim fileh bû; lêbelê dema em li sîyaseta ku Ebû Salim dimeşand dinêrin

[375] el-Fariqî, h.b., r.518.
[376] el-Fariqî, h.b., r.518.
[377] el-Fariqî, h.b., r.528.
[378] el-Fariqî, h.b., r.520.
[379] el-Fariqî, h.b., r.519-520; Ripper, h.b., r.271; Tufantoz, h.b., r.114.
[380] el-Fariqî, h.b., r.520.

Îbnu'l-Ezreq di rexnekirina xwe de mafdar e. Lewra dema Selçûqîyan êrîşî welatê Merwanîyan kir û siltanê Selçûqî teklîfa parvekirina welêt li Mîr Nasiruddewle Mensûr kir Ebû Salim ji mîr re got ku em dikarin bîst salan jî li ber xwe bidin û li ser vê nameya wî Mîr Nesruddewle Mensûr ev teklîfa siltan red kir."[381]

Wezîrtîya Ebû Salim dewam kir heta ku Fexruddewle ket nava Meyyafariqînê. Piştî ku Fexruddewle ket nava Meyyafarqînê Ebû Salim xist girtîgehê.[382]

#### 2.6.1.3. Îbnî Esed

Îbnî Esed mirovekî helbestvan bû û li Meyyafariqînê dima. Piştî ku Amed û Meyyafariqîn ket destê Walîyê Selçûqî Fexruddewle Îbnî Cehîr, Nasûrudewle Mensûr çûbû Herbeyê û piştî mirina siltanê Selçûqî Melikşah çûbû Cîzîrê.[383] Dema mîr rewşa Meyyafariqînê hîn bû bi Îbnî Esed re ket têkilîyê û di sala 486/1094an de bi alîkarîya Îbnî Esed hat Meyyafariqînê û li ser textê mîrîtîyê rûnişt. Nasiruddewle Mensûr bernavka "Muhyîdewle[384]" da Îbnî Esed û ew kir wezîrê xwe.[385]

"Piştî ku Tacûdewleyê siltanê Selçûqî, Meyyafariqîn stend Îbnî Esed revîyabû û xwe veşartibû. Piştre rojekê dema siltan li Herranê bû çû cemê û bi helbesteke xweş pesnê wî da. Siltan helbesta wî pir eciband. Lê yekî ji civatê ji siltan re got ku ev ew kesê ku li benda te nema, kesên nezan û eware li derûdora xwe civandin û gazî mîrê Merwanî kir û Meyyafariqîn radestî wî kir. Li ser vê siltan fermana kuştina wî da û di sala 487/1095an de Îbnî Esed hat kuştin."[386]

[381] Yûsuf, h.b., C.2.,r.80.
[382] el-Fariqî, h.b., r.521.
[383] el-Fariqî, h.b., r.528-529.
[384] Kesê ku bi saya wî dewlet ava bûye, vejîyaye.
[385] el-Fariqî, h.b., r.530.
[386] Îbnî Şeddad, h.b., r.399; el-Fariqî, h.b., r.531.

### 2.6.2. Hilweşîna Mîrnişîna Merwanîyan

Desthilatdarîya Malbata Merwanîyan bi Ebû Elîyê kurê Merwan dest pê kiribû û dema Fexruddewle Nasirê kurê Cehîr welatê wan stend ev desthilatdarîya wan bi dawî bû. Ku em pênc mehê ku Nasiruddewle Mensûr paşê hat ser hikum jî hesêb bikin desthilatdarîya malbata Merwanîyan sed salî dom kir[387]

Bi taybetî di dema Nesruddewle de sîyaseteke aştîyanê hatibû meşandin û dewlet gelekî dewlemend bûbû.[388]

Lêbelê di serdema Mîr Nîzameddîn de gelek pirsgirêk derketin holê û ev pirsgirêk di serdema Nesirûdewle Mensûr de kûrtir bûn û herwiha dewlet ber bi hilweşandinê ve çû.

#### 2.6.2.1. Destpêka Hilweşînê û Sedemên Wê

Di navbera xelîfeyên Ebbasî yê Bexdayê û xelîfeyên Fatimî yên Misrê de reqabetek hebû[389] û Merwanîyan bi taybetî di dema Nesruddewle de ji bo hebûna xwe bidomînin di navbera her du hêzan de siyaeteke bidenge dimeşandin. Lewra dema ku Besasîrî ji bo desthilatdarîya xelîfeyê Fatimî yê Misrê li dijî xelîfeyê Bexdayê serî hilda Nesruddewle îhtîmala biserketîna Besasîrî jî dabû ber çavên xwe û di navbera herdû hêzan de bitedbîr tevgerîyabû. Hingê ev helwesta Nesruddewle bûbû sebebê êrîşa Selçûqîyan.[390]

Zekî Beg dibêje di dewra Nasiruddewle Mensûr de xutbe li ser navê Fatimîyan dihatin xwendin û ev jî bû sedem ku dewleta Ebbasî ji bo êrîşa Merwanîyan nav di Selçûqîyan bidin.[391] Lê jixwe piştî serdestîya Selçûqîyan a li dijî

---

[387] Îbnî Şeddad, h.b., r.404; el-Fariqî , h.b., r.535.
[388] Ripper, h.b., r.466.
[389] Ziya Kazıcı, *İslam Müesseleri Tarihi*, Kayıhan Yayınları, İstanbul 1991, r.47.
[390] Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.35.
[391] Zekî Beg, *Meşahirû Kurd we Kurdistan,* r.58.

Fatimîyan, Ji bo Merwanî xwe ji êrîşên turkmenan biparêzin bi temamî bûbûn tabiê Tugrul Beg. [392]

Piştî ku Selçûqîyan Buweyhîyên Şiî ji holê rakirin Merwanîyan hêja di dema Tugrul Beg de Xutbeyên xwe li ser navê Selçûqîyan dixwendin.[393]Jixwe di dema siltanê Selçûqî Melikşah de Merwanî bi temamî ketin bin kontrola Selçûqîyan.[394]

Heta em dikarin bibêjin ku di dema Nesruddewle de Merwanî bi awayekî konjokturel tevgerîyan û ji bo ku xwe biparêzin bi awayekî fermî tabîbûna Selçûqîyan pejirand.[395] Jixwe dewleta Selçûqî ber bi herêma kurdan, Iraq û Sûrîyeyê ve bi pêş diket û ev jî sedemeke hilweşîna vê mîrnişînê bû.[396] Lewra her ku diçû Selçûqî ber bi welatê Merwanîyan ve bi pêş diketin û herwiha koçên tirkan ber bi rojava ve didomîn. Vê rewşa han rê li ber hilweşîna mîrnişîna Merwanîyan vekir.[397]

Piştî ku Selçûqîyan Melazgird stendin êdî mîrnişîna Merwanîyan ji bo Bîzansîyan li dijî êrîşê Misilmanan ne herêmeke tampon bû, berevajî vê Merwanîyan ji bo welatê xwe ji hilweşînê biparêzin piştgirî didan êrîşên Selçûqîyan ên ku tirkên koçer digihandin rojava.[398]

Dîsa dubendîya di navbera Mîr Nîzameddîn û birayê wî Mîr Seîd de bû sedem ku siltanê Selçûqî destê xwe dirêjî karûberên rêvebirîya Mîr Nîzameddîn bike[399] û bi vî awayî rêvebirîya wî lawaz bike.[400]

Piştî mirina Mîr Nîzameddîn jî kurê wî Mîr Mensûr sedaqeta xwe wek ya bavê xwe nîşanî siltanê Selçûqî neda û herwiha ji ber ku meyla gel li ser selçûqîyan hebû û Mensûr, wezîr Ebû Tahir Enbarî ji wezîrtîyê avêtibû û ew dabû girtin û Ebû Salimê fileh kiribû wezîrê xwe. Mîr Mensûr mirovên fileh di karûberên dewletê yê

[392] Alican , h.b., r.4.
[393] Bekir Biçer, "Ortaçağda Kürtler ve Türkler", The journal of Academic Social Science Studies, C.6. r.231-261, Heziran 2013, r.236.
[394] Sevim, h.b., r.99.
[395] Yûsuf, h.b., C.2., r.50.
[396] Ripper, h.b., r.86.
[397] Skylitzes, (Amd.Thurn), r.445. Vgh. Ripper, h.b., r.136
[398] Ripper, h.b., r.113.
[399]el-Fariqî, h.b., r.506.
[400] Ripper, h.b., r.317.

girîng de bi cih kiribûn.[401] Rêvebirîya Ebû Salim a nebaş, jî ji bo bidawîkirina rêvebirîya kurdan a li Diyarbekirê derfet xistibû destê Selçûqîyan.[402]

Nasiruddewle Mensûr li mîrata bavê xwe xwedî derneket û bi sîyaseta ku meşand jî xişma Selçûqîyan kişand ser xwe.[403] Lewra digel ku Nasiruddewle Mensûr tabîbûna Selçûqîyan pêjirandibû têkilîyên wî bi Şerefudewle Muslimê mîrê Musilê re hebûn, meyla wî li ser şiîyan bû û ji ber vê siltan dixwest vê mîrektîyê rasterast bi dewleta Selçûqî ve girê bide.[404]

Îbnu'l-Ezreq bûyereke din ku wek sedemeke êrîşa Selçûqî dihesibîne ji kalikê xwe wiha neqil dike: Fexruddewle gelek caran tiştên biqîmet bi min re dişandin Hiskêfê û ji wir jî dişandin Bexdayê cem Amîdûdewle. Rojekê di nav tiştên ku dan min de qûtîyek nîşanî min da. Tê de tisbehekî ku ji sed û çil dirrî pêk dihat nîşanî min da û got ku ev tisbeh bû sedemê hilweşîna Merwanîyan. Lewra ev tisbehê Nesruddewle Ehmed bû. Giranîya her libeke wî misqalek[405] bû û Fexruddewle ji min re got ku ev tisbeh ê Nesruddewle Ehmed bû û piştî ku Nesruddewle mir siltan ew û şûrekî biqîmet ji Nizameddîn xwestin. Nîzameddîn ew ji siltan re neşandin lê hinek diyarîyên din jê re şandin. Piştî ku Nîzamddîn mir, Siltan Melikşah ew tisbeh û şûr ji Nasiruddewle Mensûr xwestin û lê Mensûr sûnd xwar ku ew nedîtine û ji dêl wan ve jî tiştek ji siltan re neşand. Rojekê ku Fexruddewle jî li wir li cem Nîzamulmilk bû Fexruddewle vê bûyerê bi awayekî mibalaxa dibêje û li ser vê artêş amade dibe û Fexruddewle diçe vî welatî.[406]

Temamê van şert û mercên ku derketin holê bû sedemên hilweşandina mîrnişîna Merwanîyan û hilweşandin bi destê Fexruddewleyê kurê Cehîr pêk hat. Fexruddewle wezîrê Merwanîyan ê kevin bû û hem di dewra Nesruddewle Ehmed hem di dewra Nîzameddîn de wezîrtî kiribû û wî sir û razeyên Merwanîyan ên ku

[401] el-Fariqî , h.b., r.518; Îbnî Cewzî, h.b., r.235; Bîçer, *Selçuklular ve Kürtler* , r.192.
[402] el-Fariqî, h.b., r.521; Ripper, h.b., r.271.
[403] Alican, h.b., r.8.
[404] Sevim, h.b., r.202.
[405] Pîvaneke zêr, zîv, dir û gewherên din e û nêzî du giraman e.
https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng. 01/07/2016
[406] el-Fariqî, h.b., r.523.

kesekî nizanîbû û cihê pere, gencîne, kevirê giranbuha û sirên pêşketina dewletê dizanibû.[407]

#### 2.6.2.2. Êrîşa Selçûqîyan û Dagirkirina Welatê Merwanîyan

Di sala 478/1085an de Dewleta Selçûqî bi serkêşîya wezîrê kevin ê Merwanîyan êrîşî welatê Merwan kir û ev mîrnişîn ji holê rakir. Îbnu'l-Ezreq Destpêkirin û pêvajoya hilweşandina mîrnişîna Merwanîyan wiha anîyê zimên: "Nasiruddewle Mensûr, Ebû Tahir Enbarî girtibû û Ebû Salim di cihê wî de kiribû wezîr. Dema Fexruddewle bihîst ku rêvebirîya Merwanîyan ber bi lawazbûnê ve diçe çû cem wezîrê siltanê Selçûqî Nîzamulmilk jê re qala pere û xezîneyên pir ên Merwanîyan kir û got ku ez dikarim van mal û xezîneyên bêhejmar bistînim. Nîzamulmilk jî ev rewşa han ji siltan re got.[408] Li ser vê siltan artêşek amade kir û di bin fermandarîya Fexruddewle de şand ser Diyarbekirê û jê xwest ku Diyarbekirê ji Merwanîyan bistîne û pereyan li ser navê wî çap bike û xutbeyê jî li ser navê wî bixwîne.[409] Dema Nasiruddewle Mensûr pê hesîya ku ev artêş nêzîk bû rêvebirîya welêt ji Ebû Salim û ji hevsera wî re hişt. Ji leşker û gel re got ku li gorî fermanên Ebû Salim tev bigerin û çû Cizîrê. Piştî ku çû Cizîrê bi pêşengîya apê xwe yê li Cizîrê lijneyek şand Esfehanê cem siltan. Siltan ji Nasiruddewle Mensûr re xeber şand û got ku bila Meyyafariqîn û Amed jê re be Cezîreyê bide min û wan deverên din em ê di navbera xwe de par vekin. Nasiruddewle Mensûr li ser vê teklîfa siltan difikirî lê Wezîrê Nasiruddewle Mensûr Ebû Salim wê şevê nameyek ji Nasiruddewle Mensûr re şand. Di nameya xwe de wiha got: "Welatê xwe nede siltan. Rewşa me pir baş e û em dikarin li dijî vê dorpêçkirinê bîst salan jî li ber xwe bidin."[410]

Fexruddewle pêşî êrîşî Amedê kir, kurê xwe Ebû'l-Qasim li dorpêçkirina Amedê hişt û wî digel artêşekê Meyyafariqîn dorpêç kir û vê dorpêçkirinê heta meha tişrînê dom kir. Dema bû zivistan Fexruddewle çû Sêrtê zivistanê li wir ma û di meha

[407] el-Fariqî, h.b., r.503.
[408] el-Fariqî, h.b., r.520; Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.235.
[409] Îbnu'l-Esîr , h.b., C.8, r.530.
[410] el-Fariqî, h.b., r.520; Îbnu'l-Cewzî, h.b., r.235.

zîlqadeyê de dîsa vegerîya Meyyafariqînê. Dorpêçkirina welatê Merwanîyan her ku diçû dijwartir dibû û piştre siltan, kalikê Artuqîyan Artuq[411] jî şand alîkarîya Fexruddewle.[412] Îbnu'l-Ezreq tenê qala hatina Artuq dike û zêde qala bûyerên ku di navbera wan de qewimîne nake lê Sibt Îbn'ûl- Cewzî bi berfirehî qala Artuq dike ku çawa Artuq hat ji bo alîkarîya artêşa Selçûqî ya di bin fermandarîya Fexruddewleyê kurê Cehîr de. Li gorî Îbnu'l-Cewzî piştî Fexruddewle pê hesîya ku Muslim[413] li dijî wî tevdigere alîkarî ji siltan xwest û li ser vê siltanê Selçûqî, Artuq digel hêzên tirkmen û ereban[414] şandin alîkarîya Fexruddewleyê Kurê Cehîr.[415]

Muslimê Uqeylî dizanibû ev sîyaseta ku siltan Melikşah dişopîne ji bo wî jî talûkeyek e û ji ber vê yekê di şerê vê parastinê de çûbû alîkarîya Ebû'l Muzaffer Mensûr.[416] Lê dema Muslim alên Siltan Melikşah dîtin xwest ku dev ji vî şerî berde û vegere. Jixwe Fexruddewle jî nedixwest bi Muslim re şer bike ji ber ku erebên Mûsilê hemnijad û eqrabayên wî bûn û nedixwest xwîna wan bê rijandin. Bi vî awayî hêzên Muslim û Selçûqîyan li hev kirin. Li gorî vê lihevkirinê hêzên Selçûqî dê paş ve kişiyabûna û Muslim dê leşkerên xwe derxistibûna.[417] Lêbelê Artuq ev vekişandin nepejirand, lewra nedixwest alên siltan paş ve bikişîne. Tirkmenên di artêşa Artuq de jî dema pê hesiyan ku bi leşkerên Muslim re aşîtî çê dibe xwe nerazî kirin. Lewra ew ji wan welatên dûr ji bo talanê hatibûn. Nîvê şevê leşkerên Artuq êrîşî leşkerê Muslum kir. Gelek mal û heywanên wan talan kirin û dest avêtin pîrekên wan û serokên ereb dîl girtin. Piştî sê rojan Artuq û Fexruddewleyê kurê Cehîr ketin qirka hev û Artuq leşkerên tirkmenan bi xwe re birin û vegerîya û bi şertê ku hinek pereyan bidê destûra vegera Muslim jî da.[418] Lê li gorî Gregory Abû'l-Farac piştî Nasiruddewle Mensûr pê hesîya ku Artuq jî digel artêşa xwe ber bi welatê wî ve tê

---

411 Fermandarekî Alparslan e. Di serdema Melikşah de ket xizmeta Tutuş û bi hev re dewleta Surî-Filistîn damezirandin. Tutuş bajarê Qudsê ku ji bo her sê dînan pîroz e wek Îqta da Artuq. Bnr. Îlhan Erdem,"Artuklu Uygarlığı Ve Türkmenler", Gazi Üniversitesi Gazi Eğitim Fakültesi Dergisi, c.29., Ankara 2009.
412 el-Fariqî, h.b., r.519; Yûsuf, h.b., c.1, 298.
413 Mîrê Uqeylîyan Şerefuddewle Muslumê kurê Qureyş e. Bi Stendina Helebê desthilatdarîya wî bihêz bû. Di sala 474/1081ê de Herran û Suruc stend. Bnr. Ripper h.b, r.253.
414 Li gorî Îbnî Xelîqan ev artêşa ku bi Artuq re hatine ji turkmen, kurd û gelek gelek kesên din pêk dihat. Bnr. Îbnî Xeleqan, h.b., C.5., r.128.
415 Îbnî Cewzî, h.b., r.259.
416 Ripper, h.b., r.320.
417 Sevim, h.b., r.101.
418 Îbnî Cewzî, h.b., r.259-260.

gazî Şerefûdewle kir û alîkarî jê xwest.[419] Bi şertê ku alîkarîya wî bike dê Amed, Cizîr û hinek keleh û deverên din dabûnayê.[420]

Welatê Merwanîyan bi vî awayî demekê di bin dorpêçkirina Fexruddewle de ma û piştre siltanê Selçûqî ji bo alîkarîyê fermandarekî bi navê Kuhbarî jî şand, bi vî awayî hejmara leşkerên ku êrîş kiribûn zêde bû.[421]

Fexruddewle 25 Cemazîyelewwelê, di sala 478/1086an de ket nava Meyyafariqînê[422] ango Meyyafariqîn jî piştî Amedê bi sê mehan ket destê Fexruddewle.[423]

Bi vî awayî welatê Merwanîyan hemû ket destê Fexruddewle û dest danî ser temamê xezîne û pereyên Merwanîyan. Fexruddewleyê kurê Cehîr li Meyyafariqînê û kurê wî Zaîmudewle li Amedê dima.[424]

Piştî Stendina bajarên Merwanîyan leşkerê siltan vegerîya. Tenê sê sed leşker û fermandarekî bi navê Çubuq li cem Fexruddewle ma. Li alîyê din dema Nasiruddewle Mensûr bihîst ku welatê wî ji destê wî derket qîyamet li serê wî rabû. Êdî ew rojên wî yên xweş qedîyabûn. Siltan xeber jê re şand û jê pirsî ka tu ji dêla welatê xwe ve çi dixwazî. Nasirdewle jê re ev bersiv şand: “Ez rimekê dixwazim ku li ser singa min bikeve û di pişta min de derkeve.”Li ser vê siltan rabû gundekî bi navê Herbe ku dikeve bakurê Bexdayê da Nasiruddewle Mensûr. Lewra navê rimê bi erebî “herbe” bû û ji siltan re ev gotina wî wisa neqil kiribûn ku Nasiruddewle Mensûr Herbeyê dixwaze. Nasiruddewle çû wir û heta ku Siltan Melikşah mir li Herbeyê ma.[425] Wezîrê wî Îbnî Esed jî piştî ku bajar ket destê Fexruddewle xwe veşart û ji wir revî.[426]

---

[419] Gregory Abû’l-Farac, *Abû’l-Farac Tarihi,* C.1., r.330. Vgh.Bekir Biçer, *Selçuklular ve Kürtler,* Sibat 2013, C.6., hej. 2., r.193.
[420] Sevim, h.b., r.101.
[421] el-Fariqî, h.b., r.520-521.
[422] el-Fariqî, h.b., r.524.,Şerefxanê Bedlîsî, h.b., r.111.
[423] Îbnî xeleqan, h.b., C.5., r.128; Îbnu’l-Cewzî, h.b., r.270.
[424] el-Fariqî , h.b., r.521-522; Îbnî Cewz, h.b., r.268.
[425] el-Fariqî, h.b., r.521.
[426] el-Fariqî, h.b., r.531.

Lê hinek ji gelên bajêr ên fileh ji alîyê misilmanan ve hatin kuştin û malê wan hat talankirin. Li gorî Îbnî Cewzî ev fileh ji bo ku di dema dorpêçkirina Fexruddewle de bahayê genim pir zêde kiribûn û erzan nedifirotin hatibûne kuştin.[427]

Dorpêçkirina welatê Merwanîyan du salan dom kiribû. Gel bi hêvîya ku welat bikeve destê siltanê Selçûqî dê êrîşên tirkmenan bi dawî bibin teslîm bû. Lê berevajî vê, êrîşên tirkmenan li ser bajarên kurdan zêdetir bûn û tirkmen ber bi Anadolîya Navin ve diçûn û herwiha kurd jî ji ber van êrîşan ber bi rojava ve çûn.[428]

### 2.6.3. Vegerîna Nasiruddewle Mensûr û Hêvîya Vejandina Mîrnişîna Merwanîyan

Piştî bidawîbûna walîtîya Fexruddewleyê kurê Cehîr Amîdûdewleyê kurê wî bûbû walîyê welatê Merwanîyan.[429] Paşê Amîdûdewle ji welatê Merwanîyan çû û bû wezîrê xelîfeyê Bexdayê û birayê xwe el-Kafî Ebû'l-Berekatê kurê Cehîr bi wekîltî li Meyyafariqînê hişt. Piştre siltan gazî el-Kafî kir û çû Bexdayê cem siltan û wî jî kurê xwe Ebû'l-Hesen bi wekîltî li Meyyafariqînê hişt û rêvebirîya temamê Dîyarbekirê xist destê wî. Lê piştî demekê xebera kuştina Siltan Melikşahê Selçûqî giha Meyyafariqînê û gel bi hev ket û dubendî ket nav wan. El-Kafî Ebû'l-Berekat dev ji rêvebirîyê berda. Gel di nava xwe de tifaq çê kir û xeber ji kurê siltan Bergyarûk re şandin û wiha gotin: "Ev der welatê bavê te ye û em ji we pê ve kesî naxwazin"siltan got ku ez ê werim lê derfet nedît ku bê. Piştre ji bo parastina bajêr Ebû Salim Yahyayê kurê Hesen bijartin û xistin birca mîr. Lê ji ber ku hatina siltan bi derengî ket dîsa dubendî ket nav gel.[430] Demeke dirêj derbas bû lêbelê siltanê Selçûqî kes ne şand Meyyafariqînê û li ser vê gel lijneyek amade kir û çûn Nisebînê cem siltan . Belê, gel rêvebirîya Merwanîyan nedixwest ji ber ku gelek başî û dadmendî ji destê Fexruddewleyê kurê Cehîr dîtibûn û hatina Nasiruddewle

[427] Îbnî Cewzî, h.b., r.268.
[428] Ripper,h.b., r.561.
[429] Îbnu'l-Esîr , h.b., r.417.
[430] el-Fariqî, h.b., r.527-528.

nedipejirandin. Lê qismek ji gelê Meyyafariqînê dixwestin ku mîrê wan ê berê Mensûr bê û bajêr radestî wî bikin.[431]

Ew kesên li dijî rêvebirîya Nasiruddewle Mensûr, di dema walîtîya Fexruddewle de ji desthilatdarîya Selçûqîyan gelek feyde dîtibûn û niha berjewendîya xwe dixwestin.[432] Lewra dema ku siltan ketibû nava Meyyafariqînê û ev der xistibû bin hikmê xwe gelek dîyarî dabûn kesên ku hatibûn û siltan dawet kiribû ji bo ku bê û dest dayne ser Meyyafariqînê. Mesela yek ji wan kesê di vê lijneyê de Qadî Ebû Bekr bû û siltan gelek dîyarîyên biqîmet danê û erdekî bi navê Qulfeh dayê. Herwiha siltan gelek dîyarî dan wan kesên din ku bi Ebû Bekr re hatibûn, gelek qencî li wan kir û meyla wan kir û ew di ser kesên din re girtin.[433]

Wê demê kesekî bi navê Îbnî Esed li Meyyafariqînê hebû. Îbnî Esed helbestvan û wêjevan bû. Li derûdora wî xwendekar, ciwan, hinek dikandar û kesên nezan û jirêzê kom bûbûn û bajar û sûr diparastin.[434] Jixwe rewşa bejêr ne li gorî dilê Îbnî Esed û kesên pê re bû. Ji ber ku giregirên bajêr jî niha ne li Meyyafariqînê bûn ev ji wan re derfetek bû.[435] Belê giregirên bajêr û gelek ji misilmanan desthilatdarîya Selçûqîyan dixwestin lê li Meyyafariqînê hêza Îbnî Esed û kesên pê re jî zêde bû. Hêja [436]ev lijneya giregirên bajêr li cem siltanê Selçûqî Tutuş bû Nasiruddewle Mensûr li Cîzîrê bû û ew û Îbnî Esed bi hev re ketin têkilîyê û bi alîkarîya Îbnî Esed û hevalên wî Nasiruddewle Mensûr hat li ser textê mîrîtîyê rûnişt.[437] Lêbelê mîrîtîya Nasiruddewle tenê pênc mehan dom kir. Lewra Siltan Tacûdewle Tutuş di sala 486/1094an de pêşî hat Amedê û piştre Meyyafariqîn stend. Gelê Meyyafariqînê bajar bê şer radestî siltan kir. Dema siltan ber bi bajêr ve hat xeber ji gel reşand û ew tirsandin.[438] Berî niha jî dema Nisêbîn dorpêç kiribû bêhed û hesab mirov kuştibûn gelek fermandarê ku pê re şer kiribûn girêdabûn û heta mirinê wisa

[431] el-Fariqî, h.b., r.529.
[432] Ripper., h.b., r.302.
[433] el-Fariqî, h.b., r.530.
[434] el-Fariqî, h.b., r.529.
[435] Ripper., h.b., r.520.
[436] Ripper, h.b., r.302.
[437] el-Fariqî, h.b., r.530.
[438] el-Fariqî, h.b., r.530.

hiştibûn. Dîsa bajar û mal û milkê gel talan kiribû. Tiştên ku hatibû serê gelê Nisêbînê nehatibû serê kafiran.[439]

### 2.6.4. Mirina Nasiruddewle Mensûr

Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq, Nasiruddewle Mensûr di sala 486an de li Cezîreyê wefat kiriye.[440] Lê Îbnu'l-Esîr derbarê mirina Nasiruddewle Mensûr de agahîyên ku li cem Îbnu'l-Ezreq tunin dide û herwiha li gorî wî sala mirina wî jî cuda ye, li gorî Îbnu'l-Esîr , Çokermîş[441] Nasiruddewle Mensûr teslîmê kesekî Cihû dike û sala 489/1093yan li mala vî kesê Cihû dimire. Piştre hevsera wî termê wî dibe li goristana bav û kalên wî defin dike.[442] Li gorî agahîya Abdulselam el-Mardînî ku di Tarîxû'l-Mardîn de dide Nasiruddewle Mensûr heta dawîya jîyana xwe li Cezîretu Omer girtî dimîne.[443] Piştre li wir di girtîgehê de dimire.[444]

### 2.6.5. Destpêka Rêvebirîya Walîyên Selçûqî li Welatê Merwanîyan

Serê pêşî ji bo siltan tişta girîng li rojhilat serkeftina li dijî Bîzansyan û li Sûrî ya li dijî îqtidara Fatimîyan bû. Ji ber vê yekê jî tenê tabîbûna xanedanên harêmî yên wek Merwanîyan jê re bes bû. Lê piştî talûkeya her du hêzên mezin ji holê rabû îca Melîkşah xwest ku Cezîre û bakûrê Sûrî li gorî xwe tenzîm bike û herwiha qurbana peşî ya vê tevgerê bû mîrnişîna Merwanîyan. Diviyabû dewlendîya harêmê rasterast hatibûna qontolkirin[445] û tenê ev serwet û dewlemendîya wan dikaribû bi destê walîyan bê kontrolkirin. Lewre piştî ku Selçûqîyan welatê Merwanîyan xistin bin destê xwe îca ew der bi rêya walîyên xwe bi rê ve birin.

---

[439] el-Fariqî, h.b., r.529.
[440] Îbnî Şeddad, h.b., r.404; el-Fariqî, h.b., r.535.
[441] Di dema siltanê Selçûqî Tutuş de walîyê Cezîretû Îbnî Omer bû. Bnr. Ripper, h.b., r.304; Navê wî Şemsudewle Cîgermij e. Kurdekî ji xelkê Cizîrê ye. Bnr. Bedlîsî, h.b., jêrenot:69., r.564.
[442] Îbnu'l-Esîr, h.b.,C.9.,r.3-4; Îbnî Şeddad, h.b., r.404.
[443] Abdulselam el-Mardînî, *Tarîxû'l-Mardîn*, Berlin Hs. 6615, fol. 70.r. Vgh. Ripper, h.b., r.304.
[444] Varlî, h.b., r.179.
[445] Ripper, h.b., r.319.

Dîroknas Skylits balê dikişîne ser vê taybetîya di sîyaseta Selçûqîyan de ya ku herî zêde derdikeve pêş ku wan li cihê rêvebirîya mîrên wê herême fermandarên derûdora siltan tercîh dikirin.[446]

Serê pêşî Selçûqîyan qîma xwe bi tabîbûna xanedanên herêmî anîn lê talûkeya ku ev mîrnişîn bi hev re tifaqê deynin û bikevin bin wesayeta hêzine din hebû. Ji ber vê yekê Selçûqîyan ev mîrnişînên herêmî ji holê rakirin û rêvebirîya van deran xistin destê walîyên xwe.[447] Li gorî agahîyên ku Îbnû'l-Ezreq dide walîyê pêşî Fexruddewleyê kurê Cehîr bû[448] û piştî wî Amîdûlmulk Ebû Elî el-Belxî bû walîyê vir û paşî jî Ebû Elî kurê Fexruddewle Amîdûdewle walîtîya welatê Merwanîyan kir.[449] Piştî Amîdûdewle,walîtîya vir bi wekaleten ji alîyê kurên Fexruddewle ve hat meşandin.[450]

#### 2.6.4.1. Fexruddewleyê kurê Cehîr

Fexruddewleyê kurê Cehîr hem di serdema Nasiruddewle[451] û hem jî di serdema Mîr Nîzameddîn de wezîrtîya Merwanîyan kiribû.[452]

Herwiha Fexruddewle, siltanê Selçûqî ji xezîne û dewlemendîyên Merwanîyan agahdar kiribû û bûbû sebebê hilweşandina wan.[453] Piştî ku welatê Merwanîyan hat stendin Fexruddewle bû walîyê vir û hemû der xistin destê xwe. Wezîrê Merwanîyan Ebû Salim jî da girtin û dest danî ser temamê pere û xezîneyên wan.

Dema walîtîya Fexruddewle dewam dikir kurê wî Amîdudewle jî Wezîrê xelîfeyê Bexdayê bû û Fexruddewle gelek tiştên giranbiha di ser rêya Hiskêfê de dişandin cem kurê xwe.[454] Lê piştre Ebû Elî el-Belxî gilîyê wî li cem siltan kir.[455]

---

[446] Skylitsez, (Amd. Thurn), r.445. Vgh. Ripper, h.b., r.272.
[447] Mostoufi, *Nuzhetu'l-Qulûb*, (Wer. Le Strange), s.105. Vgh. Ripper, H.b., r.92.
[448] el-Fariqî, h.b., r.521.
[449] el-Fariqî, h.b., r.524.
[450] el-Fariqî, h.b., r.527.
[451] el-Fariqî, h.b., r.493.
[452] el-Fariqî, h.b., r.504
[453] el-Fariqî, h.b., r.519.
[454]el-Fariqî, h.b., r.522.

Dema siltan bi vê yekê hesîya Fexruddewle li ber çavên wî reş bû û piştî rêvebirîya wî ya li Meyyafariqînê bi du salan siltan , rêvebirîya welatê Merwanîyan jê stend. Serê pêşî Fexruddewle xwest dev ji vir bernede û serî li ber siltan rake û ji bo ku piştgirîyê bidinê gel jî da sûndê lê fam kir ku bi ser nakeve dev jî vê fikra xwe berda.[456]

Piştî rêvebirîya Meyyafariqînê, Fexruddewle di sala 482/1090î de çû Cizîrê ew der xist destê xwe û li wir xutbe ser navê xwe da xwendin û di sala 483/1091î de li Mûsilê mir.[457]

### 2.6.4.2. Amîdulmulk Ebû Elî el-Belxî

Piştî ku walîtîya Meyyafariqînê ji Fexruddewleyê kurê Cehîr hat stendin Amîdulmulk Elî el-Belxî di sala 482/1090î[458] de bû walîyê Meyyafariqînê.[459] Li gorî Îbnu'l-Cewzî Ebû Elî çûbû cem siltan û gilîyê Fexruddewle kiribû û jê re gotibû ku Fexruddewle mal û gewherên Merwanîyan ji xwe re dihêle.[460] Li ser vê walîtî ji Fexruddewle hatibû stendin.

Amîdulmulk Ebû Elî mirovekî baş û zana bû. Gelek qencî li gel dikir û heq û dadmendî li nava wan belav dikir. Heta ji bo başîya wî û taybetîya wî ya ku can û mal û namûsa xelkêê diparast dewra wî dişibiya ya Mîr Nîzameddîn.[461]

Rojekî Amîdulmulk berbanga sibehê bi dengê naqosê şiyar bû. Dema pirsî jê re gotin ku ev, dengê naqosa dera Ubadê ye. Sibehê Amîdulmulk gel kom kir û wisa got: “Di welatê misilmanan de li ser serê wan naqos lê dixe? Naxwe em li Qostantînîyê ne!” Gel jê re got ku berê ev dêr bûbû mizgeft lê filehan dîsa ew kir

---

455 Îbnî Cewzî, h.b., r.275.
456 el-Fariqî , h.b., r.524; Îbnî Şeddad, h.b., r.389.
457 el-Fariqî, h.b., r.527; Îbnu'l-Esîr , h.b., C.8., r.465.
458 Fariqî destpêka walîtîya Ebû Elî sala 482/1090î dide lê dibêje li gorî destxeta Qadî Ebû Bekir destpêka walîtîya wî 479/1087 e. Dibe ku dîroka duyan rast be lewra Îbnu'l-Esîr jî di nava bûyerên sala 479/1087an de qala destpêka walîtîya Ebû Elî Belxî dike. Bnr. el-Fariqî , h.b., r.524; Îbnu'l-Esîr , h.b., C.8., r.450.
459 el-Fariqî, h.b., r.524; Îbnu'l-Esîr , h.b., C.8., r.450; Îbnî Şeddad, h.b., r.389.
460 Îbnî Cewzî, r.275.
461 el-Fariqî, h.b., r.524.

dêr.[462] Li ser vê Amîdulmulk Ebû Elî dîsa absidîna[463] wê xerab kir û li cihê wê mîhrab çê kir û ev dêr xist mizgeft û navê wê jî kir Mizgefta Fethê. Filehan dîsa ji bo ku bibe dêr pêncî hezar dînar teklîf kirin lê Amîdulmulk Ebû Elî ev teklîf nepejirand.

Têkilîya Ebû Elî bi gel re pir baş bû; lê dîsa lijneyek ji giregirên bajêr çûn cem siltan  û gilî û gazindên xwe di derbarê Ebû Elî de gotin. Di nav wan de serok û qadî û nazir hebûn. Bapîrê Îbnu'l-Ezreq, Reîs Ebû'l-Hesenê kurê Ezreq û Qadî Ebûbekirê kurê Sedeqe jî di nav wan de bûn. Wan kesan dixwestin ku siltan , Ebû Elî ji walîtîyê bavêje û Fexruddewle dîsa bibe walî. Lewra gelek qencî ji destê Fexruddewle dîtibûn. Lêbelê siltan  ev teklîfa wan nepejirand. Qadî çû cem Xoce Nîzamulmilk û jê re got ku gel jê pir aciz e. Dawî Nîzamulmilk dîsa ji siltan  re rewş got û vê carê siltan fermana betalkirina walîtîya wî da û li cihê wî Ebû Tahir Enbarî ji bo walîtîyê tayîn kir.[464]

#### 2.6.4.3. Amîdûdewleyê Kurê Fexruddewle

Piştî Ebû Elî, Ebû Tahir Enbarî ji bo walîtîya Welatê Meyyafariqînê hatibû tayînkirin. Ebû Enbarî xwe amade dikir ku here dest bi walîtîyê bike; lêbelê Amîdûdewleyê kurê Fexruddewle ji bo ku walîtîya Meyyafariqînê bidîyê Nîzamulmilk qayîl kir. Amîdudewle dê ji bo sê salan mîlyonek[465] dînar dabûna Selçûqîyan.[466] Tişta din a ku bûbû sedem  ji bo ku walîtîya vir dan Amîdudewle, xizmantîya wi ya bi Nîzamulmilk re bû.[467] Lewra Amîdudewle bi keça Nîzamulmilk Zubeyde re zewicîbû.

[462] Di sala 478/1086an de dema Fexrûdewle ketibû Meyyafariqînê dêra Ubadê ya li vir kiribû Mizgeft; lê fileh ji vî karî pir hêrs bûbûn û sih hezar dînar dabûne gelê vir û ew der dîsa kiribûn dêr. Bnr. el-Fariqî , h.b., r.524; Îbnî Şeddad, h.b., r.390.
[463] Di dêran de cihê di şeklê nîvdaîreyê de û wek mîhraba mizgeftan e. http:// www.kulturekbellek.com/absid-nedir-anlami-nedir.(10/09/2016)
[464] el-Fariqî, h.b., r.525; Îbnî Şeddad, h.b., r.390-391.
[465] Di metnê de gotiye hezar hezar dînar/ألف ألف دينار ango hezar carî hezar û ew jî mîlyonek dike.
[466] el-Fariqî , h.b., r.526; Îbnî Şeddad, h.b., r.392.
[467] Ripper, h.b., r.295.

Li ser van şertan Amîdudewle di 16ê Zîlkadeya sala 482/1090î de hat Meyyafariqînê û dest bi rêvebirîya wir kir. Bi vî awayî Amîdudewle xezîneyên Fexruddewleyê bavê xwe bi dest xistin. Jixwe ji ber vê yekê walîtîya vir xwestibû.[468]

Di sala 484/1092yan de xelîfeyê Bexdayê xeber ji Nîzamulmilk re şand, xwest ku Amîdudewle jê re bişîne û bibe wezîrê wî.[469] Li ser vê Amîdudewle çû Bexdayê dest bi wezîrtîya Xelîfe el-Muqtedî kir.[470]

Piştî ku Amîdudewle çû, heta ku cara duyem Selçûqîyan Meyyafariqîn xistin bin destê xwe ev der bi rêya wekîltîyê hat birêvebirîn. Ji ber ku kesê di wê demê de rêvebirî kirin ne bi tayînkirina siltan hatibûn em serdema wan wek walîtîyê nikarin bipejirînin. Lewra heta Amîdudewle li Meyyafariqînê bû tu pirsgirêk derneketibûn lê piştî ku Amîdudewle çû di nav gel de gengeşîyê dest pê kir. Dibe ku ji bo walîyek ji alîyê siltan ve nehatibû tayînkirin ev pirsgirêk derdiketin. Lewra gel îtaeta wan kesên ku bi rêya wekîltîyê hatibûn tayînkirin nedikir. Îbnu’l-Ezreq û Îbnî Şeddad vê pêvajoyê wiha neqil dikin: Dema siltanê Selçûqî gazî Amîdudewle kir û çû Bexdayê heta meha remezanê birayê xwe el-Kafî Ebû’l-Berekat li Meyyafariqînê bi wekîltî hişt. Piştre siltan gazî wî jî kir Ebû’l-Berekat pereyên ku ketîbûne destê wî birin û çû Bexdayê cem siltan. Wî jî dema çû kurê xwe Ebû’l-Hesen bi wekîltî li cihê xwe danî. Lê ji ber ku xebera mirina siltan giha Meyyafariqînê gengeşî ket nava gelê Meyyafariqînê û li ser vê Ebû’l-Hesen dev ji walîtîyê berda. Vê carê gelê Meyyafariqînê rêvebirî xist destê Ebû Salim Yahyayê kurê Hesenê kurê Mîhwer.[471] Lê gengeşîya nava gel berdewam kir. Dîsa gel kom bû. Vê carê rêvebirî da Ebû’l-Hesenê kurê Ebû Salim. Heta ku Nasiruddewle hat û dîsa rêvebirîya Meyyafariqînê xist destê xwe rêvebirî di destê Ebû’l-Hesenê kurê Mihwer de ma. Piştî ku Nasiruddewle ket nava Meyyafariqînê Şêx Hesenê kurê Mîhwer çû cemê û eman jê xwest û ji Meyyafariqînê çû Amedê.[472]

---

468 el-Fariqî, h.b., r.526; Îbnî Şeddad, h.b., r.393.
469 Îbnu’l-Esîr , h.b., r.466.
470 el-Fariqî, h.b., r.527.
471 el-Fariqî, h.b., r.527; Îbnî Şeddad, h.b., r.394-395.
472 el-Fariqî, h.b., r.530.

### 2.6.4.5. Ebû Tahir Enbarî

Piştî ku Fexruddewle rêvebirîya Meyyafariqînê xist destê xwe Ebû Salim ji girtîgehê derxist û şand cem Ebû'l-Hesenê[473] nazirê Hiskêfê. Lê piştî demekê Fexruddewle poşman bû ku Ebû Salim ji girtîgehê derxist, lewra wî dizanibû ku serweta Merwanîyan çiqas e û dibe ku çûbûna cem siltanê selçûqî û jê re gotibûna. Li ser vê, Fexruddewle ji Ebû'l-Hesen û walîyê Hiskêfê Yaqut re xeber şand ku Ebû Tahir bikujin. Lê Ebû'l-Hesen Yaqût jî qanî kir, Ebû Tahir Enbarî veşartin û xebera mirina wî li her derê belav kirin.[474] Piştî ku Meyyafariqîn ji bin hukmê Fexruddewle derket û Fexruddewle vegerîya cem siltan, birayê Enbarî çû ji Fexruddewle xwest ku Enbarî ji girtîgehê derxe. Fexruddewle nizanibû ku sax e. Lê Ebû'l-Xenayîm jê re got ku birayê min sax e û li Hiskêfê girtî ye. Li ser vê siltan û Nîzamulmilk ji bo wî berdin xeber şandin Hiskêfê.[475] Piştî ku Enbarî ji girtîgehê derket peşî fermana walîtîya wî derket lê piştre siltan walîtî da Amîdudewleyê kurê Fexruddewle.[476] Lê piştî ku cara duyem Meyyafariqîn ket destê Selçûqîyan siltan rêvebirîya vir xist destê Enbarî lê zilamekî xwe yê bi navê Tuxtekîn jî li vir hişt.[477]

Piştî Enbarî pê hesîya ku Siltan Tacûdewle, Îbnî Esed kuştiye pir berê ket. Ji vê yekê aciz bû û di sala 487/1095an de dev ji Meyyafariqînê berda çû. Lê di sala 499/1097an di dawîya meha Cemyîzelaxirê[478] de siltan, Îbnû'l-Enbarî girt û kuşt.[479]

### 2.6.6. Piştî Hilweşîna Mîrnişîna Merwanîyan Rewşa Welatê Wan

Bi fermana Melikşah di sala478/1085an de bajarên Merwanîyan li begên tirkan hatin parvekirin.[480] Heta dema Melikşah jî hêzeke navendî ya Selçûqîyan hebû. Lêbelê piştî mirina Siltan Melikşah ev hêza Selçûqîyan belav bû. Di navbera Berkyaruk û birayê wî Tutuş de ji bo desthilatdarîyê têkoşînê dest pê kir. Piştre

[473] Ebû'l-Hesen kalikê Fariqî ye. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.522.
[474]el-Fariqî, h.b., r.522.
[475]el-Fariqî, h.b., r.525; Îbnî Şeddad, h.b., r.391.
[476]el-Fariqî, h.b., r.526.
[477] el-Fariqî, h.b., r.531; Îbnî Şeddad, h.b., r.398.
[478]Meha Cemayîzelaxirê di salnameya Koçî de meya 6. e. Bnr. http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri. (11/07/2016)
[479] Îbnî Şeddad, h.b., r.402; el-Fariqî, h.b., r.532.
[480] Torî, *Tarihte Kürt-Türk İlişkileri*, Peri Yayınları, İstanbul 2002, r.35.

Bergyaruk, Tacudewle Tutuş têk bir.[481] Di dema Tutuş de û piştî wî li herêma Diyarbekir û Exlatê gelek rêvebirîyên tirkan hatin damezirandin.[482]

Piştî mirina Tacudewle Tutuş herêma Diyarbekir perçe bû û rêvebirîya vî welatî ket destê Melik Dukakê kurê Siltan Tacudewle Tutuş. Meyyafariqîn tenê di destê Tuxtekîn de mabû. Amed ket destê Emir Yinal, Bedlîs û Erzen ket destê Husemeddîn Tumtekîn, Xanî ket destê Şarux, Sêrt, Tanza, Behmûd û Diwîn[483] ket destê Qizilarslan, Hiskêf û derûdora wê ket destê Sokmenê Artuqî. Di sala 493/1101ê de ev mîrên herêma Diyarbekir ketin xizmeta melik Dukak[484] lê dîsa desthilatdarîyeke navendî pêk nehat û herwiha herêma Cezîreyê ket bin desthilatdarîya tirkmenan. Her yek ji wan xweser tev digerîya û li ser herêma Cezîreyê zilm û zordestî dikirin.[485]

Melik Dukak di sala 998/1105an de mir û piştî wî rêvebirîya Meyyafariqînê ket destê Qiliçarslan. Piştî ku Qiliçarslan hat Meyyafariqînê mîrên Herêma Diyarbekirê hatin ketin bin xizmeta wî. Qiliçarslan rêvebirî xist destê Xamurtaş Silêmanîyê Xulamê bavê xwe û ji wir çû Meletîyê. Xamurtaş zilm û zordarî li gelê Meyyafariqînê kir rêvebirîya xwe li ser zordestîyê ava kir. Xamûrtaş û jina wî malê xelkê ji wan distandin û dest li serê didanîn.

Di sala 502/10109an de Mîr Sukman êrîşî Meyyafariqînê kir û rêvebirîya wir ket destê wî. Mîr Sokmen zilm û zordestî û baceyên giran li ser gel rakirin.[486] Piştî ku Mîr Sokmen ji Meyyafariqînê çû zilamekî xwe yê bi navê Kaxizlî danî ser rêvebirîyê.[487] Lê piştî mirina Mîr Sokmen hevsera wî Xatun û Kurê wî Mîr Îbrahîm hatin Kaxizlî ji walîtîyê avêtin û ew derxistin destê Ebû Mensûr el-Mûîn. Birayê Ebû Mensûr, Seyyîd jî bû wezîrê wî. Lê ji ber ku Îbrahîmê kurê Sokmen Wezîr Seyyîd kuşt Mûîn serî li ber kurê Sokmen rakir.[488]

---

481 Îbnî Şeddad, h.b., r.402.
482 Sevim, h.b., r.108.
483 Diwîn, li Îranê di sînorê Azerbeycan û nezî Tiflîsê ye. Eyûbiyên milûkê Şamê ji vir in. Bnr.el-Fariqî, h.b., Jêrenot:3, r.544.
484 el-Fariqî, h.b., r.524.
485 Ripper, h.b., r.321.
486 el-Fariqî, h.b., r.526-527.
487 Ripper, h.b., r.234.
488 el-Fariqî, h.b., r.549-550.

Di sala 508/1115an de Ezedîn Qaraca hat rêvebirîya Meyyafariqînê ji Mûîn stend û ew kir wezîrê xwe. Piştre di sala 509/1116an de Siltan Mihemed, walîyekî bi navê Razbeg şand Meyyafariqînê. Razbeg digel du hezar leşker ket nava Meyyafariqînê. Di vê demê de ji derveyê welêt gelekan êrîşî Meyyafariqînê kir û gelek deverên bajêr xerab bûn. Sedemên van êrîşan ew bû ku rêvebirên Meyyafariqînê zû diguherîn û yên ku dihatin jî ne bikêrhatî bûn. Bajar talan dikirin çi ber destê wan ketibûna dibirin ji ber ku wan bixwe jî zanibûn ku rêvebirîya wan li vir ne berdewam e. Ji ber vê yekê jî gel feqîr û perîşan bû.[489]

Di serdema Necmeddîn Îlxazîyê kurê Artuq de rewşa harêma Diyarbekirê ber bi başbûnê ve çû.[490] Di sala 512/1118an de li ser fermana Siltan Mahmûd, Necmeddîn Îlxazî ket Meyyafariqînê û rêvebirîya vir xist destê xwe. Di serdema wî de bajar ji nû ve hat çêkirin, herêm ji eşqîya û rêbiran hat paqijkirin û hizûr û ewlehî dîsa li welêt pêk hat.[491]

[489] el-Fariqî, h.b., r.551-552.
[490] Ripper, h.b., r.312.
[491] el-Fariqî, h.b., r.557.

# BEŞA SÊYEM

# ÇAND Û ŞARISTANÎ DI SERDEMA KURDÊN MERWANÎ DE

## 3.1. Rêvebirîya Dewletê

### 3.1.1. Mîr

Bad mîrê kurdan ê pêşî ye.[492] Piştî kuştina Bad, xwarzîyê wi yê mezin rêvebirîya dewletê dixe destê xwe.[493]

Mîr di dewleta Merwanîyan de ji hêla desthilatdarîyê ve di rêza yekem de bû. Di karên rêvebirîya dewletê yên wek îlana şer, gîrêdana peymanan, tayînkirina walîyan de mîr bîryar dida.[494]

Bi serdema Ebû Elî re di dewleta Merwanîyan de piştî mirina mîr, an birayê wî yan jî kurê wî rêvebirî dixist destê xwe. Li gorî agahîyên Îbnu'l-Ezreq, piştî Ebû Elî birayê wî dibe mîr.[495] Jixwe kurekî Ebû Elî tenê li pey dimîne û ew jî dema Ebû Elî tê kuştin hêja biçûk e.[496] Piştî Mumehhîduddewle, birayê wî Nasiruddewle Ahmed dibe mîr û piştî Nasiruddewle jî dîsa mîr, kurê xwe Nîzameddîn welîeht îlan kiribû û Nîzameddîn ser textê mîrîtîyê rûnişt.[497]

---

[492] el-Fariqî, h.b., r.450.
[493] el-Fariqî, h.b., r.453
[494] Yûsuf, h.b., C.2., r.75.
[495] el-Fariqî, h.b., r.461.
[496] el-Fariqî, h.b., r.462.
[497] el-Fariqî, h.b., r.505.

Piştî mirina mîrekî wezîr mîre nû îlan dikir.[498] Di berhema Îbnu'l-Ezreq de rêvebir û hikumdarê dewletê wek emîr[499] hatiye binavkirin[500] û herwiha peyva emîr ji erebî ketiye kurdî û tîpa dengdêr a serê peyvê ketiye û bûye "mîr".[501]

Nasnavên mîrên merwanîyan hebûn. Li gorî agahîyên Îbnu'l-Ezrak ji mîrên Merwanîyan cara yekem Ebû Mansûr nasnavê"Mûmehîdudewle"stendibû. Herwiha ev nasnav jî wezîrê wî Mem lê kiribû.[502] Nasnavê Ebû Nasir Ahmed jî "Nesruddewle" bû.[503] Li gorî Îbnu'l-Ezreq xizmetkarekî xelîfeyê Bexdayê el-Qadirbillah hinek diyarî li ser navê xelîfe û siltan ji Ebû Nasir re şandin û nasnavê "Nesruddewle" dayê. Di heman demê de xelîfeyê Misrê el-Hekîm Bîemrîllah jî gelek diyarî ji Nesruddewle re şandin û nasnavê "Îzûdewle" dayê.[504]

### 3.1.2. Wezîr

Di dewleta Merwanîyan de gelek peywirên wezîran hebûn. Tayînkirina walî û karmendên dewletê û betalkirina wezîfeya wan, dayîna meaşê karmendan, azadkirina kesên di girtîgehê de, destdanîna ser mal, îdarekirina leşkeran û beytulmalê hinek ji wan peywiran bûn. Lêbelê wezîr bêyî ku bi mîr re bişêwire nikaribû van karan bimeşîne û mîr dikaribû destûra kirina van karan nede.[505]

Piştî ku Bad Meyyafariqîn stend birayê xwe Ebû'l-Fewaris li wir hişt**.**[506] Di dema Ebû Elî de jî wezir Mem bû**.**[507]

Piştî ku Mem û kurê wî Şêro, Ebû Elî kuşt Ebû Nasir Mumehhîduddewle bû mîr. Karûberên dewletê bi temamî di destê Mem û Şêro de bû[508] û piştî Mem Şero bû alikarê Mumehhîduddewle.[509]

---

498 el-Fariqî, h.b., r.461.
499 Peyveke erebî ye. Nasnavê sereke û yê ku hêz di destê wan de ye. Di kurdî de bûye mîr.Bnr.Michael Chyet, mîr,*Chyet, Kurdish-English Dictionariy*, Yale Press, London.
500el-Fariqî, h.b., r.453
501 Bnr. "mîr" https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng. (01/07/2016)
502 el-Fariqî, h.b., r.461.
503 el-Fariqî, h.b., r.474.
504 el-Fariqî, h.b., r.476.
505 Yûsuf, h.b. C.1., r.78.
506 el-Fariqî, h.b., r.450.
507 el-Fariqî, h.b., r.450.

Di rêvebirîya Merwanîyan de gelek caran mîr karûberên rêvebirîya dewletê dixist destê wezîran. Lê wezîr heta ku bi mîr neşêwirîbûna bîryar nedigirtin.[510]

Piştî ku mîr dimir wezîr karûberên dewletê dimeşand. Dema Nesruddewle mir, wezîr, serokê artêşê şand mala Mîr Nîzameddîn û gazî wî kir. Pêşî wezîr, wek mîr silav li Nîzameddîn kir û piştre zarok û pismamên wî, qazî, kesên alim û zana û giregirên bajêr hatin cemê û wan jî wek mîr silav dan Nîzameddîn û herwiha gel jî li wir amade bû.[511] Piştî mirina Mîr Nîzameddîn jî dîsa Wezîr Ebû Tahir Selameyê kurê Enbar rêvebirîya dewletê kontrol kir û çû gazî Nesruddewle Ebû'l-Muzafer Mansûr kir.[512]

### 3.1.3. Walî

Mîrên Merwanîyan li Meyyafariqînê diman û ew bajarên din bi destê walîyan dihatin îdarekirin. Walîyên li bajarên Merwanîyan pere li ser navê Mîr çap dikirin û xutbe jî li ser navê wî didan xwendin. Agahîyên kesên ku di serdema Merwanîyan de walîtî kirine di pirtûka Fariqî de wiha derbas dibin:

Di serdema Mumehhîduddewle de rêvebirîya Amedê ket destê Evdulber. Mumehhîduddewle bi şertê ku salê du sed hezar dirhemî bide sike û xutbe li ser navê mîr bin rêvebirîya Evdulber a Amedê pejirand.[513]

Herwiha piştî ku kurê Dimne Evdulber kuşt û ket cihê wî nameyek ji Mumehhîduddewle re şand û xwest ku wî wek walîyê Amedê bipejirîne û li ser vê kurê Dimne bû walîyê Amedê. [514] Di serdema Ebû Elî û Mumehhîduddewle de jî Xoce Ebû'l-Qasim walîtîya Erzenê dikir.[515]

---

508 el-Fariqî, h.b., r.452.
509 el-Fariqî, h.b., r.466.
510 el-Fariqî, h.b., r.473.
511 el-Fariqî, h.b., r.505
512 el-Fariqî, h.b., r.516.
513 el-Fariqî, h.b., r.463.
514 el-Fariqî, h.b., r.464.
515 el-Fariqî, h.b., r.469.

Piştî ku Nesruddewle Amed ji kurê Dimne stend kurê xwe Ebû’l-Hesen kir walîyê Amedê.[516]

### 3.1.4. Karên Dîwan û Nivîsvanîyê

Di serdema Merwanîyan de di rêvebirîya dewletê de ji bilî wezîr û walîyan di qesrê de kesên ku karê dîwan û nivîsvanîyê dikirin hebûn. Hem di têkilîyên navxweyî û yên derveyî de role van kesan hebû. Agahîyên derbarê karê dîwan û nivîsvanîyê de di berhema Fariqî de wiha derbas dibe:

Piştî ku Nesruddewle kurê xwe ji bo walîtîyê danî Amedê katibekî bi navê Îbnî Xemmar danî cemê.[517]

Di dema Nesruddewle de li ser navê wezîr, Îbnu’l-Bereke karê dîwanê dimeşand. Karê nivîsandina nameyan û nivîsvanîyê jî Şêx Ebû Nasir Menazî dikir.[518] Ebû Nasir ji Melezgirtê bû, helbestvanekî jêhatî bû. Çend caran bi qasidtî çûbû Qonstantînîyeyê cem qralê Rûmê.[519]

Lê em ji agahiyên Îbnu’l-Ezreq fam dikin ku nivîsvanê taybet ê artêşê bixwe jî hebû. Lewra rojekê Nivîsvanê Artêşê Ebû Hekîm serê xulamekî mîr dişkîne, ew jî diçe li cem Nesruddewle gilîyê wî dike. Li ser vê Nesruddewle gazî Ebû Hekîm dike, lê Ebû hekîm diçe xwe davêje mala kurapekî Nesruddewle yê bi navê Mîrzebanê kurê Belaşo.[520]

[516] el-Fariqî, h.b., r.484.
[517] el-Fariqî, h.b., r.484.
[518] el-Fariqî, h.b., 486.
[519] el-Fariqî, h.b., r.486.
[520] el-Fariqî, h.b., r.493.

### 3.2. Pergala Hiqûqê

#### 3.2.1. Qanun û Cezakirin

Derbarê cezakirina sûcdaran agahiyeke wiha di berhema Îbnu'l-Ezreq de derbas dibe: Nivîsvanê Qadî Ebû Murca nameyek şand Mûsilê û dema mîr pê hesiya Murca hat cezakirin. Murca xistin nava bircekê û derîyê bircê li serê seyandin û herwiha heta ku di nava vê bircê de mir, wisa hiştin.[521]

Dema ku di sala 502/1109an de Meyyafariqîn ket destê Sokmanê mîrê xelatê avahiyeke ku ji bo êşkencê hatibû çêkirin û ji bo lêdanê dihat bikaranîn bi fermana Sokmen hat xêrakirin.[522] Lê ev avahî ji kengî ve heye em nizanin, lewra Farîqî derbarê wê de tu agahiyên din nedane.

#### 3.2.2. Qazîtî û Darizandin

Di dewleta Merwanîyan de qazîyan karê darizandinê dimeşand. Qazîyê ku cara yekem Îbnu'l-Ezreq qala wî dike Elîyê kurê Ahmed e û di sala 387/998an de li Meyyafariqînê miriye. Piştî Elîyê kurê Ahmed Hesenê kurê Munzir ku li cem serokê qazîyên Bexdayê xwendibû hat û bû qazîyê Meyyafariqînê û heta sala 400/1010an qazîtîya vir kir. Piştî wî Ahmedê kurê Hamid bû qazîyê vir û sala 410/1020an qazîtîya vir kir.[523]

Qazî ji hêla mîr ve dihatin tayînkirin[524] û dema qazîyekî nû dest bi peywira xwe dikir fermannameya derbarê tayîna wî de di xutbeyê de dihat xwendin.[525]

Di sala 409/1019an de Qadî Ebû Abdullah Huseyînê kurê Seleme jî bû qazîyê Meyyafariqînê û demekê wî û Şêx Ebû Mihemedê kurê Mîxfer qazîtîya vir bi hev re meşand. Piştre Ebû Abdullah Huseyînê kurê Seleme bû qazîyê Amedê jî û qazîtîya

---

[521] el-Fariqî, h.b., r.491-492.
[522] el-Fariqî, h.b., r.491-492
[523] el-Fariqî, h.b., r.462.
[524] Ripper, h.b., r.513.
[525] el-Fariqî, h.b., r.504.

Meyyafariqîn û Amedê bi hev re meşandin.[526] Huseyînê kurê Seleme mehekê li Meyyafariqînê û mehekê jî li Amedê dima û ji bo ku karê darizandin û qazîtîyê bi awayekî birêkûpêk bimeşîne wiha dikir: Qazî çardehê mehê digel maîyeta xwe sazbendên xwe û temamê pêdivîyên xwe ji Meyyafariqînê derdiket, her wiha kesên ku li karê qazîtî û darizandina Amedê jî dinêrtin bi vî awayî heman rojê derdiketin û ber bi wan ve dihatin. Her du alî li navbera Meyyafariqîn û Amedê, li Qasimîyeyê hev didîtin wê şevê li wir diman û roja din kesên ku ji Meyyafariqînê bi qazî re hatibûn dîsa vedigerîyan Meyyafariqînê û Huseyînê kurê Seleme jî bi kesên ku ji Amedê hatibûn re diçû Amedê û mehekê li wir dima. Meha din jî bi vî awayî qazî dîsa diçû Meyyafariqînê.[527]

Piştî mirina Ebû Abdullah Huseyînê kurê Seleme Ebû Murca bû qazîyê Meyyafariqînê. Ebû Murca dadnasekî hêja û baş bû. Qadî Ebû Elî Hesenê Amedî jî, ku wek Îbnî Bexel dihat naskirin, bû qazîyê Amedê. Îbnî Bexel yek ji giregirên Amedê bû. Mirovekî dewlemend bû. Qedr û qîmeta wî li cem Nesruddewle pir bû û li cem rêvebirê dewletê jîcihekî wî yê taybet hebû.[528] Lêbelê Ebû Murca hat kuştin û jîyana wî bi awayekî tund bi dawî bû. Îbnu'l-Ezreq derbarê kuştina wî de van agahiyan dide: Rojekê nivîsvanê Ebû Murca li ser navê Qazî nameyek ji hevalekî xwe re şand Mûsilê û çend pirtûkên fiqhê ku li Meyyafariqînê peyda nedibûn, jê xwestin. Dema mîr bi vê nameyê hesiya gazî qazî kir û ev name jê pirsî, lê qazî got ku haya min jê tune ye. Nivîsvanê qazî rastîya meseleyê got, lê jê bawer nekirin û Qadî Ebû Murca hat kuştin. Piştî kuştina Ebû Murca di sala 436/1045an de Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazî. Tûsî mirovekî zana û hiqûqnas bû.[529]Lê bi teşebûsa Îbnî Cehîr, qazîtî ji Ebû Mensûr hat stendin û qazîyê Amedê Ebû'l-Qasim bû qazîyê Meyyafariqînê. Lewra bavê Ebûl-Qasim Ebû Elîyê kurê Bexel qazîyê Amedê bû û wî qencî bi Fexruddewle kiribû û ew anîbû li welatê Merwanîyan kiribû walî. Paşê Nesruddewle, Qazîyê Amedê Ebû Elî Bexel avêtzîndanê û qismekî pir jî ji malên wî dest danî serê.[530]

---

526 el-Fariqî, h.b., r.479.
527 el-Fariqî, h.b., r.484.
528 el-Fariqî, h.b., r.491-492.
529 el-Fariqî, h.b., r.498.
530 el-Fariqî, h.b., r.504.

Piştî sala 468/1076an peywira qazîtîyê bi destê lijneyekê hat meşandin. Di nav vê lijneyê de Îbnî Amir, Îbnî Zeydan û zarokên Qadî Elîyê kurê Bexel hebûn.[531]

### 3.3. Zanist û Huner

#### 3.3.1. Zanyarî û Teknîk

Gelek alim û zana di welatê Merwanîyan de hebûn. Yek ji van jî Ebûbekirê kurê Sedeqe bû. Li gorî Îbnu'l-Ezreq dema siltan gazî Amîdudewle kir ji bo walîtîya welatê Merwanîyan bidiyê, Ebûbekirê kurê Sedeqe jî pê re çû Esfehanê. Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq ev alîmekî mezin bû. Lewra li medreseyên Esfehanê bi el-Muşta re minazere kir û navûdengê wî belav bû.[532]

Ebû'l-Qasim Huseyînê kurê Elîyê Mexribî bû wezîrê Nesruddewle[533] û li gorî Îbnî Xeliqan Ebû'l-Qasim xwedî dîwan bû û gelek berhemên wî yên navdar hebûn.[534]

Di dewleta Merwanîyan de girîngî bi pirtûkan, komkirina wan û avakirina pirtûkxaneyan dihat dayîn. Em di berhema Îbnu'l-Ezreq de rastî agahîyeke derbarê sazkirina pirtûkxaneyên serbixwe de nayên. Lêbelê li gorî agahiya ku Îbnu'l-Ezreq dide di dema Nesruddewle de hinek fealîyetên komkirina pirtûkan hatine kirin. Îbnu'l-Ezreq vê agahiyê wiha dide: Şêx Ebû Nesr Menazî ku karê nivîsvanîya dewletê dimeşand gelek pirtûk kom kirin û ji van pirtûkan hinek li Meyyafariqînê hiştin hinek jî birin Amedê. Ev pirtûk li her du bajaran di mizgeftekê de bi cih kirin ku ev pirtûk hêja dimînin û bi navê Menazî tên zanîn.[535]

Hinek agahiyên derbarê çêkirina alavên teknîkî de di berhema Îbnu'l-Ezreq de wiha derbas dibe: Di nava seyrangeha Nesriyeyê ya ku Nesruddewle ava kiribû de

---

[531] el-Fariqî, h.b., r.515.
[532] el-Fariqî, h.b., r.527.
[533] el-Fariqî, h.b., r.485.
[534] Îbnî Xeliqan, h.b., C.1., r.177
[535] el-Fariqî, h.b., r.486.

bi saya dolabekê av ji cem dihat kişandin û bi vê avê baxçe dihatin avdan û hewz dihatin dagirtin.[536]

Nesruddewle di mizgefta Meyyafariqînê de bi pereyên xwe yên şexsî binqamek[537] çê kir.[538] Bi saya vê binqamê gengeşîya di nav gel de a ji bo avê çareser bû.[539]

### 3.3.2. Helbest

Em ji gotinên Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku mîrên Merwanîyan bi taybetî jî Nesruddewle gelek qîmet daye helbestvanan. Bi taybet li cem Nesruddewle qîmetê helbestvanan pir bû. Helbestvan Tilhamî hatiye cemê û pesnê wî û wezîrê wî di helbestên xwe de daye. Helbestvanên bi navê Ebû'r-Rizayê kurê Tarif, Îbnî Sewdawî û Îbnî Qadirî jî hatine û ketine bin xizmeta Mîr Nesruddewle.Wekî din jî helbestvanên gelek welatan di gelek helbestên xwe de pesnê Nesruddewle dane. Helbestvan Sarî el-Dela di gelek helbestên xwe de pesnê Nesruddewle daye.[540]

Dema mîrek dimir helbestvan li wir amade dibûn û zêmar li ser mîr dixwend. Dema Mîr Nesruddewle û Mîr Nîzameddîn mirin, berî ku wan defin bikin helbestvanan li ser wan zêmar xwendin.[541]

Herwiha di qesrên Merwanîyan de medhîyeyên bi zimanê erebî dihatin gotin.[542]

Di dema Nesruddewle de helbestvanekî Melezgirdî bi navê Şêx Ebû Nasir ku Îbnu'l-Ezreq pir pesnê wî dide û dibêje mirovekî baş û helbestvanekî jêhatî ye, karê

---

536 el-Fariqî, h.b., r.489.
537 Derbarê binqamê de di Burahan-i Kati de ev agahî hene: Binqam peyveke farisî ye. Bi gelemperî ji bo tasik an jî qedehê tê bikaranîn. Lê bêtir cureyekî tasê ye ku bêtir li cem gundîyên Hindê tê naskirin. Berê bi vê av dihat parvekirin. Binê vê ê qul bû û dema dora yekî dihat ji bo ku rez û bexçeyê xwe av bide diavêt nav avê û heta tasik tije dibû dor ya wî kesî bû. Bnr. Beysanoğlu, h.b., C.1., r.199.
538 el-Fariqî, h.b., r.491.
539 Beysanoğlu, h.b., C.1., r.199.
540 el-Fariqî, h.b., r.490.
541 el-Fariqî, h.b., r.505, 517.
542 Bedr-Khan, *Litterature*, s.3. Vgh. Ripper, h.b., r.515.

nivîsandinê dimeşîne.[543] Ev jî nîşan dide ku mîrên Merwanîyan qedr û qîmet dane helbestvanan. Li gorî agahiyên ku Îbnu'l-Ezreq dide nivîsvanê Qadî Ebû'l-Murca Ebûbekir jî helbesetvanekî bi navê Îbnu'l-Fatirî bû.[544]

Rojên cejnan li pêşberî mîr digel rêvebirên dewletê û kesên ku ji dewletên din dihatin helbestvan jî amade dibûn. Roja cejnê ya sêyan qasirê xelîfeyê Bexdayê û yê Rûmê dema hatin cem Nasrûdewle helbestvan jî li wir amade bûn.[545]

Wexta welatê Merwanîyan ketibû destê walîyên Selçûqîyan, demekê ev welat bê walî ma. Gelek giregirên bajêr dixwestin ku dîsa walîyekî Selçûqî were û vî welatê birêve bibe. Lêbelê Helbestvanekî bi navê Îbnî Esed hinek xwendekar û dikandar li xwe civandin û welat parast û Meyyafariqîn radestî Nasiruddewle Mensûr kir.[546] Ev helbestvan rojekê li Heranê çû cem siltanê Selçûqî jê re helbestek xwend. Lê dema ji siltan re gotin ku ev ew helbestnavê ku gazî mîrê Merwanî kir û Meyyafariqîn radestî wî kir. Bi fermana siltan hat kuştin.[547]

### 3.4. Artêş û Ewlehî

#### 3.4.1. Artêş

Di dewleta Merwanîyan de artêşeke birêkûpêk ku her tim amade hebû û pêdivîya vê artêşê ji alîyê dewletê ve pêk dihat. Ji bilî vê artêşê şervanên ku bi dildarî ji bo welêt şer dikirin jî hebûn.[548] Bingeha artêşa Merwanîyan ji eşîreta Humaydî û Başnewîyan pêk dihat. [549]

Em ji pirtûka Îbnu'l-Ezreq têdigihîjin ku artêş di bin fermana fermandarekî giştî de ye. Lewra dema Nesruddewle mir wezîr serokê artêşê şand mala Mîr

543 el-Fariqî, h.b., r.498.
544 el-Fariqî, h.b., r.498.
545 el-Fariqî, h.b., r.476.
546 el-Fariqî, h.b., r.529-530.
547 el-Fariqî, h.b., r.531.
548 Yûsuf, h.b., C.2., r.125.
549 M.S.Lazarev&Ş.X.Mihoyan&yên din, h.b., r.63.

Nîzameddîn û gazî wî kir.[550] Herwiha em dizain ku Îbnî Felyusê xulamê Şêro jî berpirsiyarê karê asayîşê bû.[551]

Artêşa Merwanîyan ji kurdan û wan gelên din ên wek ereb, suryanî, ermen, turkmen û gurcîyan pêk dihat.[552]

Di dema Mumehhîduddewle de esilzadeyekî gurcî ji ber qralê gurcî revîyabû û digel girseya pê re hatibû ketibû bin xizmeta mîrê Merwanî.[553] Leşkerên gurcî yên di artêşa Merwanîyan de cih digirtin ev kes bûn.

Em ji agahiyên Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku dahatîya hinek cihên weqifkirî ji leşkeran re hatiye veqetandin. Lewra Bazirganekî bi navê Îbnu'l-Behat gundekî bi navê Benînûh dikire û ji bo leşkeran weqif dike.[554]

### 3.4.2. Çek

Em ji berhema Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku di dewleta Merwanîyan de wek çekekê gurz hatiye bikaranîn. Lewra dema Mîr Ebû Elî dikujin Ebû Tahir Yusufê kurê Dimne bi gurzê li serê wî dixe.[555]

Leşkerên dewleta Merwanî tîr bi kar anîne heta di nav leşkerê Merwanî de komek tîravêjên gurcî hene. Ev tîravêj ji gurcîyan pêk tên û di dema desthilatdarîya Şêro ya Meyyafariqînê de bi fermana Îbnî Felyûsê kurê Şêro ev leşkerên gurcî bi tîrên xwe gelek kesan dikujin.[556]

---

550 el-Fariqî, h.b., r.505
551 el-Fariqî, h.b., r.466.
552 Yûsuf, h.b., C.2., r.127.
553 el-Fariqî, h.b., r.471.
554 el-Fariqî, h.b., r.500.
555 el-Fariqî, h.b., r.452.
556 el-Fariqî, h.b., r.471.

### 3.5. Avahîsazî û Bajarvanî

#### 3.5.1. Sûr

Sûrên Meyyafariqînê di serdema gelek dewletan de li ser pêyan mane. Di dema Merwanîyan de jî gelek cihên sûran ji nû ve hatin çêkirin. Birayê Bad Ebû Fewaris, Ebû Mensûr Mumehhîduddewle, Ebû Elî cihên xerabe yên sûran restore kirin û navê xwe li ser van sûran nivîsand. Nesruddewle û Nîzameddîn jî gelek sûr û birc dan çêkirin. Bi vî awayî sûrên Meyyafariqînê tamîreke baş dîtin.[557]

Îbnu'l-Ezreq dide zanîn ku cara pêşî birayê Bad Ebû Fewaris di nava du salan de cihên xerabe yên sûrên Meyyafariqînê çê kirin û herwiha navê wî li ser çend cihên sûran nivîsandiye.[558]

Piştî ku Amed ket destê kurê Dimne wî jî sûr qamekî bilindtir kirin û ew cihê ku kurê Dimne çê kirine hêjî dîyar e.[559]

Nesruddewle jî sûrên Meyyafariqînê cihên ku ketibûn çê kirin û nû kirin.[560]

Mumehhîduddewle gelek deverên sûrên Meyyafariqînê çê kirin. Ji alîyê hundir ve li bîst û du cihan û li gelek deverên hundir jî navê wî nivîsandiye. Sih û tiştek deverên sûran wî çê kirine. Dîsa birca ber derîyê navîn xerab bûbû Mumehhîduddewle ev der çê kir. Derîyê Qulfayê ku di navbera du bircan de ye jî Mumehhîduddewle vekir.[561] Îbnu'l-Ezreq dibêje ku ji alîyê hundirê sûran ve neh dever û ji derve ve jî sih û tiştek dever ji alîyê Nesruddewle ve hatine çêkirin û Fariqî dibêje min bi xwe ev jimartine. Herwiha bi taybetî ji bo mesrefa çêkirina sûran weqif hatibûn çêkirin. Lewra Nesruddewle ji bo sûran gelek gund û cihên din weqif kiribûn. Mesela Hemama Eqabe û Hemama nû ku li deşta Şûrçanê hatibû çêkirin ji bo sûran hatibûn weqifkirin.[562]

---

[557] el-Fariqî, h.b., r.498.
[558] el-Fariqî, h.b., r.450.
[559] el-Fariqî, h.b., r.464.
[560] el-Fariqî, h.b., r.478.
[561] el-Fariqî, h.b., r.466.
[562] el-Fariqî, h.b., r.498.

Wextê Îbnu’l-Ezreq qala serdema Mîr Nîzameddîn dike dibêje di dewra Mîr Nîzameddîn de gelek karên avahîsazîyê herî baş li Meyyafariqînê hatin kirin. Mîr Nîzameddîn gelek deverên sûrên Meyyafariqîn û Amedê bilind kirin. Li ser van deveran hem ji alîyê hundir û hem jî ji alîyê derve navê hatiye nivîsandin.[563]

### 3.5.2. Birc

Di sala 461/1070yî de Mîr[564] Nîzameddîn tebeqeya çaran avêt ser birca mîr a li Meyyafariqînê. Berpirsiyarê çêkirina vê bircê Qadî Ebû Nesr Hîbetullahê kurê Şazî bû û mesrefa wê jî siltan ji kîsî xwe da.[565]

Di dema Mîr Nîzameddîn de li ser derîyê hundirê bajêr du birc hatin çêkirin li ser van bircan dûrbîn û eynik hene. Ev birc di bin berpirsiyarîya Ebû'l-Hesen Ehmedê kurê Bexel de hatin çêkirin û li ser wan navê wî nivîsandiye.[566]

### 3.5.3.Keleh

Nasrûdewle kelehek di navbera sînorê xwe û Senasînayê de bi pereyê xwe yê şexsî ava kir. Ev bû bend û sînor û welatê Merwanîyan li dijî Senasînayê parast.[567]

### 3.5.4. Qesr

Piştî ku rêvebirîya Amedê ket destê kurê Dimne li rojhilatê bajêr li alîyê çemê Dijleyê qesrek ava kir û li alîyê çem derîyek vekir û navê vî derî kir Derîyê Avê.[568]

---

563 el-Fariqî, h.b., r.516.
564 Di eslê metnê de siltan hatiye nivîsandin. Mimkun e ji ber ku berê Nîzamilmilk bernavkê "Siltanê Mîran" dabû Mîr Nîzameddîn ev peyv hatibe bikaranîn. Bnr.el-Fariqî, h.b., r.505; el-Xûlî&Baluken, h.b., jêrenot:3, r.515.
565 el-Fariqî, h.b., r.515.
566 el-Fariqî, h.b., r.515.
567 el-Fariqî, h.b., r.500.
568 Dibe ku ev ew derîyê ku niha wek “Yeni Kapi/Derîyê Nû” tê binavkirin be. Bnr. Bozarlan, h.b., jêrenot, r.95.

Piştî ku Nesruddewle Meyyafariqîn ji Şêro stend û xist bin desthilatdarîya xwe di sala 403/1013yan deli rex birca hikûmdarîyê qesrek çê kir. Pereyekî pir li vê qesrê xerc kir û qesreke gelek sipehî ava kir. Dîwar û qarçikê wê bi nexşê zêrîn xemilandin.[569]

**3.5.5. Pir**

Merwanîyan bacên ku piranîya wan ji karê bazirganîyêbidest dixistin ji bo çêkirina rêyan xerc dikirin. [570]

Di serdema Mîr Ebû Elî de dema Ebû Elî ji Meyyafariqînê ber bi Amedê ve diçû Nesruddewleyê birayê Ebû Elî jî pê re bû. Hingê baran barî û Çemê Hevê rabû û nikaribûn derbasî alîyê din bibin. Ancax roja din bi zorê di nav av û herîyê de derbasî alîyê din bûbûn. Li ser vê hêja wê rojê Nesruddewle ji xwe re gotibû ku rojekê Xweda mîrîtîyê bike nesîbê min ji bo ku gel di ser re derbas bibe ez ê pirekê li vir ava bikim.[571] Piştî ku Îbnû'l-Bexl bû qazîyê Amedê Nesruddewle jê xwest ku pirekê li ser çemê Hewê çê bike û di sala 431/1040î de li vir pirek hat çêkirin. Li ser vê pirê navê kurê mezin ê Mîr Nesruddewle û mirovekî ji gelê Amedê bi navê Îbnî Uqeylî û agahiyên derbarê qazîtîya Ebû Elî de hatin nivîsandin.[572] Ev pira ku Îbnu'l-Ezreq qala wê dike li ser rêya Farqîn û Diyarbekirê ye û bi 12 kîlometran dûrî bajêr e û li ser Çemê Enbarê ye. Ev pir piştre xerab bûye, di sala 620/1223yan de bi awayekî xweşik hatiye tamîrkirin û wisa xuya ye ku ev nivîsên li serê ku Îbnu'l-Ezreq qala wan dike hingê xerab bûne.[573]

Nesruddewle li seyrangeha xwe ya Nesriyeyê li ber girê Benanê pireke xweşik û zexm çê kir.[574]

Nîzameddîn di sala 472/1080yî de li rojhilatê Amedê li ser Çemê Dîjleyê pirek çê kir. Temamê mesrefa vê pirê ji pereyên xwe yên şexsî dan û berpirsiyarîya

[569] el-Fariqî, h.b., r.476.
[570] Ripper, h.b., r.468.
[571] el-Fariqî, h.b., r.461.
[572] el-Fariqî, h.b., r.492.
[573] Beysanoğlu, h.b., C.1., r.200.
[574] el-Fariqî, h.b., r.489.

çêkirîna wê Wezîr Ebû'l-Fadl Îbrahîmê kurê Enbarî kir.[575] Navê vê pirê di nav gel de wek “Pira Dehderî”[576] tê zanîn. Lê ev pir berê jî hebû. Di sala363/974an de Ji hêla Împeretorê Bîzansê Juannes ve hatibû xêrakirin û Mîr Nîzameddîn ji nû ve çê kir. Îbnu’l-Ezreq dîroka çêkirina wê wek 472/1080 daye[577] lê ji nivîsa ser pirê tê famkirin ku ev pir di sala 457/1065an de çê bûye.[578]

### 3.5.6. Qenalên Avê

Di rêvebirîya Merwanîyan de qenalên avê carinan bi destê mîrekî, [579] carinan bi pereyên weqfê û carinan jî bi piştgirîya kesên dewlemend dihatin çêkirin**.** Li gorî Îbnu’l-Ezreq ji serêkanîyê[580] sê qenalên avê dihatin nava Meyyafariqînê.[581]

Di sala 403/1013yan de piştî ku Nesruddewle qesreke nû li Meyyafariqînê ava kir ji serê kaniyê qenaleke avê kişand qesrê û li wir hemam û hewz çê kirin.[582] Muteweliyê[583] weqfan İbn Şelîta ji mal û tiştên weqfan gelek pere berhev kiribûn û bi wan pereyan ji serê kanîyê qenaleke avê kişand nava Meyyafariqînê. Gelek pere li vê qenalê xerc kirin û qenaleke pir zexm çê kir. Ev qenal di binê Mizgefta Serêkanîyê re derbas dibû û ji alîyê rojhilat ve di nîvê Rabadê diçû û ji wir digiha Derîyê Avê û binê birca mîr. Ji wir jî diçû digiha derîyê bircek ji ya derîyê Qulfayê û bi vî awayî av derbasî rojavayê bajêr dibû.[584]

Di serdema Nesruddewle de bazirganekî bi navê Ebûbekir Mihemedê kurê Cerî hebû, wî jî qenaleke avê kişand nava Meyyafariqînê. Ebûbekir ji alîyê rojava ve qenal anî ber sûran û ji wir jî derbasî baxçeyê sûra biçûk kir. Heta bi vir pêncî hezar dînar mesref li vê qenalê kir. Piştre çû cem mîr ji bo ku sûrê qûl bike destûr jê xwest,

---

575 el-Fariqî, h.b., r.516.
576 Bi berfirehî ji bo taybetmendîyê vê pirê. Bnr. Beysanoğlu, h.b., C.1., r.221-222.
577 el-Fariqî, h.b., r.516.
578 Beysanoğlu, h.b., C.1., r.217.
579 el-Fariqî, h.b., r.476.
580 Xuyaye ku Serêkanîyê kanîyeke bi navê kanîya mezin ku niha jî li bakurê bajêr dimîne ye.Bnr. Beysanoğlu, h.b., C.1., r.201.
581 el-Fariqî, h.b., r.499.
582el-Fariqî, h.b., r.476.
583 Kesê ku rêvebirîya weqfekê teslîmî wî bûye. https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng. (01/07/2016)
584 el-Fariqî, h.b., r.499.

piştî mîr destûr dayê sûr qûl kir û qenal bir nava her du sûran û ji wir jî bir serê kanîyê. Piştre ev qenal li nava bajêr gerand. Bir mizgeft û Çarşiya Qubbeyê. Ebûbekir ev qenal di ber mala xwe re derbas kir lê jê av nekişand mala xwe. Dema sedema vê jê pirsîn wiha got:"Weleh ez ji vê qenalê avê nakişînim mala xwe. Ez vê avê bikişînin mala xwe dê bibêjin Ebûbekir, ev av ji bo mala xwe û feyda xwe aniye."[585]

### 3.5.7. Seyrangeh

Nesruddewle ji bo xwe, malbat û pismamên xwe seyrangeheke bi navê Nasirîyeyê li qiraxa çem ava kir. Di nava vê seyrangehê de jî qesreke xweşik, çarşî, hemam çê kirin û ji bo her kurekî xwe û kurapekî xwe xanîyek ava kir.[586]

### 3.5.8. Qubbe

Li gorî agahîya ku Îbnu'l-Ezreq dide piştî ku birayê Bad Ebû'l-Fewaris hat kuştin li cihê ku hat binaxkirin qubbeyek hatiye çêkirin û herwiha piştî vê li wir gelek qubbeyên din hatin çêkirin û ji vir re jî qubbeyên Ebû'l-Fewaris tê gotin.[587]

### 3.5.9. Mizgeft

"Nesruddewle di sala 414/1024an de minareya mizgefta Rabadê çê kir.[588] Di cihê vê mizgefta ku Îbnu'l-Ezreq qala wê kiriye de îro tiştek nemaye.[589]

Nasrudewle di sala 423/1033yan de Mizgefta Muhdeseyê[590] ava kir û temamê mesrefa vê mizgeftê ji pereyên xwe yên şexsî dan û herwiha hinek weqif jî ji bo vê mizgeftê çê kirin.[591]

---

585 el-Fariqî, h.b., r.499-500.
586 el-Fariqî, h.b., r.489.
587 el-Fariqî, h.b., r.452.
588 el-Fariqî, h.b., r.482.
589 Beysanoğlu, h.b., C.1., r.196.
590 Muhdese leşkergeheke li derveyê Meyyafariqînê bû. Beysanoğlu, h.b., C.1., r.198.
591 el-Fariqî, h.b., r.488.

### 3.5.10. Nexweşxane

Nesruddewle di sala 414/1024an de bi pereyên xwe yên şexsî nexweşxaneyek ava kir.[592] Îro li cihê vê nexweşxaneyê tiştek nemaye.[593]

## 3.6. Jîyana Aborî û Bazirganîyê

### 3.6.1. Aborî

Berî desthilatdarîya Merwanîyan nêzî nîv sedsalî welatê Merwanîyan di bin deshilatîya Hemdanîyan de bû û di vê serdemê de ev welat di warê çandinî, sen'et û aborîyê de bi pêş neketibû lê di dewra Merwanîyan de çiqas çû welat bi pêş ket. Sedemên sereke yên vê pêşketinê jî îstîqrar û aşîtî bûn. Lewre piştî damezirandina dewletê ji sala 383/993yan heta dawîya 417/1026an ango sih û pênc salan herwiha ji sala 427/1036an heta sala 476/1083yan ango 49 salan şer û pevçûn di navbera Merwanîyan û tu mîrnişîn û dewletan de çê nebûn. Ev şert û merc bûn sedemên pêşketina di warê sen'et, aborî, çandînî û bazirganîya li welatê Merwanîyan.[594] Welatê Merwanîyan ji hêla çandinî, madenvanî û pîşesazîyê ve gelekî bi pêş ketibû û dewlemend bûbû.[595]

Di serdema Mumehhîduddewle de rewşa Merwanîyan a aborî pir ne baş e. Bi taybetî ji ber xelaya ku di vê serdemê de didome bihayê tiştan gelek zêde dibe heta li gorî neqla Îbnu’l-Ezreq di serdema Mumehhîduddewle de ji be rxelayê elbek genim diçe deh zêran.[596] Lê di serdema Nesruddewle de hem ji bo pêşketina bajêr û hem jî ji bo sîyaseteke biîstîqrar ku Nesruddewle dimeşand di warê aborî û bazirganiyê de dewlet bi pêş dikeve. Di welêt de aşîtî û aramî hebû û mîr bi gel re bi edalet tevdigerîya[597] û di serdema Nesruddewle de bajarê Meyyafariqînê bipêş ketibû û ji

---

[592] el-Fariqî, h.b., r.482.
[593] Beysanoğlu, h.b., C.1., r.196.
[594] Yûsuf, h.b., C.2., r.177.
[595] Biçer, *Kürtler*, r.121.
[596] el-Fariqî, h.b., r.469.
[597] el-Fariqî, h.b., r.478.

ber vê yekê jî ji her derê bezirgan û mirovên din dihatin vir.[598] Ev pêşketina aborî bi taybetî li bajarê Meyyafariqînê derdiket pêş, heta em dikarin bibêjin ku gelê Amedê ji vê rewşa Meyyafariqînê ku temamê pêşketina aborî û bazirganîyê lê çê bûbû aciz dibûn û dixwestin têkilîya xwe ji Meyyafariqînê bibirin û xweser bibin.[599]

Dîsa dema Îbnu'l-Ezreq qala îstîqrar û dadmendîya serdema Nesruddewle dike dibêje di dewra Nesruddewle de zilm li kesî nebûye û ji xeynî Şêx Ebûbekirê kurê Cerî dewletê dest nedaniye ser malê kesekî. Sedema destdanîna li ser malê Şêx Ebûbekirê kurê Cerî ev bû: Şêx Ebûbekir dostê hikûmdarê Senasîna bû û ji mîr re hat gotin ku Şêx Ebûbekir têkilî bi hikûmdar re daniye û dixwaze bajêr radestî wî bike. Bi fermana Nesruddewle avêtin ser mala wî û gelek çek di mala wî de hatin girtin. Li ser vê dest danîn ser mal û çekên wî. Bahayê mal û çekên wî ku dest danîbûn ser, çar sed hezar dînar bûn. Agahî şaş dabûne mîr û ev misadere pêk hat, naxwe heta niha nehatibû dîtin ku Nesruddewle yek dirhemek jî ji kesekî sitendibû.[600]

Di serdema Nesruddewle de gelek pere hatin xerckirin û di nav bexçeyê Reîs Elîyê kurê Mensûrê kurê Kek de kargehek hat avakirin.[601]

### 3.6.2. Bazirganî

Cihê Merwanîyan ê stratejîk ji warê bazirganîyê ve hinek avantaj bi xwe re anîbûn. Meqdisî ku di dewra Merwanîyan de jiyaye ev taybetî wiha aniye ziman: Welatê Merwanîyan wê demê di navbera Bîzansîyan û paytexta Ebasîyan de bû û di navbera Rojhilat û Asyaya Biçûk de wek pirekê bû. Bajarê Amedê li ber qeraxa Dîjleyê bû û ev der navendeke aborîyê bû û di ser vir re tiştên welatê kurdan û welatê Rojhilat ên dindiçûn Asyaya Biçûk û di heman demê de jî ev der ji bo tiştên ku ji welatên Bîzansîyan tên wek Çarşîyekê bû û di sedsala IV/X'an de malê ku ji Bîzansê dihat di ser Amedê re diçû Çarşîyên Bexdayê.[602] Qumaşekî ku di sala 1940î de li

---

[598] el-Fariqî, h.b., r.478
[599] Ripper, h.b., r.294.
[600] el-Fariqî, h.b., r.500-501.
[601] el-Fariqî, h.b., r.501.
[602] Bnr.Muhammed bîn Ahmed el-Meqdisî, *Ahsenu'l-Teqasîm fî Merîfetî'l-Eqalîm*, r.140. Vgh.Yûsuf, h.b., C.2., r.47-48.

Mîlanoyê derket holê û navê Nesruddewle li ser nivîsandî bû vê rastîyê nîşan dide.[603] Bajarê Meyyafariqîn û Amedê li ser rêyên bazîrganî yên navneteweyî bûn û sedema sereke ya vê pêşketina aborî ev bû. Mesela Ebû'l-Ala el-Maarrî dema ji Bexdayê vedigere welatê xwe yê li bakurê Surîyeyê digel dûr jî bû ji ber arambûna wê ya ji hêla ewlehîyê rêya Diyarbekirê tercîh dike.[604]

Di welatê Merwanîyan de ji bo çarşî û bazaran cihekî taybet heye. Îbnu'l-Fariqî di berhema xwe de hem qala çarşîya Meyyafariqînê û hem jî ya Amedê dike û wiha dibêje: Rêzgirtina li çarşîya qumaşfiroşan bûbû eded û kesekî nikaribû bi siwarî di navê re derbas bibe. Heta rojekê kurapekî mîr ê nêzî wî dema di vir re derbas dibe kesên li vir bertekê nîşan didin û cihê ku hespê wî lewitandiye pê didin paqijkirin.[605] Dîsa Em ji gotinên Fariqî fam dikin ku li Amedê çarşîya zad û zexîreyan bi awayekî birêkûpêk dihat îdarekirin û serokê vir hebû û ev kes ji girêgirên bajêr kesekî bi navê Evdulber bû.[606] Navên sê çarşîyên Meyyafariqînê jî di berehema Îbnu'l-Ezreq de derbas dibin. Yek jê çarşîya qumaşfiroşan, yek çarşîya Qubbe û ya din çarşîya Etaran e ku dikana Hekîm Ebû Salim li vir bû.[607]

Dema Îbnu'l-Ezreq qala xweşî û aramîya di serdema Nesruddewle de dike qala bazîrganekî bi navê Îbnu Behat dike bê çawa di rojekê de pênc sed dînarên Armanosî[608] kar kirine. Fariqî vê bûyerê wiha neqil dike:"Li Meyyafariqînê simsarekî bi navê Îbnu'l-Behat hebû. Rojekê karwanek hat bajêr û Îbnû'l-Behat hemû malê bi wan re kirî. Di heman rojê de karwanekî din hat û Îbnu'l-Behat ev mal firote vî karwanî û ji vê bazara ku kirî pênc sed dînarên Armanos kar kir. Li ser vê Mîr Nesruddewle gazî wî kir. Îbnu'l-Behat çû hizûra mîr û dema mîr rastîya vê bûyerê jê pirsî û Îbnu'l-Behat tişta ku mîr bihîstibû tesdîq kir û pere danîn ber mîr. Li ser vê mîr wiha got:"Bi xwedê min ne ji bo ku ez van pereyan ji te bistînim gazî te kir. Min xwest ez bizanim ka rast e ku mirovek li welatê min di rojekê de pênc sed dînarî kar dike." Mîr sûnd xwar ku ez tiştekî ji van pereyan nabim û li ser vê Îbnu Behat jî sûnd xwar ku ez van pereyan nexim nav malên xwe. Li ser vê Îbnu'l- Behat gundekî li

---

603 Ripper, h.b., r.15.
604 Gabriel, *Voyages archeologgiques*, s.89. Vgh.Ripper, h.b., r.503.
605 el-Fariqî, h.b., r.456.
606 el-Fariqî, h.b., r.460
607 el-Fariqî, h.b., r.122, 499, 518.
608 Pereyên ku ji alîyê Bîzansîyan ve hatine çapkirin. Bnr.Yûsuf, h.b., C.2., r.114.

derûdora Amedê ku li ser keleha Fetrasa ya bi navê Benînûh kirî û ji bo leşkerên ku li Akil [609] û Yemanî û Cebarêdiman weqif kir.[610]

### 3.6.3. Bac

Li welatê Merwanîyan baca hinek tiştan dihat stendin. Ev bac ji bo rez û bexçeyên li dora bajêr, ya mêweyan, zebze û dexil, êzing û komirê bû.[611] Ji xeynî van dîsa baceya aşarê hebû. Lewra Îbnu'l-Ezreq dibêjê piştî ku siltanê Selçûqî hat Meyyafariqînê baca aşarê li ser gel rakir.[612]

Em dizanin di serdema Merwanîyan de karê tehsîldarîyê jî heye, lewra Îbnu'l-Ezreq qala kesekî bi navê Mihemed Ebû'l-Hesen dike ku tehsildarê[613] weqfan e.[614]

### 3.6. 4. Pere

Di dewleta Merwanîyan de dirhem û dînar dihatin bikaranîn. Di heman demê de bi taybetî jî li cihên ji bajaran dûr. Bi awayê pevguherandina tiştan bazar dihat kirin. Lêbelê bikaranîna dirheman bêtir berfireh bû. Dînarên zêr bêtir di bazirganî û di têkilîyên nav dewletê û derveyê dewletê de dihatin bikaranîn.[615] Mesela dema Ebû Elî keça Sadûdewleyê Hemdanî xwest du sed direhem jê re şand"[616] û dema Melik Ezîzê Buweyhî hat cem mîrê Merwanî, Nesruddewle bi awayekî xweşik ew pêşwazî kir û bîst hezar dînar danê.[617]

Pereyên Merwanîyan ku hatine çapkirin di mûzeya Brîtanyayê ya li Londonê de hene. Ahmed Etiye jî qala pereyên ku di serdema Ebû Elî de li Cizîrê di sala

---

609"Akil" bajar û keleheke kevin e û nezî Amedê ye niha navê wê "Eğil" e. el-Xûlî&Baluken, h.b, Jêrenot: 4, r.500.
610 el-Fariqî, h.b., r.500.
611 el-Fariqî, h.b., r.526.
612 el-Fariqî, h.b., r.530.
613 Tehsîldar, kesê ku bac û dahatan berhev dike ye.
https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng. (01/07/2016)
614 el-Fariqî, h.b., r.503.
615 Yûsuf, h.b., C.2., r.105.
616 el-Fariqî, h.b., r.459.
617 el-Fariqî, h.b., r.491.

385/995an de û di serdema Nesruddewle de li Xelatê di sala 402/1011an de hatine çapkirin dike û dibêje: “Ji bilî van deveran li Dineyser, Meyyafariqîn û Amedê jî pere dihatin çapkirin.” [618]

Gelek caran rêvebirên dewletê ji bo ku gel û leşkeran bikişînin alîyê xwe devê xezîneya dewletê vedikirin û mal û pere li leşkeran belav dikirin. Li gorî neqla Fariqî dema Xoce Ebû'l-Qasim ji bo ku Mîr Ebû Nasir biçe rêvebirîya Meyyafariqînê ji Şêro bistîne û herwiha ji bo ku gel piştgirîya wî bike gelek mal û pere li wan belav kirin.[619] Di heman demê de Şêro jî ji bo gelê Meyyafariqînê piştgiriya wî bikin mal li wan belav kir.[620]

### 3.7. Bîr û Bawerî

#### 3.7.1. Dîn û Mezheb

Em ji gotinên Îbnu’l-Ezreq derdixin ku ji bilî misilmanan di nava dewleta Merwanîyan de mensûbên wan dînên din hebûn û herwiha li hemberî wan sîyasteke baş dihat meşandin. Di rêvebirîya dewletê û karên din ên cûrbecûr de gelek kes ji mensûbên dînên din hebûn. Wezîrê Nasiruddewle Mensûr fileh bû. Ev wezîrê fileh Ebû Salim û hevsera wî Ferîhaya keça Filîstîn di qesra Nasiruddewle Mensûr de bûn û qîmeta wan pir bû. Herwiha temamê karûberên dewletê di destê Ebû Salim de bûn.[621] Di nav artêşa Merwanîyan de ji xeynî misilmanan leşkerên gurcî jî hebûn[622] û ji serdema Ebû Elî û vir ve karên Weqfan jî bi destê mirovekî fileh ê bi navê Îbnî Şelîta dihatin meşandin.[623]

Fexruddewleyê ku li ser navê siltanê Selçûqî welatê Merwanîyan bi rê ve dibir di sala 478/1086an dehat Meyyafariqînê û dêra Ûbadê kir mizgeft. Piştre dîsa filehan pere dan û ev der dîsa kirin dêr. Amîdulmulk Ebû Elî Belhîyê ku siltan walîtîya welatê Merwanîyan dabûyê rojekê dema dengê naqosê kir, aciz bû û bi

---

[618] Ahmed Etiye, *el-Qamûsu’l-Îslamî*, C.2., r.88,267. Vgh. Yûsuf, h.b., C.2., r.112.
[619] el-Fariqî, h.b., r.470.
[620] el-Fariqî, h.b., r.471.
[621] el-Fariqî, h.b., r.518.
[622] el-Fariqî, h.b., r.471.
[623] el-Fariqî, h.b., r.499.

fermana wî ev dêr dîsa bû mizgeft.[624] Herwiha ji gotinên Îbnu'l-Ezreq tê famkirin ku azadîya filehan a dînî piştî ku Meyyafariqîn ket destê Selçûqîyan ji holê rabû heta dengê naqosa wan hat qedexekirin bi taybetî jî di dema walîyê selçûqî Ebû Elî Belxî de.[625]

Hebûna Buweyhîyên şiî yên li Iraqê bêtir Merwanî aciz dikirin lewra heta ku Selçûqî hatin vê herêmê şêst salî li dijî Buweyhîyên şiî, filehên Rûm û ermenîyan wan berpirsiyarîya mezhebê sunîtîyê dikirin.[626]

Mezhebê Merwanîyan ê fermî şafiîtî bû. Piştî ku Merwanîyan desthilatdarîya herêmê xist destê xwe mezhebê Şafiîtîyê belav kirin. Gelek alimê Şafiî hatin li welatê Merwanîyan bi cih bûn.[627] Bi taybetî bi piştgirîya xelîfeyê Ebbasî şafiîtî li welatê Merwanîyan belav bû.[628]

Di serdema Nesruddewle de di sala 436/1045an de Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazîyê Meyyafariqînê û di heman demê de jî berpirsiyarîya weqfan jî di destê wî de bû.[629] Di serdema xwe de Tûsî alimekî mezin ê mezhebê şafiî bû.[630]

Ebû Evdillah el-Huseyînê kurê Ehmedê kurê Seleme malikî bû[631] û di serdema Nesruddewle de qazîtîya Meyyafariqînê û Amedê bi hev re dimeşand. Mehekê li Amedê û mehekê li Meyyafariqînê dima.[632]

Di serdema Merwanîyan de li welatê wan mezhebê Henîfî pir tuneye lê piştî ku Selçûqî hatin vê herêmê mezhebê henefî li vir belav bû. Bi taybetî di belavbûna mezhebê Henîfî li vê herêmê de bandora mîrnişîna Artuqîyan pir e.[633]

---

[624] el-Fariqî, h.b., r.524.
[625] Yûsuf, h.b., C.2., r.172, el-Fariqî, h.b., r.524.
[626] Tufantoz, h.b., r.125.
[627] Yusuf Baluken, *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar,* Teza Lîsansa Bilind a neçapbûyî", Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, r.35.
[628] Biçer, Kürtler, r.122.
[629] el-Fariqî, h.b., r.498.
[630] Baluken, *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar,* r.36.
[631] Baluken, *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar*, r.42.
[632] el-Fariqî, h.b., r.479.
[633] Baluken, *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar,* r.42.

### 3.7.2. Stêrzanî û Bawerîyên Batil

Mîrên Merwanîyan girîngî dane stêrzanan û herwiha hinek mîran stêrzan anîbûn cem xwe û gotinên van stêrzanan li cem mîr pir biqîmet bûn. Îbnu'l-Ezreq qala du stêrzanên di serdema Nesruddewle û Nîzameddîn de dike û wiha dibêje: Rojekê ji Hindê falbazekî zana hat cem Nesruddewle û mîr gelekî qîmet dayê û qencî lê kir. Falbaz derbarê paşeroja wî de ev tişt jê re gotin: "Mîre min mirovekî ku tu jê hez dikî, tu qîmet didiyê piştî mirina te wê mîrektîyê ji malbata te bistîne û malbata te ji holê rake. Lêbelê di demeke kurt de desthilatdarîya vî welatî dê ji destê wî jî derkeve. Li ser vê mîr hinekî fikirî û berê xwe da Fexruddewle û wiha got: "Ku ev gotin rast be kesê ku vê bike ev kal e". Dema Fexruddewleev gotinên mîr bihîstin wiha got: "Ezbenî ez li ku ev kirina vî karê ha li ku?" Herwiha çawa ku em ê di pêş de bêjin ev gotinên falbaz rast derketin.[634]

Di serdema Mîr Nîzameddîn de disala 463/1071ê de stêrzanekî bi navê Îbnî Aysûn hatibû cem Mîr Nîzameddîn. Ev stêrzan her wext di civata Mîr Nîzameddîn de amade bû. Şevekê Îbnî Aysûn û mîr bi hev re li bajêr dinêrtin û sternas ji mîr re wiha got: "Mîrê min ev çi bajarekî xweş e lê piştî te bi heştê salî zilm û zordestî dê li vir serdest bibe." Gel li hemberî van gatinan pir şaş bû; lêbelê gotinên vî stêrzanî rast derketin. Lewra piştî Merwanîyan welat ket destê tirkan û rêvebir hatin guherandin, zilm û zordestîyê dest pê kir û çawa ku stêrzan gotibû, gel feqîr û belengaz bû.[635]

Dema ku Mîr Nîzameddîn mir jî vî stêrzanî li bircê stêran nêrt û got ku heta sê rojan Ebû'l-Mensûr nikare here ser textê mîrîtîye. Li ser vê termê Mîr Mîzameddîn hat şûştin û kefenkirin û di nav darbestê de sê rojan hat sekinandin. Heta li gorî ku dibêjin di vê navberê de mişkan her du çavên wî xwarine.[636]

---

[634] el-Fariqî, h.b., r.503.
[635] el-Fariqî, h.b., r.517.
[636] el-Fariqî, h.b., r.516.

Herwiha din av gel de jî hinek bawerîyên batil hebûn. Li gor Fariqî dibêje, piştî ku birayê wezîr Ebû Tahirê kurê Enbarî, Ebû'l-Xenaîm hat kuştin êvaran nûr diket ser gora wî.[637]

Dema Sitînasa Hemdanî tînîn Amedê ku bi Ebû Elî re bizewice li Rihayê disekinin û nîvê şevê dema Sitînas li esman dinêre ji xeybê dengekî dibihîze û wiha dibêje:"Ez li ber wî mêrî dikevim ku berî bibe zava ez bî hiştim. Li ser vê bi Sitînas re tirs û xem çê dibe û piştî demeke kin xebera kuştina Ebû Elî jê re tê. [638]

Piştî ku Mumehhîduddewle bû mîr li ser xewnekê Ebû Nasir Ahmedê birayê xwe ji xwe dûr kiribû digot ez wî li ku bibînim ez ê wî bikujim. Lewra Mumehhîduddewle di xew de dîtibû ku roj diket dawa Mumehhîduddewle û Ebû Nasir roj ji dawa wî derdixist.[639]

### 3.8. Jîyana Civakî

#### 3.8.1. Kevneşopî

Rojên cejnan gel dicivî û di hinek serdeman de jî bûbû wek eded gel roja cejnê diçû derveyê bajêr û li wir nimêja înê dikir.[640]

Piştî ku mîr dimir wezîr, rêvebirên dewletê, carinan helbestvan û pismamên mîr dicivan gel pêşwazî dikir û bi vî awayî şîna mîr girêdidan. Dema Nesruddewle mir û xelk ji bo serxweşiyê hatin cemê ji ser textê mîrîtîyê rabû û çû li erdê rûnişt û bi vî awayî mîr kesên ku ji bo serxweşîyê hatibûn, pêşwazî kirin. Piştî mirina Nesruddewle helbestvan jî li wir amade bûn û zêmar li serê dixwendin.[641]

Dema Mîr Nîzameddîn mir wezîr û Mîr Ebû Nasir bicilên qetiyayî û şaşika gelicî û bi cilên şînê, ji bo sersaxîyê derketin pêşberî gel.[642]

---

637 el-Fariqî, h.b., r.532.
638 el-Fariqî, h.b., r.460.
639 el-Fariqî, h.b., r.468-469.
640 el-Fariqî, h.b., r.457
641 el-Fariqî, h.b., r.505.
642 el-Fariqî, h.b., r.517.

### 3.8.2. Weqf û Alîkarî

Mîrên Merwanîyan girîngî didan alîkarîyê û herwiha em ji berhema Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku ji bo vê weqf hatina çêkirin. Di dewra Nesruddewle de Hesenê kurê Mihemedê kurê Mîxfer karûberên weqfan bi rê ve dibir. Lewra Nesruddewle li ser xwe qewl kiribû ku her roj elbek genim bide feqîran. Lê tirsîya ku rojekê bi karê xwe ve mijûl bibe û vî qewlê xwe neyne cih. Li ser vê gazî Mihemmedê kurê Mîxfer ê berpirsiyarê weqfan kir û xwest erdekî ku salê sê sed û şêşt elb mehsûl jê tên wergirtin weqif bike û gundê Etşayê yê ku dikeve rojavayê Meyyafariqînê weqif kir. Ji wê rojê û vir ve jî çi mehsûlên ku ji vî gundî tên bidestxistin li feqîran tên belavkirin.[643]

Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq Nesruddewle gelek zevîyên di nav sûrên Meyyafariqînê û gelek cihên din weqif kirin. Xêr û alîkarîyên wisa kirin ku heta niha ne ji malbata wî û ne ji pismamên wî kesî xêrên bi vî awayî nekiribûn.[644]

Di serdema Merwanîyan de ji xeynî alîkarîyê, hinek rolên weqfan ên din jî hebûn. Li gorî Îbnu'l-Ezreq ji bo çêkirina sûran[645] û vekirna qenalên avê jî hinek cih hatibûn weqifkirin.[646]

Em dibînin di rêvebirîya Merwanîyan de karê berpirsiyarîya weqfan jî heye lewra li gorî agahiyên Îbnu'l-Ezreq piştî ku Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazîyê Meyyafariqînê nazirtîya Weqfan jî wî meşand[647] û ji serdema Mîr Ebû Elî û vir ve jî kesekî fileh bi navê Îbnî Şelîta mutewelîtîya weqfan dikir.[648]

Di sala 468/1076an de Ebû Hesenê kurê Bexel bû berpirsiyarê Weqfan.[649]

---

643 el-Fariqî, h.b., r.478-479.
644 el-Fariqî, h.b., r.477.
645 el-Farqî, h.b., r.498.
646 el-Fariqî, h.b., r.499.
647 el-Fariqî, h.b., r.498.
648 el-Fariqî, h.b., r.499.
649 el-Fariqî, h.b., r.504.

# ENCAM

Em di vê xebata xwe de li ser mijara Kurdên Merwanî di pirtûka Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî de sekinîn û di vê çarçoveyê de em gihan hinek encaman.

Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî di sala 572/1176an de dest bi nivîsandina berhema xwe kiriye. Agahîyên derbarê jîyana Fariqî de tenê di pirtûka wî de hene û wekî din derbarê jîyana wî de agahî negihane ber destê me.

Fariqî di serdema rêvebirîya Artuqîyande jîyaye. Ji malbata xwe tenê qala bapîrê xwe kiriye. Bapîrê Fariqî di dema rêvebirîya Merwanîyan de Nazirê Hiskêfê ye. Fariqî jî di karê rêvebirya dewletê de xebitiye.

Du destxetên vê berhemê li Londonê di muzeya Britishê de hene. Di berhemê de gelek mijarên derbarê dîroka Îslamê û misilmanan de hene û beşeke wê derbarê kurdên Merwanî de ye û sernava vê beşê *Destpêka Rêvebirîya Kurdan Li Meyyafarqînê* ye.

Mîrnişîna Merwanîyan di sala 373/983yan de hatiye damezirandin. Li ser herêma Diyarbekir û hinek deverên herêma Cezîreyê û hinek herêmên Ermenîyan hukum kirine. Amed, Meyyafariqîn, Mêrdîn, Cizîr, Nisêbîn, bakurê Mûsilê, Ercîş, Erzen, Xelat û herêma ermenîyan nêzî sed salî jîyana xwe domandine û piştre ev mîrnişîn di sala 478/1086an de ji hêla Selçûqîyan ji holê rabûye. Bingeha vê mîrnişînê ji hêla Badê kurê Dostik ve hatiye avêtin. Bad bi Bîzans, Buweyhî û Hemdanîyan re şer kir, bingeha vê mîrnişînê danî û tixûbê xwe berfireh kir. Piştî kuştina Bad xwarzîyê wî Mîr Ebû Elî Hesenê Kurê Merwan bû mîr û piştî wî Mumehîddudewle Ebû Mensûr û piştî Nesruddewle Ebû Nesr Ehmedê kurê Merwan bû mîr. Serdema Nesrûddewle serdemeke zêrîn bû. Ji ber ku di vê serdemê de hem bi xelîfeyê sûnnî yê Ebbasî, hem bi xelîfeyê Şiî yê Fatimî û hem bi dewleta Bîzansê re

têkilîyên xweş hatibûn danîn û sîyaseteke aşîtîyane dihat meşandin. Piştî Nesruddewle, Mîr Nîzameddîn bû mîrê Merwanîyan û her ku diçû bandora selçûqîyan li ser Merwanîyan zêde dibû. Nesruddewle Mensûr mîrê Merwanîyan ê dawî bû û bi sedemê nezanî û bêîstiqrarîya wî her ku diçû ev mîrnişîn ber bi qelsiyê ve çû. Selçûqîyan artêşek di bin fermandarîya Fexruddewleyê kurê Cehîr ku wezîrê Merwanîyan ê kevin bû şand ser Merwanîyan û ev mîrnişîn ji holê rakir.

Merwanîyan di seranserê serdema mîrnişîna xwe de di warê rêvebirîya dewletê de sîstemeke ava kiribûn. Rêvebirî di destê mîr de bû û wezîrê wî mîrî hebû. Di heman demê de bajarên derveyê payîtextê bi riya walîyan dihatin îdarekirin.

Pergaleke dadmendî û darizandinê jî li cem Merwanîyan hebû û ev kar bi destê qazîyan dihat meşandin. Di warê zanist û hunerê de kar û kirinên Merwanîyan hebûn û gelek zana û helbestvan di nav welatê wan de dijîyan.

Artêşeke Merwanîyan a ku her dem amade û dibin fermana mîr de hebû û serokekî giştî yê vê artêşê jî hebû.

Di serdema Merwanîyan de di warê bajarvanî û avahîsazîyê de gelek çalakî hatine kirin û avahîyên dîrokî hatine çêkirin. Di vê serdemê de sûr, birc, keleh, qesr, pir, qenalên avê, seyrangeh, mizgeft û nexweşxane hatine çêkirin.

Di serdema Merwanîyan pergaleke aborî hebû, bac dihat berhevkirin. Li bajarên Merwanîyan bazargeh hebûn û bazirganî dihat kirin. Wekî din di serdema Merwanîyan de ji dema Badê kurê Dostik û vir ve li ser navê mir pere hatine çapkirin.

Kurdên Merwanî misilman û sûnî bûn. Wekî din baweriya falan û bawriyên din ên batil li cem rêvebirên dewletê tên dîtin.

Hinek kevneşopî û toreyên Merwanîyan ku xasî wan in hene. Di mîrnişînê de pergala alîkarî û weqfan heye.

# ÇAVKANÎ


- Alican, Mustafa: "Selçuklu Mervani İlişkileri", Turkısh Studies, Ankara 2013, r. 1-15.

- Antaki,Yahya İbn Seîd: *Tarihu'l-Antaki*, Curûs Burs, Lubnan, 1990.

- Azimli, Mehmet: "Fatımi Halifeliği üzerine Bazı Değerlendirmeler", D.Ü.İlahiyat Fakültesi Dergisi, Diyarbakır 2005.

- Baluken, Yusuf: "Mervaniler Devrinde Cizre", Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012, rr.55-65.

- Baluken,Yusuf, *Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar*, Teza Neçapbûyî, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, 2010.

- Bedlîsî, Şerefxan: *Şerefname*, (Wer. Ziya Avci) Avesta, Stenbol 2007.

- Beysanoğlu, Şevket: *Anıt ve Kitâbeleriyle Diyarbakır Tarihi I-II C.*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür Sanat Yayınları, Ankara 1996.

- Beyyûmî, Elî: *Qîyamu'd-Dewletî'l-Eyyûbîyetî fî Misir*, Daru'l-Hedîs, Qahîre 1952.

- Biçer, Bekir: "*Kürtler*, Çizgi Yayıları, İstanbul 2014.

- Biçer, Bekir: "Ortaçağda Kürtler ve Türkler", The journal of Academic Social Science Studies, Heziran 2013, r.231-261.

- Cahen, Claud: "İslam Kayneklarına Göre Malazgirt Savaşı", (Wer. Zeynep Kerman), w.t, c.t., d.t.

- Chyet, Michael: *Psellus,* w.t, c.t., 1992.

- Chyet Michael: *Kurdish-English Dictionariy*, Yale Press, London, w.t., , d.t.

- Conî, Wefa: *Uqeylîyûn*, el-Mewsûetu'l-Erebîye, Dimeşq 1981.

- Çıvgın, İzzet: *Ortaçağ Tarihi,* Akademi, Ankara 2008.

- Ebû'l-Farac, *Gregory Abû'l-Farac Tarihi*, w.t, c.t., d.t.

- Ebû'l-Fîda: *Teqwîmu'l-Buldan*, Daru Sadr, Beyrûd, w.t., d.t.

- Emirî, Ali: *Osmanlı Vilayât-i Şarkiyyesi*, (Amadekar. Taş, K. Z. vd.) Ankara İlahiyat, Ankara 2005.

- Erdem, İlhan: "Artuklu Uygarlığı Ve Türkmenler", Gazi Üniversitesi Gazi Eğitim Fakültesi Dergisi, Ankara 2009, r.236-242.

- Etiye, Ahmed: *el-Qamûsu'l-Îslamî*, w.t, c.t., d.t.

- Fettah, Fevzi Yunus (Wer.Mehmet Akbaş): *Kürtler* (Tarih), Nida, İstanbul 2015.

- Gabriel: *Voyages archeologgiques*, w.t, c.t., d.t.

- Gümüş, Ercan: "İbnü'l-Ezrak ve Eseri Meyyâfârikîn Ve Âmîd Tarihi Üzerine Türkiye'de Yapılan Çalışmalar Işığında Bir Değerlendirme", E-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi ,ISSN: 1308-9633 Sayı: VII, Nisan 2012, r.3-13.

- Halil, Mükremin: *Selçuklular Devri*, w.t, c.t., d.t.

- Hand, A.: *List of the Arabic Mss*, II, 56, Nimreya destxetê: 3376, v.233a, Bretain ad İreland 1902, r.785-812

- Henry Frederik, Amedroz: “Three Arabic MSS. on the History” of the City of,  w.t, c.t., d.t.

- Hesen, Qadir Mihemed: *Îmaretu’l-Kurdîyye fî el-ehdî’l-Buweyî*, Sazîya Mukrîyanî ya Lêkolîn û Weşanê, Erbîl 2011.

- el-Hîmyerî, Mihemed bin Evdilmunim: (Thq. Îhsan Ebbas) *Rewdetu’l-Mutar fî Xeberu’l-Eqtar,* Mektebetu’l-Lubnan 1984.

- Îbnu’l-Esîr : *el-Kamîl fi’t-Tarîx,* (Thq. Mihemed Yûsuf Reqaqe), Daru’l-Kutubu’l-Ilmyye, Beyrûd-Lubnan 1987.

- Îbnî Şeddad: *el-Alaqû’l-Xetîre fî Zikrî Ûmeraî’ş-Şam we’l-Cezîre I-VII,* (Thq. Yahya Îbare), Wezaratû’s-Seqafîyye’l-Murşadû’l-Qewmî, Dimeşq, 1978.

- Îbnî Xeliqan: *Wefayatu’l-Ayan,* (Thq. Îhsan Ebbas), Daru Sadir, Beyrûd 1978.

- Îbnu’l-Cevzî: “*Miratu’z-Zeman fi Tarihi’l-Ayan’da Selçuklular*”, (Wer. Ali Sevim), Türk Dil Kurumu, Ankara 2011.

- Îbnu’l-Ezraq, “Meyyafarikîn ve Amed Tarihi”, (Wer. Ahmet Savran), Atatürk Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi, Erzurum 1990.

- İbnu’l-Ezraq: *Mervanî Kürtleri Tarihi,* (wer. Mehmet Emin Bozarslan), Koral, Stenbol 1990.

- Îbnu’l-Ezreq: *Tarîxu Meyyafariqîn,* (Thq. Kerîm Faruk el-Xûlî &Yusuf Baluken), Nûbihar, İstanbul 2014.

- Îbnu’l-Ezreq: *Tarîxu’l-Fariqî,* (Thq. Bedewî Evdulletîf Awad), Qahîre 1959.

- Îliya en-Nasibini: *Tarihu İliya Bar Sinaya*, w.t, c.t., d.t.

- Kazıcı, Ziya: *İslam Müesseleri Tarihi*, Kayıhan Yayınları, İstanbul 1991.

- Lazarev, M.s. & Mihoyan, Ş.X. û yên din: *Kürdistan Tarihi*, (Wer.İbrahim Kale), Avesta, Stenbol 2010.

- Mansız, Necip: *İbnü'l-Esir'in el-Kamil fit't-Tarih Adlı Eserine Göre Kürtler ve yaşadıkları Bölgeler*, Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyî, Muğla Sıtkı Koçhan Üniversitesi, 2015, r.120.

- Amedroz, Henrî Frederîk: "Three Arabic MSS. on the History of the City of Mayyāfāriqīn", Cambridge University Press, Great Oct., 1902r.785.pp.

- el-Mardînî, Abdulselam: *Tarîxû'l-Mardîn*, Berlin Hs. 6615, w.t., d.t.

- el-Meqdisî, Mihemed bîn Ahmed: *Ahsenu'l-Teqasîm fî Merîfetî'l-Eqalîm*,

- Minorsky, Viladimir: "Caucasica in the History of Mayyāfāriqīn, Source": Bulletin of the School of Oriental and African Studies, University of London, Vol.13, No. 1 (1949), r.27-35.

- Mostoufi: *Nuzhetu'l-Qulûb*, (Wer.Le Strange), w.t, c.t., d.t.

- Ripper, Thomas: *Diarbakır Merwanileri*, (Wer:Bahar Şahin Fırat), Avesta, İstanbul 2012.

- Safrastian, Asrhak,: *Kurd û Kurdistan*, (Wer.Ergîn Opengîn), Avesta, Stenbol 2007.

- Sallabî, Ali: *Devleti Selaçika*, w.t, c.t., d.t.

- Sevim, Ali: *Anadolu'nun Fethi Selçuklular Dönemi*, Türk Tarih Kurumu Yayınları, Ankara 1988.

- Skylitzes: Amd Thurn, w.t, c.t., d.t.

- Sümer, Faruk: *Oğuzlar (Türkmenler),* Ankara Üniversitesi Dil Tarih-Coğrafya Yayınları, Ankara 1972.

- Sümer, *Faruk: Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü*, Selçuklu Tarih ve Medeniyeti Enstitüsü Yayınları, Ankara 1992.

- Tan, Altan: *Turabidin'den Berriyeye*, Nûbihar, Stenbol 2015.

- Torî: *Tarihte Kürt-Türk İlişkileri*, Peri Yayınları, İstanbul 2002.

- Tufantoz, Abdurrahim: *Ortaçağda Diyarbakır Mervanoğulları*, Aça Yayınları, Ankara 2005.

- Turan, Osman: *Selçuklular Tarihi ve Türk İslam Medeniyeti*, Ötüken, İstanbul 2009.

- Varlî, Evdillah Memê Mehmed Xanî: *Dîroka Dugelên Kurdan*, Sitenbol, 1997.

- Wefa Conî, Uqeylîyûn, el-Mewsûetu'l-Erebîye.

- Xusrew, Nasir: *Sefername*, (Amd. Muhemmed Debîr Siyaki, Kitabfıruşiye Zevar), Tehran 1335/1956.

- Yaqût el-Hemawî, Mucemu'l-Buldan, Daru Sedr, Beyrûd, 1977.

- Zekî Beg, Mihemed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistan* (Wer. Ziya Avci), Avesta, Stenbol 2002.

- Zekî Beg, Mihemed Emîn: *Meşahîrû'l-Kurd we Kurdistan*, (Wer. Sanîhe Zekî Beg), Darû'z-Zeman, Şam 2006.
- Zengin, Burhan: *Hasankeyf Tarihi ve Eserleri*,w.t., c.t, 2001.
- http:// www .islamansiklopedisi.info/.(14/07/2016)
- http:// www.i-takvim.com/takvimler/hicri_takvim_ceviri.php. (11/06/2016)
- http:// www.kulturekbellek.com/absid-nedir-anlami-nedir. (10/09/2016)
- http://www.i-takvim.com/takvimler/hicri_takvim_cevir.php. (09/06/2016)
- http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri . (11/07/2016)
- https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng. (01/07/2016)
- https://play.google.com/store/apps/details?id=paket.trsozluk. (17/08/2016)
- https://tr.wikipedia.org/wiki. (10/08/2016)

**T.C.**

**Mardin Artuklu Üniversitesi**

**Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

# İBNU'L-EZRAK'IN TARİHU MEYYAFARIKİN ADLI ESERİNDE MERVANİ KÜRTLERİ


**Ahmet Eyer**

**14711018**


**Danışman**

**Doç. Dr. Tahirhan Aydın**

**Mardin-2016**